HEJMAR 6 2021



BERNA MEGEH

TÊMÛRÊ XELÎL

KURMANCİYA ERMENÎSTANÊ Û
KURMANCİYA HAWARÊ WEKHEW E

OCCO MAHABAD

SÊ NİFŞ, SÊ DENG, SÊ JİYAN

REMEZAN BAKUR

Jİ ÇANDA QEDÎM

NİHAT GÜLTEKİN

KURDÊN KU Lİ GİRTÎGEHA
EDENÊ HATİN DARVEKİRİN

www.arsivakurd.org

NAVEROK

05 SÊ NİFŞ, SÊ DENG, SÊ JİYAN
OCCO MAHABAD

09 NİŞTİMANPERWERİYA BARZANİYAN
SIRAÇ OĞUZ

12 DARA EVÎNÊ / KEVOK MİZGÎN

13 KURDÊN KU Lİ GİRTÎGEHA EDENÊ
HATİN DARVEKİRİN / NİHAT GÜLTEKİN

19 DAYÊ / SULTAN YARAY

20 ŞÊWEYEKE WÊJEYÊ: CERİBANDİN
LOKMAN POLAT

22 ŞAHÎ Û HEZKİRİN / MORÎ XANİM

23 KURMANCİYA ERMENÎSTANÊ Û
KURMANCİYA HAWARÊ WEKHEW E
TÊMÛRÊ XELÎL

27 HÊSÎRÊ ÇİYAYÊ ŞENGALÊ
ROGER ACUN

28 ŞÊX SİLO YA JÎ SÊWÎ SİLO
ÎKRAM OGUZ

32 TİRSİYANE Jİ TE / MUQADES AGİRÎ

33 PÊVAJOYA PÊVEKAN
MERVAN SERHİLDANÊ

35 HEBÛNA TE / DEMHAT DÊRİKÎ

36 AXA KURDİSTANÊ JÎ DİKARE ŞERÊ NERM
Lİ HEMBER NEYARÊ XWE BİKE?

KEYHAN MİHEMEDÎNİJADÊ

40 BAŞ ZANİM / ÇAYAN OKUDUCİ

41 NAMEYA KUŞTİNÊ / ŞÎLAN DOSKÎ

www.arsivakurd.org

NAVEROK

44 MİRİN / ABDULLA HAJİAN

45 KURD MÎTRAYÎ, MÎSRAYÎ BÛN SORAN HEMEREŞ, KURMANCÎKİRİN: MUHSÎN OZDEMÎR

48 HELEBA ŞER / AZAD EKKAŞ

49 DİLOPA AVÊ / HASBEG KOKSAL

50 SERDAR KÖMÜRCÜ / DU EVÎNDAR

51 Jİ ÇANDA QEDÎM / REMEZAN BAKUR

54 ŞEV Û MİJ / DİLAZAD A.R.T

55 MİN GOT Û NEGOT / KONÊ REŞ

57 DAWİYA AXÎNÊ / RÊBER HEBÛN

58 SEROKWEZÎRÊ MİN KAMRAN SİMO HEDİLÎ

62 ALA MİN / DENNİS DARGUL

63 ÇEND GOTİN Lİ SER DÊRÊ DİLBİRÎN DİLO

65 KÊ RABÛ / SEYFEDÎNÊ WELEKORÎ

66 ZANYARÊ NAVDAR YUVAL NEH HARARÎ Û ÇAR BERHEMÊN WÎ / RÛMET MED

70 ÇÎROKA LAWÊ PADİŞAH ADİL BAŞARAN

76 AVAZÊ KALO / HETA KU

77 CEMİL İBRAHİM WERİN EM ZİMANÊ XWE BİPARÊZİN

79 ELİND MİZÛRÎ / RÎVÎNG

www.arsivakurd.org

JI EDÎTOR

MIHEMED KESKÎN

Di vê hejmara me de Têmûrê Xelîl Kurmanciya Ermenîstanê û Kurmanciya Hawarê hildaye dest, Occo Mahabad behsa malbateke bi sê nifşan şareza û kedkar dike, Remezan Bakur bi pirs û bersivan ji çanda me ya qedîm vekolandiye, Nihat Gültekin serpêhatiya Kurdên ku li Girtîgeha Edenê hatine darvekirin ji me re neqil dike.

Kurdên delal car caran nayê fêmkirin lê divê ez dîsa vebêjim ku Bernamegeh platformeke demokratîk e hewl dide ku jiyana me ya fikr û ramanî bi çand, hûner û dîroka Kurdan pêş bikeve. Kovara Bernamegeh bexş û destekên we derdikeve lewma bêpere tê belavkirin. Divê bê zanîn ku ji bo berdewamiya xebatên me pêdîviya me bi piştgiriyên we hene. Nehêlin ku Bernamegeh bê girtin. Dîsa divê bê fêmkirin di pişta me de ne sermiyaderek ne jî partî û rêxistinek heye. Azadbûna me ya edîtoryalî, xebatên me yên serbixwe ji bexş û kedên we tên.

Bernamegeh cih û warê fikr û ramanên we ye. Fikr û nivîseke we hebe hûn dikarin ji me re bişînin em ê bi kêfxweşî biweşînin. Deriyên Bernamegehê ji ramanên we re vekirî ye.

Koordînatorê Giştî: Occo Mahabad

Edîtor: Mihemed Keskîn, Cîhan Soylu, Serhad Aslan

Rûpelsazî: Mîtannî Ajans

Email: bernamegeh@gmail.com

Malper: www.bernamegeh.org - Kurdî
www.bernamegeh.com - Tirkî

www.arsivakurd.org

OCCO MAHABAD

Sê Nifş, Sê Deng, Sê Jiyan

Dema ez zarok bûm rojekê xalê bavê min Hesenîkê Bala di destê xwe de du heb bandên teyîbê, hat li ber min sekînî, bandekê avêt ser teyîbê, dengekî esmanî belav bû odeyê.
Min got: Hesenîk ev kî ye?
Xwedê bela xwe nede te tu çawa nas nakî ev Mecîdê Brukî ye mîna qulinqên reş û spî deng vedide bi tenê per û baskên wî tune bifire di nava esmanan de.
Di wan çaxan de min nizanibû ev dengbêjê rû qemer, deng qemer Mecîdê Silêman bû. Di civat û cimaeta Brukan de bi navê Mecîdê Brukî dihate naskirin.
Çend wext berê Semedînê Mecîdê Silêman ku kurê Mecîdê Silêman e qala serpêhatiya bav û kalê xwe dikir.
Wê demê Hesenîkê Bala hat bîra min. Hesenîkê Bala mirovekî delodîn, şervan, şoreşger û welatparêz bû. Di navbera salên 1940 û 1946an de bi qehremanî ji bo avakirina Komara Kurdistanê hewl dide û dixebite. Li gor gotina wî, hem Mihemedê Siloyê Miho ku bavê Mecîdê Silêman e hem jî dengbêjê navdar Hemîdê Ûsivî rêhevalên wî yên şer bûne. Hesenîkê Bala û Mihemedê Siloyê Miho pêşî di eniya Mahabadê de piştre jî di nava tevgera Mela Mistefa Barzanî de xebatên siyasî û eskerî dikin. Hesenîk eşkere ye bîra jiyana malbatî dike vedigere axa Wanê dizewice piştî çar salên şûn de koçî Makûyê dike û li wir di 94 saliya xwe de jiyana xwe ji dest dide. Hemîdê Ûsivî bavê hunermend Kawa Urmiye ye ku di sala 1926'an de li gundê Morê yê li Geliyê Diryan tê dinyayê. Piştre malbat koçî gundê Kuranê yê herêma Tirgewera Urmiyê dibin. Hemîdê Ûsivî di sala 1979'an de li bajarê Urmiyê jiyana xwe ji dest dide, li goristana gundê Kuranê tê binaxkirin.
Bavê Mecîdê Silêman dengbêj û şoreşger Mihemedê Siloyê Miho di sala 1917an de koçî bajarê Wanê dike lê ji ber şer û pevçûnên dewletên Ûris û Osmaniyan berê xwe didin Îran û Naxcivanê. Heta dawiya şerê cîhanê yê yekemîn di Gurni û Aryulniyê de bi cih dibin. Ew şer ji sala 1914ê heta 1918ê dewam dike. Dema zivastanan li dor Çemê Erezê dema havînan li dor Beyazida Nû, Gondeyan, Nuliduz û Akhmuganê jiyana xwe derbas dikin. Dema ku herêma Dîlê dikeve di bin nîrê sînorê Ûrisan berê xwe didin bajarê Rewanê.
Mihemedê Siloyê Miho piştî ku dibistana mamostetiyê diqedîne li gundê Davîtaşên dibe muxtar û bi tevî malbata xwe li vî gundî bi cih dibe, bi navê Têmir û Mecîd du kurên wî çêdibin. Mihemedê Siloyê Miho car caran ji bo xebatê ji Rewanê diçe hem Başûrê Kurdistanê hem Rojhilata Kurdistanê û piştre vedigere cem malbata xwe. Ew di sala 1946an de ji bo avakirina Komara Kurdistanê tevlî tevgera Qasimlo dibe. Di çeperên şer de bi navê Îsa Begê Rewanî tê naskirin. Mihemedê Siloyê Miho li Rojhilatê di berxwedana şoreşê de şehîd dikeve. Semedînê neviyê Mihemedê Siloyê Miho dibêje ku du kur û qîzeke kalikê wî li Rojhilatê çêdibin lê ew nas nakin ka kî ne,

li kîjan bajêr dimînin loma pirr dixwazin zarokên kalikê xwe nas bikin, bi wan re têkevin têkiliyê, hev nas bikin wek malbatî hev hembêz bikin.
Dengbêj û helbestvan Mecîdê Silêman ji eşîra Brukan e, kurê dengbêj û şoreşger Mihemedê Siloyê Miho Zakavkaz e. Eşîra Brukî di sala 1600an de ji Qerejdaxa Diyarbekirê koçî Wan, Îdir, Qers, Makû, Xoy, Nehcivan û Rewanê dibin. Piştî şoreşa Lenîn hinek vedigerin Kurdistana Bakur yên din jî ji Ermenîstanê bigire heta Ûris, Qazakîstan, Azerbeycan, Îranê belav dibin welatê din, jiyana xwe bi vî awayî didomînin. Ev eşîr ji van milan pêk tê: Qirmizkî, Reîskî, Mamkî, Hacimkî, Xaskî, Girmuvkî, Karkî, Şarkî, Cicikî, Alkî, Şawlikî, Pîrkî, Beşkî, Banokî, Hesenkî û Gutkî.
Mecîdê Silêman di sala 1937an de li gundê Semenkaşê yê nehiya Kotaykê ku girêdayî Komara Ermenistanê ye ji dayik dibe. Navê wî yê rastîn Mecîdê Mihemedê Silo ye. Dema bavê wî Mihemedê Siloyê Miho şehîd dikeve heft salî ye. Mecîdê Silêman ji aliyê pîrika wî Sîsê û kalikê wî Silo vê tê xweyîkirin. Piştî kalik û pîrika wî diçin ser rehmetê, apê wî Evdoyê Îsa wan digire ba xwe û li wan xweyî û mezin dike.
Di zaroktiya xwe de aliyekî diçe dibistanê bi Azerkî hînî dersên xwe dibe, li aliyekî piştî dibistanê şivantiyê dike. Ew û birayê wî heta ciwantiyên xwe gellek rojên zor û zehmet dibînin. Mecîd aşiqê klamên Kurdî ne. Bi dengê xwe yê xweşik di nava demekê kurt de bala civatê dikişîne.
Di sala 1955an de bi vebûna Radyoya Rewanê ya beşa Kurdî re gellek hunermendên Kurd wekî Karapetê Xaço, Şeroyê Biro, Reşîdê Baso, Zadîna Şekir, Efoyê Esed, Egîdê Têcir, Memoyê Silo, Şibliyê Çaçan, Asa Evdile, Belga Qado, Xelîlê Evdile û gellek hunermendên din dengên xwe digihînin Kurdên çar aliyê dinyayê.
Mecîdê Silêman di wan salan de bi klamên denbêjî û helbestên xwe yên xelkî balê dikişine ser xwe, ew bi qîza xwe Sîsa Mecîd re ji bo tevlî xebatên Radyoyê bibin diçin Rewanê. Wî ji sala 1961ê hetanî sala 1980'ê di radyoya Rewanê de dengbêjiyê kiriye û kilam gotine. Îro nêzîkî 100 klamên Mecîdê Silêman û 50 klamên Sîsa Mecîd di arşîvên radyoyê de qeydkirî ne. Helbestên Mecîdê Silêman li Ermenîstan û Qezakîstanê dibin pirtûk. Helbestên wî di rojname û kovarên Rûsya, Qazakîstan û Ermenistanê de tên weşandin. Helbestên wî yên herî naskirî Welatê me Kurdistan, Heta Kîngê, Bedewê û Sînemê ne.
Mecîdê Silêman di sala 1964'an de li Enstîtûya Çandiniyê ya Êrîvanê beşa beytariyê diqedîne. Ew heta şerê Azerî û Ermeniyan (1988-1994) bi malbata xwe re li Ermenîstanê dijî. Ew bi derketina şer re mal û milkên xwe li pey xwe dihêlin mecbûr dimînin diçin bajarê Krasnodarê. Rewşeke kambax tê serê Mecîdê Silêman, qîza wî li bajarê Krasnodarê jiyana xwe ji dest dide. Mecîd bi hemû xemgînî û êşên xwe ve dixwaze qîza xwe bispêre axê lê rayedarên li vê derê ji ber mahneya "nasnameya we tune" nahêlin gora wê bê definkirin. Bi vê karesatê berê xwe didin Qezakîstanê. Di bajarê Alma Atayê li ba Kurdên ku di sala 1944an de bi fermana Stalîn hatibûn sirgûnkirin bi cih dibin. Debara malbata xwe bi xweyîkirina ajalan didomînin.
Kurdên Sovyetê heta niha bi sê qonaxan hatine sirgûnkirin û mexdûrkirin. Qonaxa yekê di sala 1937an de dest pê dike. Yekîtiya Sovyeta Sosyalîst li 7ê Tîrmeha 1937ê biryarek derdixe ku ev biryar dibe sedema koçberiya kurdan. Bi tevî zar û zêçên xwe di dawiya payîza 1937ê de kurdên Ermenistan û Azerbaycanê ber bi Qezaxistanê ve tên sirgûnkirin.
Ya duyemîn di sala 1944an de bi fermana Stalîn pêk tê. Kurdên reben ji sala 1937ê heta sala 1956ê bi statûya "Penaberên Taybet" di bin şert û mercên zehmet de jiyana xwe derbas dikin.

Qonax û sirgûntiya sêyemîn bi derketina şerê Ermenî û Azeriyan (1988-1994) çêdibe. Kurdên me dîsa bi mecbûrî koç dikin ku neyên qirkirin.
Mecîdê Silêman jî piştî vî şerî bi malbata xwe re dikeve rêyên dûr û dijwar di Aşîbûlaka Qazakîstanê de bi cih dibe. Aşîbûlak 15-20 kîlometre dûrî Alma Atayê ye û piraniya nişтecihên vî gundî li Alma Atayê karê bazirganiyê dikin. Hinek Kurd jî debara mala xwe bi çandinî û xwedîkirina heywanan dikin.
Piraniya Kurdên Aşîbûlakê piştî şerê Ermenî û Azeriyan hatine Qezakîstanê û li vî gundî nişтecih bûne. Li Aşîbûlakê nêzîkî 700 malên Kurdan hene. Kurdên li vê derê ji hev re pir hurmetkar û wek bira ne.
Zarok û civata wan giş Kurdî dizanin û pev re Kurdî diaxivin. Nifûsa Kurdan ji Qazakan gellek zêdetir e. Helbestvanên navdar Bariyê Bala û Hesenê Hecîsilêman jî piştî hatina ji Ermenistanê li vî gundî bi cih dibin.
Mecîdê Silêman di sala 1992'yan de li Qezakîstanê, li gundê Aşîbûlakê koma şano û govendê ava dike. Tevlî avabûna rêxistina Yekbûnê dibe. Di rêxistinên Kurdên Sovyetan de bi çalak cih digire. Qezakîstan gellek derfet dide Kurdan, bi saya piştgiriya dewletê pirr kitêb, kovar û rojnameyên kurdî tên derxistin. Kurdên li Qezakîstanê ji bo pêşketin û ronîkirina civatê Kovara Nûbar û Rojnameya Jiyana Kurd derdixin. Nûbar û Jiyana Kurd bi zimanê Kurdî, Rûsî û Qazakî derdikevin. Di her du weşanan de alfabeyên latînî û kîrîlî tên bikaranîn. Tevahiya nivîsaran bi zaravayê kurmancî têne weşandin. Heta beriya deh salan dibistanên Kurdan li herêmê hebûn, zarokên Kurdan bi Kurdî perwerde didîtin lê bi biryarekê derfetên perwerdeya Kurdî hatin betalkirin û rakirin. Di nasname û pasaportan de navê neteweya Kurdan wek Kurd tê nivîsandin. Dewleta Qezakîstanê nasnameya Kurdan nas dike, tu zext û zordarî li ser Kurdan nake.

Çar qîz û sê kur, heft zarokên Mecîdê Silêman hebûn; Sîsê, Sînem, Sêvdîn, Nesredîn, Semedîn, Sorgul û Tamîle. Sê navên pêşî rehmet kirine, çar mane.
Kedkarê Radyoya Erîvanê, dengbêj û hebestvan Mecîdê Silêman piştî ewqas salên bi xebat û tekoşînê derbasbûyî di sala 2018an de jiyana xwe ji dest dide. Ji aliyê dost, xizm û hezkiriyên xwe ve li Qezakîstanê tê binaxkirin.
Kom Muzîk di sala 2018an de bi navê Klamên Yêrêvanê albûma Mecîdê Silêman bi tevî Zadina Şakir derdixe. Tê de klamên naskirî Sêmlo, Wez Teyr im, Berbenî, Gazî Dikim, Lê Gidiyê, Tencorê, Bejnê û gellek klamên din cih girtine.
Dixwazim bi helbesta wî ya Kurdistanê dilê we şa bikim ku hûn lê binêrin dengbêjekî zîrek û wêrek çawa bi helbestvaniyeke serkeftî rihê me aram û geş dike.

Welatê me Kurdistan e

Welatê me Kurdistan e
Cîh û meskenê me Kurdan e

Welat me re rûh û can e
Milet tê de bira ne

Welatê me pir şîrîn e.
Temam mêrg in û zevî ne

Qîz xortê wê tev cindî ne .
Eslê xwe ve Horî ne.

Kurdistana me zeynet e .
Cimaeta wê pir hurmet e.

Temam qedir û qîmet e.
Welat me re cinnet e.

Kurdistana me rengîn e.
Karxana ve ew zengin e.

Şaîr Mecidê Silêmîn e.
Ev xeber hev anîne.



Di vê malbata şareza de nifşa sêyemîn ku bi hunermendiya xwe deng vedaye dengbêj Sîsa Mecîd e. Sîsa Mecîd di sala 1960an de li gundê Demirçiyê yê nehiya Masîsa Ermenîstanê welidiye. Di biçûkanî û ciwantiya xwe de bi stran û klamên dengbêjiyê mezin dibe. Bi dengê xwe yê wek bilbilan bala civatê dikişîne. Bavê wê Mecîdê Silêman di 16-17 saliya wê de, keça xwe dibe Radyoya Rewanê cem serokê radyoyê Xelîlê Çaçan û dengê wê dide qeydkirin. Sîsa Mecîd bi Evdirehmanê Eylazê Hecîsilêman re dizewice. Du kur û qîzeke Sîsa Mecîd hene. Mêrê wî çend sal berê çû dilovaniya Xwedê. Bi gişti di klamên gotî de hunermendê naskirî Xelîlê Evdila pê re li meyê xistiye. Klamên ku gotine bêhtirîn ji nivîskar Eliyê Evdilrehman hatine sêwirandin.
Sîsa Mecîddi 21ê cotmeha sala 2019an de li gundê Aşîbûlakê yê bajarê Alma-Ataya Qezakîstanê jiyana xwe ji dest dide. Cenazê wê bi beşdariya girseyeke qerebalix li goristana kurdan a li Gundê Aşîbûlakê tê veşartin.

Sîsa Mecîd zêdetirîn bi klamên xwe yên Bavê Koroxlî, Were Malo û Memed Kanî tê naskirin. Kom muzîk bi navê Klamên Yêrêvanê / Kew Helûn albûmeke wê bi tevî Karapetê Xaco derxistibû. Tê de klamên wekî Bilbilo, Kew Hêlun, De Yoyo, Ha Berde, Were Lolo Siwaro, Hey Kalê, Heylo Şênî cih girtibûn.
Sê nifş, sê deng, sê jiyan, malbateke jîr û şareza, bi hezaran bîranîn, xebatên dûr û dirêj û jiyanênwatedar. Mihemedê Siloyê Miho bi şoreşgerî û dengbêjiya xwe, kurê wî Mecîdê Silêman bi dengbêjî û helbestvaniya xwe û qîza wî Sîsa Mecîd bi hunermendiya xwe di çand û dîroka Kurdan de cihekî taybet digirin. Eşkere ye jiyaneke bi vî awayî nakeve para her malbatê.





> “Piştî mirina Melle Mistefa Barzanî jî Mesud Barzanî cîhê wî girt û bû serokê partîyê.

Sıraç Oğuz

Nîştimanperwerîya Barzanîyan

Kîngê li Kurdistanê bûyerek mezin biqewime, Kurd wê bûyerê bi Malbata Barzanî va girêdidin û her yek bi awayekî dinirxînin. Hinek nîştimanperwerîya wan derdixin pêş, hinek jî bi nezanî wan gunehkar dikin. Barzanî kî ne? Nîştimanperwerîya wan ji ku tê? Ji alî hinek kurdan va çima tên rexnekirin? Divê nivîsa xwe da ez li ser bersivên van pirsan disekinim.

Barzan, navê eşîretê, malbata Barzanî jî serokên wê eşîretê ne. Eşîreta Barzan, navê xwe ji navenda eşîretê, ji gûndê Barzan digre. Şêxên eşîreta Barzan jî digihîjin Şêx Ebdûlselam Barzanî û kalikên wî. Koka Şêxên Barzan digihîje Mîrên Amîdiyê. Navê serokê eşîreta Barzan yê yekemîn Mesûd e. Şêx Mesûd li herêma Barzan li gundê Hewînka bi cîh dibe û li wî gundî dizewêce. Bi navê Seîd kurekî wî tê dinê. Piştî Şêx Mesûd, Seîd dibe serokê eşîretê û li dû Seîd jî Şêx Taceddîn şuna wî digre. Dema Şêx Taceddîn dibe serokê eşîretê, li derû dora wî gelek bawermend dicivin. Jiber ku ew di hemandemêda alim û pêşengek mezin bû. Bi bawermendên aligirên xwe va dergeha Barzan ava dike û bi xwe jî dibe şêxê dergeha Barzan. Di vê qonaxê de şêxtiya Barzanîyan dest pê dike. Bi mirina Şêx Taceddîn ra, kurê wî Şêx Ebdurehman, ji Ebdurehman jî kurê wî Şêx Ebdulleh dibe şêxê dergehê. Şêx Ebdullah, kurê xwe Şêx Ebdûlselam, ji bona perwerdeyîyek baş wî

www.arsivakurd.org

dişîne medreseya Şêx Seyîd Taha yê Nehrî. Dema ku Şêx Ebdûlselam Barzanî dibe serokê dergehê, wê demê biryar digre ku Medreseya Barzan ava bike. Bi avabûna Medreseya Barzan, Şêxên Barzan, bes bi şêxitîya xwe û bi îlmên xwe jî dibin xwedîyê giranîyek. Mewlana Xalid, dema ku Dergehên Naqşîbendîyan ziyaret dike, serlêdana Dergeha Barzan jî dike. Mewlana Xalid, di wê zîyareta xwe de Şêx Ebdûlselam Barzanî dike xelifeyê xwe. Xelifetîya wî jî, qedir û qimeta Şêx Ebdûlselam û dergeha Barzan xûrttir dike.
Şêx Ebdûlselam Barzanî di sala 1872 an de diçe ser dilovanîya xwe. Piştre Şêx Mihemed, dibe şêxê Dergeha Barzan û berpirsîyarê Medreseya Barzan. Şêx Mihemed bavê 4 lawan e. Ew jî Ebdûlselam, Ehmed, Mihemed Siddik û Mele Mistefa ne. Di sala 1903 an da Şêx Mihemed diçe ser dilovanîya xwe, lawê wî yê mezin Şêx Ebdûlselam Barzanî, cîhê wî digre û dibe serokê eşîretê û berpirsîyarê dergeh û medreseya Barzan. Hemû eşîretên derûdora herêma Barzan, ji Şêx Ebdûlselam Barzanî re rêzdarîya xwe nişan didin. Şêx Ebdûlselam Barzanî, di nav gel û malbatê da rolekî girîng dilîze. Di rê û rêbazek neteweyî da tevdigere û ji bo serkeftina miletê xwe dixebite. Bi edlayî serokatîya eşîretê dike û wek kalikê xwe Şêx Ebdûlselamê mezin dibe dostê mazlûm û feqîran.

Şêx Ebdûlselam Barzanî di civata kurdan da nûsazîyên (reform) girîng çê dike.
Ew nûsazî jî ev in:
1-Milkîyetê ra dike.
2- Erdê gundan li gundîya parve dike.
3- Zewaca bêdil û girtina qelind qedexe dike.
4- Rê li ber sazkirina têkilîyên komelayetî li ser bingeha wekhevî û edaletê vedike.
5- Ji bo karên olî û çareserkirina pirsgirêkên gundîyan li her gundeki mescîdek vedike.
6- Ji bo çareserkirina meseleyên gund û gundîyan, di her gundekê da meclîsek ava dike.
7- Di bin serokatîya kesên berpirsyar da ji hemû eşîretan hêzên parastinê tomar dike.
Şêx Abdûlselam, xwedîyê qerektereke milî, civakî, olî û reformxwaz bû. Reformên di dema wî de pêk hatine, ji alî Kurdan va jî bi cîh hatine.
Ji wan yek jî nêçîra ajalane ku, li herema Barzan neçîra ajalan hêjî qedexeye.
Şêx Ebdûlselam Barzanî di destpêka sedsala 20 an da serokatîya tevgera gelê Kurd dike û li dijberî Osmanîyan derdikeve. Tevgera wî di sala 1913 an da têk diçe, ew derbasî Rojhilata Kurdistanê dibe. Deshilatdarîya Îranê wî digre û teslîmî Osmanîyan dike.
Desthilatdarên Osmanî Şêx Ebdûlselam Barzanî digrin, dibin Musilê û di sala 1914 an da li wir darda dikin.



Piştî şehîdkirina Şêx Ebdûlselam, birayê wî Ehmed Barzanî di 18 e saliya xwede dibê serokê eşîreta Barzanîyan û cîhê Şêx Ebdûlselam digre. Şex Ehmed Barzanî, ji daw û doza gelê Kurd dûr nasekine. Bi hêzeke xurt alîkariya Xoybûnê û serhildana Agirîyê dike. Piştî têkçûna serhildanê li çekdarên ku derbasî Îranê dibin, xwedî derdikeve. Ehmed Barzanî jî, ji bo milletê xwe gelek hizmetên bêhempa dike. Şex Ehmed Barzanî di damezrandina Komara Mahabadê da cîh digre. Piştî hilweşandina Komarê, di sala 1947 de tê girtin. Heta sala 1958an di zîndanê da dimîne. Piştî derketina ji zîndanê derbasî Iraqê dibe, di sala 1969 an da sedema giranî nexweşîyek giran li Bexdayê jîyana xwe ji dest dide.
Melle Mistefa Barzanî di sala 1946an da bi damezrandina PDK ê, heta dawîya emrê xwe, serokatîya partîyê û malbatê dike. Xebatê Melle Mistefa Barzanî ku ji bo gelê xwe kirîye, milletê kurd bi qedr û qîmet dizane û ewan herdem bibîrtîne. Melle Mistefa Barzanî di dîroka kurdan da bi herfên zêrîn cîhê xwe girtî ye.
Piştî mirina Melle Mistefa Barzanî jî Mesud Barzanî cîhê wî girt û bû serokê partîyê. Mesud Barzanî, bi şagirtîya bavê xwe û bi perwerdeyîya malbatê mezin bûye.
Mesud Barzanî jî wesîyetê bavê xwe li erde nehîşt û bi salan ji bo daw û doza gele kurd xebitî û di nav şer da jîyana xwe derbas kir.
Piştî azadbûna Herêma Kurdistanê wek serokê herêmê hate hilbijartin. Ji bo serxwebûna Başurê Kurdistanê biryara referandumê girt û bi serfirazî anî cîh.
Mesud Barzanî di warê dîplomasî û siyasî da ji bo serxwebûna Kurdistanê xebatê gelek balkêş kir. Ew xebatên bi qîmet, di pêşerojêda wê bibin sedema dewlet û azadîya milletê kurd.
Di dîroka Barzanîyan da taybetîyên bi malbatî zêdene.
Ji destpêkê heta roja îro, niştimanperwerîya Barzanîyan berdewam e.
Gava mirov di vî warî da lêkolînan dike, dibîne ku ew perwerdeyî û fêrbûn ji taybetmendîya malbatîyê tên. Salên 1870 yî û dema Şex Ebdûlselam Barzanî girîng e. Ew jî, ji avakirina medereseyan û perwerdeyîya malbatî ye.
Girîngîya rola medreseyan jî ji ziman tê. Di medreseyên Barzanîyan da ji bilî dersen olî, dersen din jî dihatin dayîn ku bi taybetî pirtûkê Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanê, Feqî yê Teyra, Melayê Batê û Elî Herîrî jî dihatin xwendin.
Di medreseyên Barzanîyan da zimanê perwerdebûnê bi bi Kurdî bû. Quran, Hadîs û Kelam bi Kurdî dihatin teswîr kirin. Tesîra wan medreseyan îro jî tên dîtin.
Helbet li seranserî Kurdistanê wek malbata Barzanî, malbatên niştimanperwer gelekin. Ew jî wek malbata Barzanî di nav civata Kurdan da baş tên naskirin. Hinek Kurd îro ji nezantiyê rexneyên bêbingeh li malbata Barzanîyan dikin. Ji ber ku ew ji dîroka xwe jî, ji dîroka malbata Barzanî jî hayîdar nînin.
Malbata Barzanî, di herdemê da bi hizrê Kurdistanî û bi niştimanperwerî rola xwe lîst. Bawerî ewe ku, ji îro şûnda jî endamên malbatê yên cîvan jî bi kevneşopîya bav û kalên xwe ji bo Kurdistanek azad bi serkeftî xebatên xwe bidomînin.



KEVOK MİZGÎN

DARA EVÎNÊ

Ey vîn
Ey dara kok dayî li erda dil
Û xwer û vexwer a wê xwîna min
Va ez dikim bêm nik te
Lê belê dibe ku dîsan
Weka her hevdîtinên me ên dîtir
Bi peke ji hewşa devê min
Ev bêjeya bêyom "çi"

Ey vîn
Ey dara tim li dil bi jîn û jiyan
Ev herdu tîpên bilêvkirina wan ya bi hev re kiteyek
Û bi qasî bar û serbarên heft hêstiran biteqil
Xwe bar bikin li lêvên min
Û bibin asteng ji ken û axavtinên bîbikên çavên min û te re

Ey vîn
Ey dara bi pel û kulîlkên xwe
Li sînga asîmanê dilê min
Bûyî stêr û hîv
Ey remza peytexta dil pê bi rewşen
Dilê xwe bê agah bihêle ji vê tevgera min
Û dil bi vê yekê xemdar neke

Ey vîn
Ey bihuşta ji çûka dil re bê derî
Va ez dikim bêm nik te
Dizanim dê ev car jî mînanî wan carên dî be
Wê biqerimin lêvên min
Û ezê ji te re bi lêv nekim rewşa dilê xwe



www.arsivakurd.org



> Ji Enqereyê fermaneke Mustafa Kemal di sala 1932 an de di dema nêzikî dawiya bûyeran tê heremê. "Cenabê wî dixwaze ku şakî bi zindî werin girtin".

Nihat Gültekin

Kurdên Ku Li Girtîgeha Edenê Hatin Darvekirin

Gotinekê Aliya Izetbegovic gelek bala min dikşîne. Ew gotina wî min wiha nîşe girtîye lênûska xwe; "Hûn çi dikin bikin, jenosîdê ji bîr nekin. Ji ber ku jenosîda jibîrbûyî dûbare dibe". Bi rastî dema min xebata dîroka devkî dikir, min gelek şahidên Gelîyê Zîlan û Agirîyê re rû bi rû xeberda, di nav armanca min de tenê tiştek hebû, bila ew bîranînên wan nekevin bin axa sar. Min xwest ku ew bîranînên gelek şahidan bi kitêban û belgefîlman bigihêjin raya giştî û milete me. Ez çiqas biserketim û çiqas jî biserneketim, nizanim. Lê dixwazim bibêjim ku kî çi xebat kirîye mala wan ava be. Ji ber ku gelek tişt hatin nivîsandinê û pêşîya ji bîrkirine hat birîne. Bûyerên Gelîyê Zîlan û Agirîyê bê bîrkirine aliyekî tê wateya civat bê hafiza dimîne.

Dema mirov li weşanên heta niha dinihêre, dibîne ku gelek peyv û gelek sûcên ku hatine bikaranîn bi qestî hatine veşartin. Armanca wan ew e ku ew sûc bên ji bîrkirinê. Divê em tu caran komkujîya Gelîyê Zîlan û Berxwedana Araratê ji bîrnekin. Divê em van gotina guhe xwe de bikin guhar, hişê xwe de binivîsin û tu car bîra nekin. Dema min ev xebat dimeşand, ku salan berdewam kiribû, mijarek girîng derketibû pêşîya min. Mijara girtîgeha Edeneyê û kesên li wir hatibûn daliqandin. Heta van rojên dawî jî tu agahî tunebûn ku di girtîgeha Edeneyê kî hatibûn daliqandin. Girtîgeha Edeneyê teqez di nav axiftinên şahidên Zîlanê de hebûn yên ku me bi wan re hevpeyvîn pêkanîbû.

Wan teva digot ku piraniya kesên ku hatin girtin birin girtîgeha Edeneyê, li wir piraniya mirovên piştî darizandinan bi cezayên cuda hatin mehkûm kirin. Piraniya şahidan digotin ku hin ji van kesan hatin darvekirin û yên din jî bi cezayên cûr bi cûr mehkûm kirin. Gelek kes jî bi nexweşiyên cihê pêkitibûn û hinek ji wan ji ber nexweşiyên xedar jiyana xwe ji dest dabûn.

Ji Enqereyê fermaneke Mustafa Kemal di sala 1932 an de di dema nêzikî dawiya bûyeran tê heremê. "Cenabê wî dixwaze ku şakî bi zindî werin girtin". Qaşo êdî naxwazin mirovan bikujin, lê wan ji wir şûnde bi saxî bigirin. Piştî vê fermanê, wekî ku em ji rojnameyên wê serdemê fêr dibin, dewletê hezarî zêdetir kes girtîye û şandiye Edeneyê. Di wê şandinê de gelek kes di rê de nexwaş ketine, gelek kes jî jîyana xwe dest dane. Doza li Dadgeha Cezayê Giran a Edeneyê bi salan berdewam dike. Hin nûçeyên di rojnameyan de yên li ser girtîgeha Edeneyê ev in;

28 Çiriya Paşîn 1931, Rojnameya Cumhuriyetê;
"Rûniştina doza 700 kesên ji şakîyên Agirî wê vê hefteyê li Dadgeha Cezayê Giran a Edeneyê dest pê bike. Heta niha 192 kes anîne bajarê me. ”
"Darizandina şakiyên Agirîye vê hefteyê dest pê dike."

28 Çiriya Paşîn 1931, Rojnameya Akşam
"Adana, 27 (Taybet)- Şakiyên Çiyayê Agirîyê, ku dadgehkirina wan li Dadgeha Cezayê Giran a Adanayê tê meşandin, dê heft sed kes beşdar bibin. Ji ber ku salona dadgehê dê nikaribe girseyek ewqas mezin pêşwazî bike, dê doz vê hefteyê li avahiya sînemaya Asri were li dar xistin, wekî ku min berê jî agahdarî dabû. Tevî ku dozên van bersûcan berê li Dadgeha Cezayê Giran a Wanê hatibû destpêkirin, doz li ser pêwîstiya ku dadgeha temyîzê dîtî veguheziya Edeneyê. Heya niha 192 kes ji teşwîqên bûyerê hatine bajarê me.

Wekî din, dê van rojên din 240 kesên din jî bên bajarê me. Ji bilî vê, 91 kesên ji Ercîşê di roja 14 an ji Ercîşê derketin. Îhtîmalek mezin heye ku ew sibe êvarê (îşev) werin Adanayê. Wekî din, ji hêla Daîraya Istintakê ya Ercîşê ve hat ragihandin ku dê 62 girtî û 40 negirtî bêne şandin. "

24 Tebax 1932, Rojnameya Akşam
“Li Edeneyê 106 şakî têne muhakemekirin. Di nav wan de hin kesên Beg jî hene.
Adana, 23 (Taybet) - Darazandina rûnişteva nên Çiyayê Agirîyê îro jî berdewam kir. Bi 106ên hatine girtin bi rêz wek bi qefîle anîne dadgehê. Di dema dadgehkirinê de, ku sê demjimêran dom kir, tenê nasnameyên wan dikarin bêne eşkere kirin. Di nav sûcdaran de hin Beg û Begzade hene. Di nav wan de, Sico Axa û Yusuf İsmail, Bedri û Nadirzade İbrahim Beg yek ji parêzerên bajarê me Nazmî Bey tayîn kirin".

Dema ez li herêma Erdîşê pey şahidên komkujîyê digerîyam, em rojek çûbûn li gundê Pêrtaxê. Li wî gundî ez bi kurê Gulîzara Elîyê Mîrzê, Dirbaz Telek re axifîbûm. Di kovara Zendê de hevpeyvînek bi sernavê Çend Dîmen Ji Qirkirina Gelîyê Zîlan ji alîyê Îkram Îşler de hatibû weşandin, min ew bi dest xistibû. Di wê hevpeywînê de Gulîzara Elîyê Mîrzê weha behsa komkujîya Gelîyê Zîlan û girtîgeha Edenê dike;
"...Xencî Bekiran li sê cîhan. Cihek li Ada Xeybê bûye. Li Milk û Çaxirbegê hatine kuştin. Xasiya min digot meha havîne. Cinazê wan ma, go îcar agir berdanê. Go îca sê meh havîn çû îca em hatine nava wan. Îca go çawa bila teşbîh nebe heywanê ku mirar dibe a hestîyên wan bi hev ve dimînin. Go îca me ji îşlîkên wan ew nas

dikirin. Go me digot ev îşlikê Seîdê Miho ye. Ev îşlikê Sufî ye. Ev îşlîkê Alo ye, de Alo jî li Çakirbegê kuştibûn. Alo kurê Efendî ye. Go îca me hestîyên wan dixistine pêşa xwe, erdek dikola darikek davête ser, hinek xwelî davête ser, me lê dida em diçûn.

Bavê min revî. Îca çûbûn muxbîrî kiribûn, esker hatin bavê min girtin. Îca bavê min Sakelî li Erdîşê hate girtin. Ûso hat em birine Binalixê. Salek mabû diya min Hecî İsat li milê wê bû. Bi Ûsiv ve mabûne li mala meta Zeyneb. Mala pîrka te. Hecî Mihê û Ahmedê bavê te wê çaxê sivik bûn. Wan salekê bavê min di hefsê de xweyî kir. Piştî salekê hildan birin Edeneyê. Erê lê bavê min pênc- şeş salan jî di Hefsa Edeneyê de ma. Bavê min piştî sîyaseta Gelî heft salan hate girtin.
Lê zehf neçûn. Bekir Beg bû. Memed heye bavê wî Silo bû. Ahmê Şewêş bû. Mîrzê Baso bû. Şukrî bû. Elî bû. Li vir, li Erdîşê şikiyat çêbû, giregir hemû hatine girtin. Çûne Edeneyê. Şikiyatê wan jî Sidîqê Heso bû. Îca paşê de te nedî. Hinekan cih ji wê jê re dan, qet nehatin. Ev jî revîn hatin."

Dema ez li heremê dû şahidan digerîyam, carcaran ez bo axaftinê du caran, sê caran jî diçûme cem hinek şahidan. Ez bi îhtîmala gelo ez ê tiştên nû fêr bibim an na dubare diçûm cem wan şahidan. Ez ji wan cara dûyemîn çûbûm cem kekê Mehmet Polat jî. Mehmet Polat her du hevdîtinê me de bi berfirehî behsa Komkujîya Gelîyê Zîlan û girtîgeha Edenê wiha dikir; "Ez aniha 74 salî me. Min ev tiştanan mezinên xwe, bavê xwe hildaye. Evana qite qit min hemûya vana girt. Min mesela Gelîye Zîlan hemasa bav û dêya xwe pirskir. Wana jî biçik biçik min re behskir. Em kuda biçûna min her dem sual dikir. Em diçûne gund, bavê min erezîye me min nîşan dikir. Digot eva ye meye, eva ye meye. Niha jî erezîye me heye. Niha jî qismek erezîye me, dest hara ye daye(dewletê ye). Wî çaxî anîn hatin, herekî vana çar quriş dane van, erezîyên wan hemû kirin, male xezîne ye. Erezî nedidane wan, erezî jê standin.

Giregirên 32 gundan, 30 eşîrî, sed hebî di nava van da digrin û dibine girtîgeha Edene ye. Girtîgeha Edene ye, li wê derê ji nav da 30 heb wana, li vira înfaz dikin dikujin. Di nava van da kalke min jî heye. Kalke minî Efendî, ev jî di nav wan de bûye. Efendî ye Bedo. Navên van niha min hemû nivisîne. Hemû tesbitkirî cem mine. Eze niha vana jî bidim ber cavên te. Temamên van cem min e, tu vana lêkolîn bike. Vana jî 30 hebî di nava hebsê de infaz dikin. Hineka digirin diavejin hebisxanê, wanê dinê jî sirgûn dikin. Mefî dikin dişînin Anadolû yê, dişînin Trakya yê, cûda cûda cîya de mefî dikin. Qetlîama Gelîyê Zîlan aha dibe. Wanî çûn nefîyê, qismek wan hatin, qismek wan jî li wir ma. Eqreba me jî li wir man. Apê minî Ûnis, apê minî Seîd ewana çûn Erzîn ê. Evana li wan deran man, nehatin. Hinek çûn Çanakkale, evana zivirîn hatin. Yanî kismek hat, wanî din nehatin."

Di dawîya axaftina me de, çawa wî xeberdana xwe de kerem kirîbû, derxist çend rûpel da min. Dema li wan rûpelan nihêrî, min dît ku bi destnivîsa wî behsa bûyera Komkujîya Gelîyê
Zîlan tê kirin. Wî nêrînên xwe di çend rûpelan de bi zimane Tirkî nivîsîbû. Dema min lê nihêrî sernivîs gelek balkêş bû. Di girtîgeha Edenê de, 30 kesên giregirên eşîran navên 14 kesên ku hatine înfaz kirin. Gelek bala min kişandibû, navên wan bi zimane Tirkî wiha nivîsandibû;"
1- Mehmet Oğlu Mîrza Gomik Köyü İskanli Aşireti
2- Kasım oğlu Tahir, İncesu Köyü, Begiranli Aşireti
3- Oka oğlu Tahir, Kızılviran Köyü Abdoyi Aşireti

4- Süleyman oğlu Zekeriya Hacikaş Köyü Bekiranlı Aşireti
5- Selman Oğlu Mehmet, Partaş Köyü, Mikayili Aşireti
6- Kuli oğlu Cibir, A.Göze Köyü, Kalkanli Aşireti
7- Mîrza oğlu Muhyettin, Şor Köyü, Hamoylu Aşireti
8- Baso oğlu Mirza, Ziyaret Köyü Meğsoyi Aşireti
9- Bedo oğlu Efendi, Pirneşin Köyü, Ecoylu Aşireti
10- Reşit oğlu Mustafa, Macaris Köyü Halolu Aşireti
11- Murat oğlu Selman, Eğîs Köyü Celî Aşireti
12- Temir oğlu Mustafa Kardoğan Köyü, Hecideriya Aşireti
13- Hiso oğlu Ali Kertis Köyü, Abdoyi Aşireti
14- Hasan oğlu Hüseyin, Hasanabdal Köyü, Hamoylu Aşireti

Hemû kesên ku di vê heyamê de hatin girtin ji bo darizandinê şandin Edeneyê, girtîgeha Edeneyê. Piştî Serhildana Agiriyê, veguheztina piraniya serhildêrên Kurd berbi girtîgeha Edeneyê bû mijara gelek stranan jî. Weke ku tê zanîn, piraniya kesên ku çûne vê girtîgehê, gelekên ji wan venegeriyane. Hin serhildêrên Kurd bi derziyên kujer li zîndana Edenê de hatine kuştin. Yên din ji ber tîfoyê di girtîgehê de mirine. Hin ji wan jî ku piştî ku cezaye wan qediya vegeriyan Herêma Zîlanê. Hinek jî wan cihê yên Anadoluyê bi darê zorê hatin bicihkirin.

Di vê nivîsa xwe de dixwazim mînakekê din jî bidim. Paşê jî dixwazim derbasî mijara xwe ya esasî bibim. Mijara min cara ewil derheqa wan kesên hatine îdam kirin rojnemeyekê fermî de agahî hatibû weşandin. Min dixwest ez bi gotinên şahidên Zîlanîyan wan piştrast bikira. Dema ku em li herêma Zîlanê li ser pirtûk û belgefîlmê dixebitîn, min bi Mehmet Gurbuz re hevdîtin çêkirî bû. Bavê wî li girtîgeha Edeneyê de çend salan hatibû ceza kirin. Çîroka Mehmet Beg, ku şopên kûr ên wek êşa gel di rêzikên li ser rûyê wî de veşartî bû. Sekna wî pir balkêş bû. Ev malbat yek ji wan bi hezaran malbatan e ku jiyana wan di nav aloziyê de ye. Ji ber ku jiyan bi rêça xweya asayî didome.

Di Komkujiya Zîlanê de 44 endamên malbata Hesen Gurbuz ên ji gundê Gomikê anîne li gundê Cergeşînê ji aliyê leşkeran ve hatine gulebarankirin. Demek şûnda hestiyên malbata Hesen rakirine û birine li gundê Papişkînê û li wir devereke vala vedişerin. Kurê Hesen, Mehmet Gurbuz, li ser Komkujiya Zîlan, girtîgeha Edeneyê û sirgûnê, ku bavê wî tê de jiyabû, gelek tişt vegotin. Wî nusxeyek ji belgeya jidayikbûnê ya ku bavê wî li xerîbiyê daye wî cem xwe xwayî dikir. Me wêneyên wî û ev nasnama (kimlikê) kişandin.
Mehmet Gurbuz, şahidiya salixdayîna jiyana bavê xwe a li Zîlanê piştî sirgûniya wî dike: “Rojekê, bavê min çû li gundê Zîyaretê ez jî pêra çûm. Em çûn serdana Mihemedê Baso, ew jî ji sirgûnê vegeriya bû. Wana qala girtîgeha Edeneyê dikirin û digiriyan. Dîsa, ez bi bavê xwe re diçûm gundê Akrakê; li wir Bekirê Delo ji sirgûnê vegeriya bû. Carna me berê xwe dida gundê Axbaş; li wir me berê xwe dida Siltan, ew ji girtîgeha Edeneyê sax filitîbû. Aşê arê wî hebû. Navê jina wî Hevsê bû. Piştî wê, ez bi bavê xwe re diçûm mala Mistefayê Tosin Axa. Ew jî sirgûn kirîbûn. Mistefayê Tosin Axa bavê wekîlê AKP ê Kerem Altun e, ku di 2007 an de ji Wanê wekilê meclisê hate hilbijartin. Kalikê Kerem Altun, Tosun Axa sirgûnê Denizliyê bûbû. Bavê wî ev yek digot. Wî digot ku, "mexbere bavê min Tosun Axa li Denîzliyê ma."
Çawa ku min li jor jî behs kir, girtîgeha Edeneyê her tim di rojeva kurdan de mabû. Lê heta îro, agahiya me ya berfireh tunebû ku kî birine girtîgeha Edeneyê û kî hatiye îdam kirinê.



Ağrı İsyanının İdam Mahkûmları Kimlerdir?

(Adana muhabirimizin gönderdiği tafsilâtı lûtfen 11 inci sayfamızda okuyunuz.)

Îro lêkolîner û nivîskarê kurd Huseyîn Siyabendî li ser hesabe xwe yê medyaya civakî Twitterê nûçeyek weşand û rê li ber vê lêkolînê vekir ku sipasdarê cenabê wî me. Ez çend roj şûnde çûm cem wî camêrî, min xwest ku ez wan gotar û wêneyê bigrim û di nivîsa xwe de bikarbînim. Gelek kêfxweş bû û destûr da min.

Ez bi van agahiyan gotara xwe diqedînim. Li ser bingeha belgeyê, heta îro cara yekem em belgeyekî fermî derbarê navên Kurdên ku li girtîgeha Edeneyê de hatine dalîqandin, dibînin. Hejmara rast a hûrguliyên di vê belgeyê de nayê zanîn, ji ber ku pelên li ser doza darizandina serhilderan hîn ne vekirî ne. Ew bi gotara rojnameya Swêdî Dagens Nyheter re, ya 23ê Gulana 1932an, lihevdikeve.

Li gorî vê nûçeyê, "di dawiya darizandinên ku li Edeneyê hatin kirin de, ji bilî kesên firar û biçûkan, 44 hukmên îdamê hatin dayîn. 31 kes (navên wan ne diyar in) hatin îdam kirin".

Li wî belgeyê navên 30 ji van 31 kesên ku navên wan ne diyar in cihgirtine. Kesê ku nûçe nivîsandiye diyar dike ku navê yekî ji wan awarte(mustesna) ye û navên yên din dinivîse. Di vê belgeyê de navên ku hatiye nivîsandin"

"Adana (Taybet) - Min di derbarê biryarên kesên ku ji beşdarbûna serhildana Agiriyê xilas bûne agahdar kir.

Ji xeynî van, 250 êşên din li benda diyarkirina edaletê ne. Kesên ku cezayê darvekirinê lê hatiye birîn û ji ber temen cezayê wan hatiye kêmkirin, 31 kes wê bên îdamkirin. Ji xeynî navê yekê, ez nasnameyên yên din tomar dikim.

Tîmur, kurê Reşît, ji gundê Ercişin Macaris,
Mustafa, kurê Tosun ji Akaraktan
Abdulkadirê kurê Mistefa ji gundê Tello yê Sêrdînê ye
Mirza kurê Mistefa ji gundê Erçişin Süleymanağa,
Kurê Baso Resit ji Ziyaretê
Kurê Baso Mîrza ji Ziyaretê,
Ahmet, kurê Silo ji Kurdenkaz
Kenan, kurê Şemdîn ji Kurdenkaz,
Memu, kurê Haso ji Espisînekê,
Alî, kurê Huseyin ji Akizê,
Bişar, kurê Osmanê ji Sûskûnê,
Omer, kurê Ahmi, ji Ezîka Jêrîn
Cemşît, kurê Hacî ji Ezîka Jêrîn,
Brahîm, kurê Silêman ji Hacıkaşê,
Halit kurê Mahmut ji Kellekûpê,
Suleyman Ali ji Yekmalê,
Reşît, kurê Hesen ji Ahîzdanê,
Ûsifê kurê Silêman ji yê Güzel(Bedew),
Hamo kurê Omer ji Ahizê,
Hamid, kurê Alî ji Kûrdenkazê

Husêyînê kurê Mistefa ji Ahîzdanê,
Cabir, kurê Kuli ji Hakê,
Esmi kurê Kolos ji Kilîsê,
Omer kurê Beşîr ji Kadiraskerê,
Sait, kurê Hecî ji Ezîkê,
Sûslû Abdullah, kurê Mistefa, ji gundê Bayik ê Wanê,
Şakir, kurê Mustafa ji gundê Cancakpur girêdayê Ercişê,
Xoce Ûsif, kurê Ali, ji Yekmalê
Hesoyê kurê Silo ji Yekmalê,
Osman, kurê Muhyi, ji Ahizê. "

Dawîya dawî de, li gorî vegotina Mehmet Gürbüz; ‘Mirzê Baso, Mihemedê Baso, Elîyê Baso, Reşê Baso, Evdîyê Baso… Yanî, pirraniya malbata Baso di wê beşê de bûn" û bi wê belge va gelek nav hevdû piştrast dikin, lihevdikevin. Divê mirov li ser wê mijarê pir bisekine û kur bikole. Di wê nivîsê de navên belgeyên fermî û yê xebatên dîroka devki me berhev kirîbû me cara ewil anî ba hev.

Erê bi gotina Zîlanîyekê; "bila Xwedê wan rojan careke din nîşanî dijminên me neke". Tiştên civata me re gotin; bîranîn qedexe ye, em jî dibêjin bîranîn jîyan bixwe ye. Heta hetê em e jana xwe, êşa Zîlanîyan bîr bînin. Tiştên herema Zîlanê pêk hat, ew dikare li her heremê dubare bibe. Ji bona wan tiştan em dibê hişîyar bin. Ji ber ku tu kesek me ji van xetereyan rizgar nake. Bi bîranînê, em dikarin pêşîya bîrakirine bigirin û xwe xwe rizgar bikin.

Çavkanî;

Hevdîtina min û Mehmet Polat 21.06.2015
Hevdîtina min û Mehmet Gürbüz 17.06.2015
Kovara Zend, Payîz 2010
Arşîva Rojnama Cumhurîyetê- Şaredarîya Mezin a İstanbûlê Kitêbxana Ataturk
Arşîva Rojnama Akşamê- Şaredarîya Mezin a İstanbûlê Kitêbxana Ataturk
Arşîva Rojnama Son Posta 27 Nisan 1932, (Hüseyin Sîyabend)





SULTAN YARAY

Dayê

dema di bêdengiyeke bê xatirxwestin de
min berî xwe da warê bêdengiyê
tu bigre şîna min
zêmaran bibêje
li ser çîroka min a dirêj
li ser emrê min ê kin û êşên min ên bêdeng
dengê xwe zêde raneke
hêdîka di ber xwe de mîna ku
di ber dergûşa min de tu dilorînî bilorîne
bi sewteke nerm û nizm binuhurîne
ger tu biqîrî
ew ê teyrok li biharan bên xezebê
ew ê xalxalok bixeyîdin ji biharan
na neqîre dayê tu neqîre
jiwe gava ku min xatir ji malzoroka te
xwestibû tu têra xwe qêriya bû
qêrîna te
bibû despêka jiyana min a ku îro mirinê
hêmbêz dike
neqîre
hêdîka dilê min derxe ji sînga min
bi nameyekê bişîne ji evîna min a xenqî re
bila ji xwe re bike berbejn û bi ser dilê xwe
dake
bila ew biqîre
bi qêrîna xwe
bila di çavên Mem û Zînê de
Bekoyan bifetisîne
bila biqîre
biqîre û biqîre
bila qêrîna wî bibe dengê
hemî evîndarên bê mirad
bila biqîre û biqîre.

www.arsivakurd.org

Lokman Polat

ŞÊWEYEKE WÊJEYÊ : CERIBANDIN



Wek xwendevanekî gotarên ceribandinê, ez dixwazim xwendevanên ku ji nivîsên ceribandinê hez dikin, bila ceribandinên Faîk Ocal, Enwer Karahan, Mustafa Aydogan, M. Zahît Ertekîn, Xalid Sadînî, Occo Mahabad, Welat Dilken, Çorê Arda, Dilazad Art, Bawer Yekta, Sîdar Jîr û hwd, bixwînin.

Bi kurdî nivîsîna ceribandinan gelek kêm e. Pirtûkên xwerû bi kurdî ên ceribandinan hindikin. Hinek nivîskarên ku bi kurdî dinivîsin, ceribandin û kurteçîrokê tevlîhev dikin. Ceribandin û kurteçîrok eynê-heman- tişt nîn in. Dema me li ser navê weşanên Helwestê xwest ku pirtûkek ji kurteçîrokên nivîskarên kurd, kurteçîrokên helbijartî amade bikin, hinek nivîs her wekî kurteçîrokê ji me hatin şiyandin. Me lê nêrî ku ew nivîs kurteçîrok nînin, ceribandinin. Ji bo vê sedemê, min pêwîst dît ku li ser ceribandinê vê nivîsê binivîsim.

Ceribandin çiye?

Ceribandin şêweyeke edebiyatê ye. Di nav edebiyatê de tê hesibandin. Ceribandin berhema ziman û stîla şêwaz e. Metodeke taybetiye. Naveroka nivîsên stîla ceribandinê dikare ramanî be, hîsî be, bi êş be, hîcîv be.

Ev stîl nivîs carma bi îmgeyan yanê bi xeyal û îmajan jî tê xemlandin. Di nivîsîna ceribandinê de sînor û çerçeveyên destnîşankirî tune ne. Nivîsên herî ciddî, yên felsefî jî bi şêweya stîla ceribandinê tê nivîsîn. Di van nivîsan de temaya siyasî, axlaqî, zanistî, folklorîk û hwd, gelek mijar hene. Li ser berhemên edebî (her wekî roman, çîrok, helbest û şano) jî nivîsên ceribandinê têne nivîsîn. Gelek nivîskar di berhemên xwe yên ceribandinê de giranî didin ser folklorê, yan jî ser ramanê. Hinek nivîskar helwestên xwe yên siyasî û pirsgirêkên civakî di nivîsên ceribandinê de tînin ziman.

Berhemên ku bi navê pirtûkên ceribandinê têne binavkirin di kurdî de hindikin. Bi tirkî gelek hene lê ew jî ewqas pir nayên firotin. Xwendevanên pirtûkên ceribandinê, xwendevanên taybetî ne, entelektuel in. Di welatên Ewropa rojava de pirtûkên ceribandinê gelek têne firotin û têne xwendin. Di van welatan de, ji bo van pirtûkan eleqeyeke mezin heye, întrese heye.

www.arsivakurd.org

Berhemên ceribandinê asoya fireh ya nivîskaran dide xuyakirin. Nivîskar bi vê şêweyê li ser gelek babetan nirxandin û şîroveyên xwe tîne ziman. Ew li ser babetên curbecur dîtin û ramanên xwe bi metodeke taybetî pêşkêşê xwendevanan dikin û xwendevanan ji gelek tiştan agahdar dikin, wan perwerde dikin û bi vê metodê mîsyona zanîstiyê bi cîh tînin.

Nivîskar di ceribandinên xwe de helwesta xwe vekirî, zelal û eşkere diyar dikin. Ji bo ku dîtin û ramanên xwe bi xwendevanan bidin fêrkirin û rastiya helwest û ramanên xwe derxin holê, gelek caran ji fîlozofan, ji însanên zanîst hevok digrin û di nav nivîsa xwe de şîrova wê dikin.

Di berhemên ceribandinê de, şîroveyên nivîskaran yên li ser evînê, başiyê, xirabiyê, bextiyariyê û nostaljiyê hene. Li ser jiyana mirovan, nasnemeya mirovan, rola kesan ya civakî û sosyal herî baş di nivîsên ceribandinê de tên şîrovekirin. Nivîskar A. Ventura di ceribandineke xwe de dibêje : " Yê ku mirov dike însan nasnameya mirov û rola mirov e."

Heger bi yek gotineke mirov bibêje ; Ceribandin radana ramanî ye.

Wek min di destpêka vê nivîsê de jî got, di nav nivîskarên kurd de yên ku nivîsên ceribandinê dinivîsin gelek hindik in. Nivîskarên kurd kurteçîrok, roman û helbest dinivîsin, lê ceribandin nanivîsin. Rahmetî Mehmed Uzun pirtûka nivîsên ceribandinê weşandibû.
Lêbelê pirtûka Mehmed Uzun a ceribandinê bi tirkî ye. Nivîskar Mustafa Aydogan jî bi tirkî û kurdî nivîsên baş ên ceribandinê dinivîse. Min jî gelek nivîsên ceribandinê nivîsî û di kovar û malperên kurdî de weşand. Ez li ser dixebitim ku pirtûkek ku hemû ji nivîsên ceribandinê pêk bê biweşînim.
Wek xwendevanekî gotarên ceribandinê, ez dixwazim xwendevanên ku ji nivîsên ceribandinê hez dikin, bila ceribandinên Faîk Ocal, Enwer Karahan, Mustafa Aydogan, M. Zahît Ertekîn, Xalid Sadînî, Occo Mahabad, Welat Dilken, Çorê Arda, Dilazad Art, Bawer Yekta, Sîdar Jîr û hwd, bixwînin.

Pirtûkên ceribandinê bi giranî berhemên ramanî ne. Di nav nivîskarên cîhanê de nivîskarên xwediyê pirtûkên ceribandinê yên navdar Montaîgne, Bacon, Gîde, Pappînî, Huxley û hinekên din in. Di nav nivîskarên tirkan de jî Ferîd Edgu, Fusun Akatli, Ahmed Altan, Dogan Hizlan û Mehmed Fuat pirtûkên baş û balkêş yên ceribandinê weşandine.
Di nivîsên ceribandinê de gotinên gelek balkêş tên gotin, hevokên girîng tên sazkirin. Wek mînak, dema mirov di nivîseke ceribandinê de li ser pirtûkê van gotinan bibêje, ev gelek bala xwendevanan dikşîne û wan dide fikrandin.

- Ji yê ku bibêje vê pirtûkê bixwîne netirse, ji yên ku xwendina pirtûkê qedexe dike bitirse.
- Yê ku pirtûkê herî baş dixwîne, yê ku pirtûkê werdigerîne ye.
- Pirtûka herî baş û xweş ya ku hêj nehatiye nivîsîn e.
- Pirtûkên herî navdar, yên ku herî hindik têne xwendinê ne.
- Pirtûk zehîr-jahr- be jî, panzehîra wê dîsa pirtûk e.
- Yê ku dijminê pirtûkan be, dijminê mirovahiyê ye.



Morî Xanim

Şahsî û Hezkirin

Ez gava te dibînim
Hêste kî cûda didilive di dilê min da
Bişîrekî di rû yê min da cî dibe
Û hêvî kî nû diafire di dilê min da
Paşê Şewqeq di çavê min da çirûsk dide
Ew dilê min ê qerisîye carek da dipije ji kela dilê te
Bêhnekî aramî dikişînim nava cergê xwe û tê da dihêlim
Rihê min wek perperokek difire ji şa bû na dîtina te
Bayek li nava rûyê min dixwe wek tu rûyê min hembêz dikî hîs dikim
Laşê min ji hêza bayê dicirife
Lê bi şewqa çavê te carekta germ dibe
Fikrên tu tê da yî êşê nade ev dilê
Lê şahîyek bê dawî dide ev dilê
Fikr û ramanên tarî û reş bi dîtina te wenda dibe
Ba hêza xwe zêde dike li ser rûyê min
Lê ez ji xweşikbûna te hêza bayê xem nakim
Tu stranê xemgîn îşev nikarin şahiya te yê xweşik ji dilê min bavêje
Şahî û hezkirîya ev dilê tu yî tu.

www.arsivakurd.org



Kovara "Hawar" bi herfên latînî yên Celadet Bedirxan amadekirî û "Rya teze" bi herfên latînî yên kurdên Sovyet yên Erebê Şemo û Î. Marogûlov amadekirî.

TÊMÛRÊ XELÎL

KURMANCÎYA ERMENÎSTANÊ Û KURMANCÎYA ”HAWAR”Ê WEKEHEV E!

Hinek ronakbîrên kurdên dervayî Yekîtîya Sovyet gelek caran bi rastnivîsandina me - kurdên Sovyetistana berê - qayîl nabin û bona gotinên xwe mak bikin, rastnivîsandina ”Hawar”ê wek bingeh qebûl dikin. Ez di vê pirsê da ne her dem bi wan ra me û timê ser wê bawerîyê me, ku rastnivîsandina me ji rastnivîsandina wan ronakbîran rasttir e û gorî qanûnên zimanê me ye. Lê qayîlnebûn tiştek e, îzbatkirina rastîya kurmancîya me tiştek din e.

Ji bo vê armancê min berê xwe da ”Hawar”ê û ji ”Hawar”ê jî ez tenê li ser nivîsên Celadet Bedirxan (Herekol Azîzan) sekinîm, ji ber ku ew ”mejûyê” wê kovara kurdî ya delal e. Û ez hatime ser wê bawerîyê, ku kurmancîya me û ya ”Hawar”ê hema bêje wekehev e, lê kurmancîya wan ronakbîran û ”Hawar”ê ji hev cuda ye. Li jêr ezê nimûneyan bînim.

Di pirsa tewandinê da:

Kurdên Sovyeta berê dema tewandina gotinan forma gotinan diguhêrînin. Wek nimûne: ”Ewî dêrî vekir”, ”Heso çûye ber pêz”, ”Gulîzer ji bajêr tê”. Di vê pirsê da ”Hawar” û Celadet Bedirxan wek me dinivîsin, lê ne wek hinek ronakbîrên kurdên Ewrupayê û Kurdistanê.

Ji bo nimûne: Di hejmara 24an a kovara ”Hawar”ê da, di gotara: ”KURD Û KURDISTAN BI ÇAVÊ BIYANIYAN” da (rûpel 2, stûn 1, xet 18) hevokeke wa heye: ”Mêr diçin ber pêz...”. Li vira pez bûye pêz. Nimûneyên wa di hejmarên mayîn da jî hene, xwesma di hejmara 55an da: ”Heb bi pêz ketibû”, ”...li nexweşiya pêz hûr bû”, ”Lawik anîn bajêr” (di rûpelê 4an da), ”Lê ji ber ku di lêwik da tu hêvî ne ma bû...” (rûpel 5), ”Ji ber ku bêv di wî bajarî de...” (rûpel 2); di hejmara 44an, di nivîsa ”Tefsîra Quranê” da: ”Herwekî wan ji rastiyê xwe dane paş, erna Yezdên giha wan...”, di hejmara 56an, di miqala ”SIR JAMES YOUNG SIMPSON 1811 - 1870” da (rûpel 2, stûn 2, xeta 15an) ”...bijîşkine welêt lê ezimandin” û h.w.d.

Tewandina gotinan di navên nivîskarên gotaran yên di ”Hawar”ê da çapbûyî da jî xuya dibe, wek: Cemîlê Tacdo, Hesenê Mistê, Smaînê Serhedî, Evdirehmanê Rojkî, Sibhîyê Diyarbekirî, Masûmê Hamîdî, Remoyê Qenco, Silêmanê Ferho, Xelîlê Gênco, Bişarê Segman, Hisên Emînê Perîxanî, Yehyayê Seyda, Qadirê Ferman. Ev cûrê nivîsara navan niha hema bêje tenê li bal kurdên Sovyeta berê maye, wek: Erebê Şemo, Hecîyê Cindî, Xelîlê Çaçan, Emînê Evdal, Şeroyê Biro, Eznîva Reşîd, Zadîna Şekir û h.w.d. Hela di ser da, me navên dengbêjên ermenî jî dikire di nav qalibê kurdî da, ku destûra me tunebû jî, lê me ew yek ji bo wê yekê dikir, ku guhên kurdên me hînî cûrê kurdîyê bin. Wek: Aramê Tîgran, Karapêtê Xaço, Davîtê Xilo û yên din. Lê navên wan ne bi navê bavê wan va dihate nivîsar, lê bi paşnavê ra tevayî dihate nivîsar, wek Aram Mêlîkyan, Karapêt Xaçatryan û h.w.d.

Gelo ji kurdên dervayî Sovyeta berê çend kes bi vî awayî dinivîsin? Yên ku ez zanim, tenê Hesenê Metê, Nura Şane, Zinarê Xemo û Şahînê Bekirê Soreklî ne. Gelo we çima ji bîra kirîye, ku Ahmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Dewrêşê Evdî, Evdalê Zeynikê, Bişarê Çeto, Elikê Battê, Rizayê Xêlit bi wî awayî (em jî wek wan) nivîsîne. Gelo ji kurdên Kurdistanê, ku niha li Ewrupayê dimînin û zordestîya tirkan û ereban li ser tune, çend kesan navê xwe guhartine û niha bi awayê kurdî dinivîsin? Çend kesan navê xwe guhartine, kirine kurdî?

Di pirseke din da jî, ku bi rastnivîsandinê va girêdaye, kurdên Sovyeta berê û ”Hawar” hemfikir in. Ew pirsa tewandina wan gotinan e, ku bi vokalan va kuta dibin. Ji bo nimûnê, gotina kitêbxane, di dema tewandinê da bal kurdên Sovyeta berê dibe kitêbxana, lê ne ku kitêbxaneya. Navê Zerê, ku keça Ûsiv e, dibe Zera Ûsiv, lê ne ku Zerêya Ûsiv. ”Hawar” jî di gelek ciyan da wek me nivîsîye. Wek nimûne, di hejmara 35an, di miqala ”KURDÊN ECEMISTANÊ Û HALÊ WAN”, di têbinîyê, xeta 5an da em dixûnin: ”...di çayxanekê da me bihna xwe dida”.

Di hejmara 56an, rûpelê 3an, ji jêl va xeta 11an da hatîye nivîsar: ”...di dawiya emirê xwe de bi nexweşîke welê ket...”, hejmara 55an, rûpelê 3an, stûna 2an, paragrafa 5an, xeta 4an da jî gotina nexweşîk (lê ne nexweşîyek) derbaz dibe. Di hejmara 32an, di miqala bi sernivîsara ”KARDÛX Û WELATÊ KARDÛXAN”, ji dawîyê xeta 5an da em dixûnin: ”Diviya bû di Diclê re derbas bibin”. Di stûna rex wê da, paragrafa 9an wa destpê dibe: ”Lê ji ber ko yewnanan nikari bû di Diclê re derbas bibin...). Eynî gotin bi cûrê Diclê, lê ne ku Dicleyê, di têbinîya wê miqalê da jî derbaz dibe.

Wekehevbûna kurmancîya ”Hawar”ê û ya kurdên Ermenîsytanê û tevaya Sovyeta berê di bikaranîna gotina yê ku (ya ku, yên ku) da jî xuya dibe, ku kurdên din hema bêje bi kar naynin û hela di ser da jî şaş dibînin. Ji bo nimûnê, kurdên Sovyeta berê vê gotinê wa bi kar tînin: ”Silo, yê ku gunehkarî kiribû, li xwe mukur hat...”, ”Sîsê, ya ku di mektebê da baş dixwend, îsal kete Ûnîvêrsîteyê”. Em ”yê ku”, ”ya ku” û ”yên ku” ji bo merivan û ruhberan bi kar tînin, lê ji bo tiştan em gotina ”kîjan” bi kar tînin, wek nimûne: ”Tivinga Heso, kîjan winda bûbû, hate dîtin” û h.w.d. Nimûneyên wa ji ”Hawar”ê: ”Smaîl axayê Şikakî, yê ko bi navê Simko deng daye...”, ”Herçî mezinên kurdan, yên ko av bi wan sar û germ dibû” (hejmar 35), ”...zimanê ibranî, yê ko berî 30-40 salan zimanekî mirî bû...” (hejmar 40), ”Ehmedê Xanî, vî şairê kurdan ê mezin, yê ko daye pey her tiştê miletê xwe...” (hejmar 42), ”Dr. Sîmpson, yê ko ji êşa xelkê re derman peyda kiri bû...” (hejmar 56) û h.w.d.

Di pirsa nivîsandina navên biyanîyan da jî kurdên Sovyeta berê û ”Hawar” ser rêkê ne. Di hejmarên 55 û 56an da Herekol Azîzan di miqalên bi sernavên ”Yên ko xizmetî însaniyetê kirine” da navên biyaniyan him wek hene nivîsîne, him jî bi kurdî nivîsîne. ”JAMES YOUNG SIMPSON” û bi kurdî - ”CÊMS YÛNG SÎMPSON”; û ”LOUIS PASTEUR” û bi kurdî - ”LWÎS PASTOR”.

Di hejmara 56an, rûpelê 2an da navê bajarê Edinburg bi cûrê kurdî - Êdînbûrg hatîye nivîsar. Kurdên Elegezê, an jî Şirnaxê ne mecbûr in bi îngilîsî bizanibin, da ku navê Klînton wek Clînton binivîsin.Bal kurdên Sovyeta berê bi kêmanî du gotin hene, ku ji dervayî wan hema bêje tu kes bi kar nayne, lê di ”Hawar”ê da ez rast pê hatim. Yek ji wan gotinan gotina wekî ye, yek jî pê ye. Em vê gotinê - wekî - cîna wek eger, cîna jî dewsa ku bi kar tînin. Wek nimûne: ”Wekî tu gotineke xwe dibêjî, dudê hevalê xwe jî bêje”, ”Wekî tu hatî, bi xwe ra bîne”. Li van hevokan da wekîya me eger e. Û bi wê manê di ”Hawar”ê da jî çend nimûne hene, wek: ”Babê keçkê got: Axa wekî tu cihê Jêliyan hemî bidî min, ez keça xwe nadim te” (di hejmara 34an, di gotara Herekol Azîzan ya bi sernivîsara: ”JI EŞÎRÊN BOTAN: JÊLIYAN” da, rûpelê 4an, stûna 2an, paragrafa 5an, xeta 1ê). Wekîya vê hevokê tê maneya eger.

Di ”Hawar”ê da hinek gotin jî hene, ku niha tenê kurdên Sovyeta berê bi kar tînin. Ji bo nimûne, di hejmara 40î, di rûpelê 5an, stûna 2an, xeta 10an da hevokeke wa heye: ”Yehûda nanê tisî dixwar…”. Gotina tisî di nav kurdên Sovyeta berê da gelek belabûyî ye (Nanê tisî, pê fetisî) û tê maneya nan bi tenê, bêy pêxwarin. Di kurdîya me da nanê sayî jî heye. Dema mêrê kurd ji kevanîya xwe ra dibêje ”nan bîne”, her kes fêm dike, ku gerekê her tiştê xwerinê bîne, ango ne tenê nan. Lê gava di dema nanxwerinê da nan bi tenê xilaz dibe (lê xwerin maye, xilaz ne bûye) û mêr dixweze ji xanima xwe ra bêje, ku tenê nan bîne, dibêjê: ”nanê sayî bîne”.

Niha em bêne ser gotina pê. Kurdên Sovyeta berê vê gotinê gelekî bi kar tînin. Ji bo nimûnê: ”Ewê serê xwe pê laçikê girêda”, ”Xezal pê sergîna tendûr dada”, ”Memo mast pê nan dixwe” û h.w.d. Xuya ye ”pê” ji ”bi wê” çê bûye. ”Hawar” jî gelek cîyan vê gotinê bi vê fikrê bi kar anîye. Di hejmara 40î, miqala: ”ZILAMEK Û ZIMANEK”, di stûnên 2an û 3an da ev hevok hene:

”…divêt cihiyan jî weke xelkê zimanek hebe û têk de pê baxêvin”, ”…me zimanekî delal heye û em pê daxêvin”. Di hejmara 55an, di miqala: ”YÊN KO XIZMETA ÎNSANIYETÊ KIRINE LWÎS PASTOR (LOUIS PASTEUR)” da (stûn 2, xet 8) em dixûnin: ”Ez dibêjim qey bihina min wê pê vebiya”. Di hejmara 56an da Herekol Azîzan di miqala xwe ya rûpelê 2an da çapbûyî da hevokeke wa bi kar anîye: ”Min tukes nas ne dikir, ko sebira xwe pê bînim”.

Vira ez dixwezim bala we bikişînime ser gotina tukes jî.

Her tişt nîne, ku kurdên Sovyeta berê bi ”Hawar”ê ra qayîl in û gerek çavgirtî wek wê bikin. Em wê gotinê cihê dinivîsin, wek tu kes. Û tu kes nikare me ji wê rastîyê dagerîne. Di ”Hawar”ê da gelek gotinên wisa hene (wek tucar, nexweş), ku bi hev va hatine nivîsar û fikreke tam cihê - bazirgan û nexweş - didin. Lê eger cihê bêne nivîsar (tu kes û ne xweş), fikra rast: hîç kes û bê tam didin. Di miqala Herekol Azîzan ya di hejmara 56an de ya bi sernivîsara YÊN KO XIZMETA ÎNSANIYETÊ KIRINE CÊMS YÛNG SÎMPSON ”SIR JAMES YOUNG SIMPSON 1811 - 1870” da hevokeke wa heye: ”Ez piçûk, feqîr û hov gihaşti bûm Êdînbûrgê. Min tukes nas ne dikir ko sebira xwe pê bînim”.

Di hejmara 24an, di miqala: ”KURD Û KURDISTAN BI ÇAVÊ BIYANIYAN” da, di têbinîya (not) 1ê, di xeta pêşin da em dixûnin: ”Ji ber ku em kurd tucar Xwedê ji bîr nakin…”. Vira gotina tucar gerek cihê bê nivîsar, wek tu car. Eger wisa nebe, bazirgan tê fêmkirin.

Eynî gotin di helbesta ”MIRINA GURÎ” da derbaz dibe, ku bi wergera C. A. BEDIR-XAN di hejmara ”Hawar”ê ya 31ê da çap bûye:

”Û ji cewrikên xwe re bibêje,
Mebin nîzing, tucaran…
Avahiyên ko mirov tê de”.

Di hejmara 55an, rûpelê 2an, paragrafa 3an da hevokeke wa heye:

”Lê kur ne şerê însanan; lê şerê nexweşiyan dê bikira”. Li vira gotina nexweşiyan gerek cihê bihata nivîsar - ne xweşiyan.
Sernivîsara helbesteke şairê kurdên Sovyeta berê Simoyê Şemo ”Tu ne yarî, tu neyar î” nimûneke wisa xweş e, ku wek dibêjin, dikare di vê pirsê da ”serê lodê bigire”.

Kurdên Sovyeta berê bi wê yekê ra jî ne qayîl in, ku ji bo çi dema gotinek bi herfa ”î” xilaz dibe û paşpirtika ”ya” di ser da zêde dibe, ”î” diguhêre û dibe ”i”. Wek nexweşî - nexweşiyên, arîkarî (çima ne alîkarî?) - arîkariya û h.w.d.
Nivîsara bi zmanê kurdî, xwesma bi zaravê kurmancî, di nav kurdên Kurdistana Bakur û Kurdistana Rojava yên kurmancîaxêf da bi piranî berî çend deh salan destpê bû û bi xurtî pêşda çû. Û ji bo wana bingeh gerek ne tenê ”Hawar” û Celadet Bedirxan bûna, lê rojnama ”Rya teze” û edebiyeta kurdên Sovyeta berê jî, ku berî ”Hawar”ê hebûne û bi kurmancî gelek berhemên hêja çap kirine.

Min bi xwe ji herduyan jî - ji ”Rya teze” jî, ji ”Hawar”ê jî - feyda dîtîye. Û bawer nakim, ku eger min xwe bida tenê alîkî, wê başti bûya. Û gerek em wek hinekan nefikirin, ku ”20 hezar kurdên Sovyeta berê ber 20 mîlyon kurdên Kurdistana Bakur çi ne ku?”. Rastî piranîyê va girêdayî nîne. Celadet Bedirxanên kurdên Sovyetê jî hene û di hêla zimên da yê herî navdar ew profêsor Çerkez Bakayêv (Çerkezê Xudo) e, ku serokê beşê bû di Înstîtûta Zimên ya Akadêmîya Zanyarî ya Sovyetistana berê da. Wî bi rûsî dersên zimên didan doktorên rûs û miletên din, lê karê wî yê bingehîn di hêla zanyarîyê da çareserkirina problêmên zimanê kurdî bû. Û ewî ser zimanê kurdî gelek pirtûk çap kirine, piranîya wan bi rûsî ne. Lazim e, ku ew bi cûrê wergeran bigihîjine gelê me.
Eger em wisa bikin, ewê ji zimanê me ra tenê karê bîne û zimanê me dikare hîn pêşda here. Wê demê her kurdek bira ji xwe pirs bike: gelo çima HEWARa kurdî bûye HAWAR?



www.arsivakurd.org

Roger Acun

HÊSÎRÊ ÇÎYAYÊ ŞENGALÊ

www.arsivakurdi.org



Hêsîrê Çîyayê Şengalê ye
rûyê te genimî
awirên te agirîn
bala te li tavê
pala te li peyvê ye

Tu hêsîrê Çîyayê Şengalê yî
bêhna şeveqa gulanê tê ji destên te
xwelîya barûdê tevlî xwîna te bû ye
mayin dikele xwîna te.

Tu hêsîrê Çîyayê Şengalê yî
xerîbê mirina nav lihêfan
şervanê şerê giran ê binamûs
hafizê Mishefa Reş
û dildarê Melekê Tawus.

Tu hêsîrê Çîyayê Şengalê yî
cellat roja dijmêrin
ji bo serjêkirina te
desmala te yî binexş
govenda te ye îro li Laleşê.

Tu hêsîrê Çîyayê Şengalê yî
axa, şerabê didin paşa
di tasa serê te
ezê kirasê xwe biçirînim
li ser te.



Îkram Oguz

ŞÊX SİLÊ YA JÎ SÊWÎ SİLO

Şêx Silê, bi navê xwe yê din "Sêwî Silo" dengbêjek ji dengbêjên Kurd ê navdar ê.
Di navbera dawîya sedsala 18an û destpêka sedsala 19an da jîyaye û hemdemîyê Evdalê Zeynikê û Gul a File ye.
Lê di kîjan salê da û li kû hatîye dinê, di kîjan salê da dinya xwe guhartîye, sedîsed nayê zanîn.
Ev yek jî parçeyek ji qedera dengbêjan, ew jî bi qedera kurdan va girêdayî ye.
Kurd miletek bindest in û ji dîrok û çand û hûnera xwe hatine dûrxistin. Loma lêkolînên di derbarê dengbêjan da hatine kirin, kêm in. Qasî kêmanîya xwe agahîyên tê da cîh digrin jî ji hev cuda ne. Jiber ku çavkanî bi pirranî çavkanîyên qeydkirî nînin û di arşîvan da cîh nagrin.
Wek hemû xalên jîyanê, agahîyên di derbarê dengbêjan da jî, bi devkî ji nifşên berê derbasî nifşên nû bûne. Di wê derbasbûnê da hinek agahî kêm bûne hatine jibîrkirin, hinek agahî jî tevlihev bûne û hatine guhartin.

Loma dema bûyîn û mirina Şêx Silê û jîyana wî jî tam nayê zanîn. Di hinek lêkolînan da tê gotin, ku Şêx Silê bi eslê xwe ji herêma Serhadê, ji bajarê Agirîyê ye. Li gundê Zîyaret a bi ser Patnosê jîyaye û dengbêjê Emîn Paşa bû ye. Dû ra berê xwe daye rojhilatê Kurdistanê û çûye li herêma Qelenîyê, di qonaxa Tahir Xanê Qelenîyê da dengbêjî kirîye.
Li vir agahîya bêşîk û rast ew e, ku Şêx Silê li Qelenîyê jîyaye û denbêjê Tahirxanê Qelenîyê bûye.
Sedem vê yekê dema ku min biryar da, di derbarê Şêx Silê da nivîsek binivîsim, min berê xwe da çapemenîya Rojhilatê Kurdistanê. Bi alîkarîya hevalekî xwe yê qedîm gihîştim lêkolîner û nivîskarê Kurd, Ebdolkerîm Surûş.
Ebdolkerîm Surûş ji min ra qala xebata xwe ya nû kir, ku ew jî Antolojîya Dengbêjên Rojhilatê yê û dê dimek kin da were çapkirin.
Di Antolojîyê da wek dengbêjê yekemîn cîh dane Şêx Silê, lêbelê ne bi agahîyên berfireh. Jiber ku di derbarê jîyana Şêx Silê da, di destê wan da jî zêde agahî tunebû ne.
Herçiqas xebata wî ya hêja û payebilind nehatibe çapkirin jî, birêz Ebdolkerîm Surûş, beşa pirtûkê ya di derbarê Şêx Silê da, ji min ra şand û ew bi min ra parva kir.
Hezarcar mala wi ava be.

www.arsivakurd.org

Ew di xebata xwe da, cîh û warê ku Şêx Silê tê da jîyana xwe derbas kirîye, bi nav dike û wiha nîşan dide: „A niha li devera Qeleniyê du gund hene ku navê van Şêx Silo ne. Yek Şêx Siloya jêrê ku nişteciheˆn vê ji eşîra Birûkî (Birûkan) ne û ya din jî Şêx Siloya jorîn e, ku nişteciheˆn vê jî ji eşîra Delayî ne. Her du gund cîranê gundê bi nav û dengê “Navirê” ne ku Navir û Gola Navirê li nava stranên me yên dengbêjiyê da pir caran hatine gotin (kilama Şêx Zarih, Sirra Qeleniyê û …)
Li ser gotina Mihê Elo yê ji eşîra Xalidiya, ev herdu gundan Tahirxanê Mîrpenc pêşkêşî Şêx Silê kirine. Şêx Silê ji gundê jorin rûnişîye. Lewra ev gund bi navên Şêx Silo yan jî Şêx Silê, gundên bi nav û deng in. Ev her du Şêx Silê, ku li quntara Çiyayê Eleganê cîh digrin, berî şorişa Girîdaxê (Ararat) bi rêberiya Îhsan Nûrî Paşa li nav xaka Tirka da bûne, piştî şorişê ew dane Îranê.
Şêx Silê ji eşîra Bûdka ye û Bûdkî jî tayîfeyek ji êla Celalîyan in. Şêx Silê zewicî ye, lêbelê zarokên wî nebûne, Sedem vê ye ku ji nesla wî îro kesek tune.

Dema ku Çiyayê Eleganê dibe hidûdê Iran û Turkiyê, herdu devlet Eleganê di nava xwe da parva dikin. Elegana ji alî Tirkan ra gotinê, Elegana Asyayê û Elegana ku ji alî Îranê ra jî gotinê, Elegana Tahirxan…”

Bi rêya înternetê jî li şopa Şêx Silê gerîyam û rastî hinek çavkanîyan hatim. Ji wan hinek makalene, ku heta niha di hinek malper û kovaran da hatine weşandin. Mixabin di agahîyên di wan makaleyan da jî, ji hev cuda ne û d glk xalan da hevdu nagrin...
Ji wan cudahîyan yek jî ew e, ku dibêjin Şêx Silê jî mîna Evdalê Zeynikê demek di dîwana Surmelî Memed Paş da cîh girtîye. Di wê demê da dilê wî ketîye Serayî ya keça Memed Paşa. Memed Paşa, Şêx Silê layiqî Serayîyê nedîtîye. Serayî ji êşa dilê xwe nexweş ketîye û bi roj û mehan di nav nivînan da ma ye. Şêx Silê jî, piştî evîna xwe ya bêhêvî strana xwe ya bi navê Serayi ya Memed Axa derxistîye, ku parçeyek ji wê stranê wiha ye:

"Gelî gundî û cîranan gilî û gazind û loman ji min nekin
Bila yekî fenanî seraya Mamet axa dosta meriv be
Hespê meriv beza be şûrê meriv birra be
Tu dêhna xwe bide vê sibekê malxirabo
Kum û kulosên meriva bi ser çav û biriyan mêl û xwar be
Na na wileh bila dosta meriva ser tacê hemû dosta be
Li nava civatê mezin pîr û hakiman meriv ji xwe re rûne
Herkesê ji xwe re meth û senayê yar û dostê xwe bide
Ez ji xwe re methê seraya Mamed axa bidim
Di nava heval û hogira bila per û baskê merivan
Vebe ji xwe re pê bifire serayêêê..."

Heta leqeba wî ya Sêwî Silo jî bi vê bûyerê va girê didin û dibêjin, Şêx Silê piştê vê kilamê biryara xwe dide û ji diwanên mîr û hakiman dûr disekine. Heta tê gotin, ku ew bixwe leqeba Sêwî Silo li xwe dike û êdî naxwaze tu kesek wi wek Şêx Silê bi nav bike.
***
Piştî berhevkirina hemû agahîyan min berê xwe da lêkolîner û nivîskarê Kurd Ahmet Aras. Ahmet Aras, ku nivîskarê pirtûka bi navê Evdalê Zeynikê, Kerr û Kulik, Sîyabend û Xecê ye.
Gor nêrîna min ew di warê dengbêjîyê da bi tena serê xwe otorîteyek zana û çavkanîyek dewlemend e. Bi rê ya telefonê gihîştimê û pê ra dûr û dirêj axifim. Min jê ra qala makaleyên ku di derbarê Şêx Silê da hatine nivîsandin û nakokîyên di wan da cîh digrin, kir. Ew jî di derheqê hevdîtina Evdalê Zeynikê û Şêx Silê, çîroka lêca ku di navbera wan da derbas bûye da axifî û di vî warî da agahîyên ku di pirtûka wî ya li ser Evdalê Zeynikê nivîsîye da cîh digrin, careke din ji min ra dubare kir.
Ehmed Aras di pirtûka xwe da çîroka hevdîtin û leca ku di navbera Evdal û Şêx Silê derbas bûye, bi hûrgulî dinivîsîne. Mirov bi wê çîrokê jî têdigihîje, ku Evdal û Şêx Silê heta wê demê rûbirû hevdu nedîtine. Cara yekem li qonaxa Tahirxanê Qelenîyê hatine ba hev.
Aras; Şêx Silê wek dengbêjê Tahirxanê Qelenîyê û mîna Evdalê Zeynikê dengbêjekî bi nav û deng bi nav dike.
Gor lêkolina Ahmet Aras, rojekê ji serhedê dengbêjek derbasî Îranê dibe û diçe bajarê Qeleniyê. Li qonaxa Tahirxan dibe mêvan û xwe bi

wan dide nasîn, ku ew dengbêjê Surmelî Memed Paşa, Evdalê Zeynike ye.
Çîroka wê bûyerê di pirtûkê da wiha cîh derbas dibe: Tahirxanê Qeleniyê, ku nav û dengê Evdalê Zeynikê bihîstîye, ji mêvan ra dibêje:

- *Madem tu Evdalê Zeynikê yî, were bi dengbêjê min Şêx Silê re bistirê.*

Ew û Şêx Silê bi hev ra hinekî distirên, lê kesên li wan guhdarî dikin, têdigihîjin ku ew yekî beredayî ye. Ne kilaman baş dizane, ne jî qayde û meqaman. Li ser wê yekê Tahirxanê Qeleniyê nameyekî ji Surmelî Memed Paşa re dişîne û di nameya xwe da wiha dibêje:

- *Serê te bixwe bi ser te û paşatiya te … Dengbêjê te Evdalê Zeynikê hate vir, bi dengbêjê min re kete lecê. Qet ne dizanîbû bistirê, ne jî dikarîbû tiştekî bêje. Ji yekî mînanî te re ne şerm e, tu dengbêjên wiha hildidî kêleka xwe û kilaman pe didî gotin.*

Dema ku nameya Tahirxan digihîje destê Surmelî Memed Paşa, Evdal li gerê bûye. Memed Paşa difikire, ku bi rastî Evdal çûye Qeleniyê û tiştekî wusa jî qewimîye. Sedem wê yekê Surmelî Memed Paşa diqahire û li benda vegera Evdal disekine.
Dema ku Evdal şûnda vedigere, gotûbeja ku di navbera Surmelî Memed Paşa û Evdal da derbas dibe, Ahmet Aras di pirtûkê da wiha tîne ziman.
Memed Paşa:

- Evdal ev çi hal e? Ev çi mesele ye? Tu çûyî li Iranê bi dengbêjê Tahirxanê Mîrpenc re strayî û te ez rezîl kirime.

Evdal:

- Xwe aciz neke mîrê min. Ez ne çûme Iranê, ne jî min bi yekî wusa ra kilam gotiye. Di vî karî da yeqîn xeletiyek heye.“

Evdal di wê gera xwe da çûye kû, çi kiriye, gişkî yek bi yek ji Memed Paşa ra dibêje. Memed Paşa jî qanî dibe ku xebera çûyîna Evdal a Îranê ne rast e, yekî beredayî çûye wir û navê wî xirab kirîye.
Memed Paşa:

- Evdal madam ku wusa ye, tu haziriya xwe bike, here Îranê, bi dengbêjê Tahirxan re bistirê û were.

Evdal haziriya xwe dike, Memed Paşa ji Tahirxanê Qeleniyê ra nameyekê dişine, gazî rûspîyên xwe Emerê Hecî, Iso û yekî din dike, nameyê dide wan û wan bi hev ra dişîne Iranê.
Memed Paşa di nameya xwe da ji Tahirxanê Qelenîyê ra wiha dibêj: Ew tiştên ku te di name de gotiye, na rast in. Dengbêjê min Evdalê Zeynikê nehatiye wir, ji te ra derew kirine. Gotinên te li min zor hatin. Jibo vê yekê, ezê dengbêjê xwe Evdalê Zeynikê tevî du merivên xwe dişînim cem te. Bila Evdal bê û bi dengbêjê te ra bistirê. Te ku dengbêjê min guhdarî kir, di derheqê wî da fikra xwe ji min ra binvîse.
Evdal û her du merivên Memed Paşa diçin Qeleniyê, di qonaxa Tahirxan da dibin mêvan. Evdal nama Memed Paşa derdixe dide Tahirxan. Ew jî xeberê dişîne hemo giregirên wê kêşê tine li dîwana xwe kom dike. Piştre Evdal û Şêx Silê dest bi kilaman dikin, heft roj û heft şeva bi hevra distirên.
Dawîyê da dengê Şêx Silê dikeve û Şêx Silê dest li ber Evdal datîne. Tarxanê Qelenyê diqahire û li Şêx Silê hêrs dikeve.
Evdal ji Taxirxan ra dibêje:

- Mîrê min, hêrs nekeve! Şêx Silê dengbêjekî yekta ye û şairekî pirr mezin e. Bawer bike, hetanî niha tu kesî li pêşîya min ewqasî berxwe nedaye. Tu bizanibe ku di şairyê da Şêx Silê ji min zêde ye, kêm nîne.

Tarxanê Qelenîyê bi wê xeberdana Evdal va kêfxweş dibe, radibe ji wan ra xelatan tîne û dide wan. Pey ra ji Surmelî Memed Paşa ra namekî dinivîsîne, dide wan û wan bi rê dike.
Tahirxan di nama xwe da ji Memed Paşa ra wiha dibêje:

- Paşayê delal, min xeletîyek kir, bibaxşîne. Dengbêje te Evdalê Zeynikê hat bi Şêx Silê ra stra û jê bir. Evdalê Zeynikê şairekî pirr mezin e û ez bawerim ku yekî usa heta niha nehatîye Kurdistanê. Haza ku Evdal şair e, dengbêj e, haza ku ew layiqî yekî mîna te ye.

Piştî leca Evdal û Şêx Silê, kilama leca wan di zemanekî kurd da li hemû dewerên Kurdistanê bela dibe û ji alî dengbêjan va tê gotin.

Kilam wiha dest pê dike:

Lo yeman, lo yeman, lo lo yemaaan
Lo yeman, lo yeman, lo lo yemaaan…
Evdal go Şêx Silê Dîdem e, ji dilê mi ra xweş Dîdem e
Çemê Dîdemê di ber me ra dikişe lem e lem e

Minê li Tirkîyê sê wilayet li pişt xwe hiştî ye
Ezê ji boyna Şêx Silê hatime welatê Ecem e
Lo yemaaan…
Lo yeman lo welat…
Lo yeman, lo yeman, lo lo yemaaan
Lo yeman, lo yeman, de lo lo yemaaan…
Şêx Silê go, Evdal ku ez heme, ez Şêx Silê me
Dengbêjê Tarxanê Qelenyê me
Ez kela li deştê me, mija li rûyê behrê me
Li dinyayê beloqê ber çavê dengbêjê xelkê me
Li vira ez îro qesasê sere Evdalê Zeynikê me
Piştî heft roj û heft şevan Şêx Silê dest li ber Evdal datîne û dawîya kilamê jî wiha diqede:
Şêx Silê go, Evdal Dîdem e, ji kula dilê mi ra xweş Dîdem e
Bihar e, Çemê Dîdemê di ber me ra dikişe, lem e lem e
Ez çi bikim kal bû me, diranê min ketine, ez ne hemsalê te me
Evdal haza ku tu şairî, tu hostayê min î, ez şagirtê te me
Lo yemaaan…
Lo yeman lo welat…
Lo yeman, lo yeman, lo lo yemaaan
Lo yeman, lo yeman, de lo lo yemaaan…
Evdal go, Şêx Silê bejna mi ne kin e, ne dirêj e
Mînanî tak-rihana li devê mesîl şax davêje
Eva heft roj û heft şev e Şêx Silê bi mi ra kilama dibêje
Gelî cemaetê hûn bizanibin ku Şêx Silê şair e û xweş dengbêj e
Lo yeman, lo yeman
Lo yeman, lo yeman
Lo yeman de lo lo yemaaan…

Leca Evdalê Zeynikê û Şêx Silê bi vî awayî bi salan berê diqede.
Lê belê birîna me ya kûr roj bi roj mezin...
Êş û jana wê jî zêde dibe.
Nakuje, lêbelê ji kuştinê jî xirab dike.
Bêguman sedemê vê yekê jî bêdewletbûn e.
Miletê ku xwedî dewlet nebe, qeyd û quydên wi miletî jî nayê girtin.
Ax bindest, welatê jî dagirtî be, mêjû dixurife, hişê hevpar şêlû dibe.
Di bin zilm û zordarîya dagirkeran da berxwe bide, lê heger bi ser nekeve, bi demê ra ji qidûmda dikeve, li rû dine bê xwedî û sêwî dimîne.
Loma mirov dikare bibêje, ne tenê Şêx Silê bi leqeba xwe, îro hemû Kurd û dengbêjan Kurd jî sêwî ne.
Heger rast be û Şêx Silê leqeba sêwîtîyê bixwe li xwe kiribe, ev yek jî tê wê wateyê, ku wî sêwîtîya xwe ji wê demê da dîtiye.
Ew jî ji hunera dengbêjtîya wî ye…

Çavkanî:
Ahmet Aras, Evdalê Zeynikê, Weşanên Deng
Ebdolkerim Surûş, Antolojîya Dengbêjên Rojhilatê, li ber çapê ye
Mehmet Gültekin, Zargotina Kurdên Serhedê, Weşanên Avesta
Ehmed Cengîz Çamlibel, Evdalê Zeynîkê, Weşanên Deng



MUQADES AGÎRÎ

www.arsivakurd.org



TIRSIYANE JI TE

ji raperîna reşahiyên çavên te
heybeta sekna te
û ji pêyvên te yên azadiyê
tirsiyane

taaa ji Kawayê Hesinkar heta îro
hesabê têkoşînê
ala berxwedanê
ji te pirsîne

qêmîşî bejna te yê zirav
rûyê te yê bedew
û kenê te yê dilgerm kirine
wekî gurên har
sotine laşê te
û wekî bazekî birîndar
te danîne li ser axa ku
her roj dinale

gotine
te bêriya dayika xwe
û birayê xwe yê biçûk Mûro, kiriye
te bêriya kolanên zaroktiyê
bêriya avzêman, berfînan,
û girara dew a pungê kiriye

êla te pirsîne ji çend kesan
ger rastî min bihatana
wê bizanibûna navnîşana te
di nexşeya dilê min de veşartiye
wê bidîtana herfên navê te
di kulma min a hinekirî de
neqişandiye

û wê bidîtana
xwina te
ne ser mêrgên reş û spî
dilop bi dilop
li ser kezeba min rijandine.



MERVAN SERHILDAN

PÊVAJOYA PÊVEKAN

Pêvajo hene binyadî ne, esasî ne, diyarker in, çarenûsî ne; cewhera kes, kom û civakan nîşan didin. Pêvajo hene teferuat in, ji terî û dûvekan pêk tên; ne encamê diguherin, ne jî nirxeke xwedî çawanî bi heqîqetê ve dikin. Pêvajo hene kurt in, kêmek in, kulek in; bi ber bayê heqîqetê dikevin, zû û lezgîn diqedin. Pêvajo hene dûvdirêj in, temendirêj in; bi zêdek in, wê gavê di şev û rojan dibihurin, bi bez û bazdan salan û dehsalan li dû xwe dihêlin; herî pir dişibin xewa xefleta kurdan ku car heye bi sedsalan didomin...

Lê hemû pêvajo di encamê de pêvajoyeke nû, cuda û kûrtir diafirînin. Lewra her kêliyeke jiyanê, her pêngaveke berxwedanê, her biryareke civakê, her teqleke kesayetê û her geşedaneke siruştê pêvajoyekê îfade dike. Hemû rûdan, bûyer û geşedanên takekesî, civakî û xwezayî di nava xwe de destpêkek ji destpêka pêvajoyekê vedihewînin; her destpêk, di heman demê de ji bidawîbûnekê diwelide, herwiha işaretê bi destpêka pêvajoyeke li ser bergiya kevinbûnê dike û pê re jî li hawirê hewariya pêvajoyeke nûjen dike. Ji ber vê çendê ye ku kevn û nû ji hev zêde dibin. Her pêvajoyeke nû, ji pêvajoyeke kevn dihingive; her vejîn û hingivîna pêvajoya nû, bidawîbûna destpêkeke kevn îfade dike; her destpêkek pêvajoyê, di heman demê de destpêka mirinekê, yan jî qedînekê ye. Yek diçe, yek tê; serdemek diqede, serdemeke nû dest pê dike; teşeyek diherife, teşedaneke nû dest pê dike. Encax di serê tevahiya destpêkan de kumê pêvajoyê heye. Hemû rûdan, bûyer û geşedan bi liv û lebata yekemîn dirûvekê werdigirin û di wê kêliyê de jî dikevin nav cuh û herka pêvajoyekê...

Eşkere ye ku rûdana hizr û ramanên azadî, wekhevî û serxwebûnê, di destpêka geşedanan de teşeyeke nû digire; kes, kom û gelan bi ber pêvajoya têkoşînê ve beralî dike û di heman çirkê de dibe bingeha pêvajoyeke nûjentir... Azadî û serxwebûn, du têgehên bi efsûn in; sêsed sal berê jî di nexşeya xewn û xeyalên kurdan de cih digirtin; sed sal berê jî hinek kurd çalak dikirin; herwiha îro jî heman bandorê li ser kurdan dikin. Jixwe hemû qewm û neteweyên hemdem beriya her tiştî bi ala azadî û serxwebûnê dimeşin. Kurd jî di vê riyê de meşiyan, dimeşin û wê bimeşin. Lê gel û civakên li ser dika azadî û serxwebûnê, divê hundirê pêvajoya azadî û serxwebûnê dagirin. Qewmê kurd sed sal berê li Qoçgiriyê ala azadiyê hilda, bi tenê ma; lê gelo tenê li Qoçgiriyê bi tenê ma? Kurd li Dêrsimê jî bi tenê man, kurd li Amedê jî bi tenê man, kurd li Geliyê Zîlan û Agiriyê jî bi tenê man; di zikê pêvajoyekê de, ma ne pir in ewqas tenêman û ewqas destiyên têkçûna serhildanan?.. Di vê çîrokê de şaşitiyek heye ezbenî, di vê çîrokê de kêmasiyek heye gelî xwişk û birayan, di vê çîrokê de bêqîmiyek heye, di vê çîrokê de nezanî û nebesiyek heye; divê tu jî rastiya qewmê kurd ji xemxurên mayî re ragihînî ey bêsûdê xwendevan: 'Gundîno, malîno nabe!' bibêje; 'entegrebûna pergalên qirkeran, xwebişaftin û xweqirbûn e, ev tişt nabe!' bibêje; 'entegrebûna pergalên kujeran, ji ala azadî, edlayî û serxwebûnê bêparbûn e, qebûl nabe!' bibêje; entegrebûna dagirkeriya Rojhilata Navîn, daqurtandina lat û zinarên heste ne, naferike, helwesteke xwekujer e, qet û qet nabe!' bibêje...

Pêvajoyên binyadî, esasî, diyarker û çarenûsî yên têkildarî gel û neteweyên vê heyamê tev li ser per û baskên modernîteyê siwar bûn, bi rê ketin, çûn; hemû pêvajoyên kurd ên sereke dîsa peya man, li teferuatan qewimîn; kin, kêm, kulek, stûxwar û serberjêr man. Pêvajoyên têkildarî çarenûsa qewmê kurd bi ber bayê heqîqetê ketin, bextê gelê kurd bi kurtepêvekan hat girêdan, dêran e li min dêran... Hemû gelên azad enerjiya xwe dilop bi dilop civandin, mirov bi mirov vehewandin, pêçek bi pêçek dan ser hev, kanî bi kanî û çem bi çem gewimandin û bi wê enerjiyê pêvajoya serkeftî ya afirandina sînerjiya neteweyî bi rê xistin. Hemû gelên azad naveroka pêvajoyê bi rêgez û rêbazên feraseta neteweya xwe dagirtin.

Lê kurdan hemû kun û denên pêvajoya çarenûsa xwe teqandin û şikandin; riya netewebûnê xetimandin, hemû kîs û telîsên pêvajoyê bi kêr û xençeran tîştîşî kirin...

Kurdên sunî di pêvajoya serhildanên Qoçgirî û Dêrsimê de bi hestên neteweyî tev negeriyan; kurdên şiî di pêvajoya serhildanên Şêxseîd û Agiriyê de ji hestên neteweyî dûr man. Di pêvajoya rêxistinbûna partiyên kurd a serbixwe de, diviyabû ku hemû rêxistin li çawaniyê û li afirandina hiqûqeke hevrejiyana kes, kom, civak, ol û baweriyên Kurdistanê bigerin; lê paşpê bi dû çendaniyê ketin, bi dû jiholêrakirina hevdu ketin; qîra kanan di hev dan, hevdu helak kirin... Gelî dildarên ziman û çand û hunerê, di destê kurdên Bakur de, ala rastnivîs û rêzimana sedsale ku Celadet Elî Bedirxan amade kiribû û di pêvajoyeke diyarker de wekî remza yekitî û hevgirtina neteweyî li ba dibû, mabû; lê mixabin, bi saya weqfeke kurd ku di bin venêrîna dewleta tirk de ye, sembola yekitiyê çîrçîrî kirin û avêtin ber şûrên dagirkeran. Careke din kurd ji nav hevsengiyên azadî û serxwebûnê hatin avêtin û bûn bendewarên pêvajoya pêvekan. Pêvajoya pêvekên vê heyamê ji mirinê dijwartir e gidîno; lewra xerabtirîn sosretên kurd jî hene ku hîn tu kesî nenivîsiye: Eyy kurdên xemxur û hestyar, ji xeynî partiyên ku hîn nehatine damezrandin; di hundirê hemû partiyên kurd ên li Bakur, Başûr, Rojava û Rojhilat de sîxur û saloxgerên tirk, fars û ereban cirîdan didin; pêvajoya azadî û serxwebûna gelê kurd vediguherînin pêvajoya pêvek û dûvekên dagirkeriya Rojhilata Navîn; ben û werîsên qewîn ên çarenûsa gelê kurd vediguherînin giloka girêkork û girêkutkan... Ez bigorî, divê pêvajoya pêngaveke nû bê destpêkirin, divê tiştin biguherin, divê enerjiya azadî û serxwebûnê li sînerjiya neteweyî veguherin; divê îro, vê saetê, vê çirkê ev arvan li bêjingê bikevin; divê hemû girêkên ser vê dikê yek bi yek bên verişîn û vekirin; divê ava hemû bîr, gol û behrên vî welatî bên parzûnkirin û zelalkirin. Nexwe dewletên dagirker bi destê çete, sîxur, saloxger û kontrayên ku di nav partî û rêxistinên kurd de şûna nigên xwe dîtine, wê gelek xençerên din di noqa gel de biçikînin, wê gelek carên din înfaza pêşengên kurd biceribînin; nexwe tirk, fars û ereb wê gelê kurd û Kurdistana qedîm di çirav û çalavên pêvajoya pêvekan de bixeniqînin.

DEMHAT DÊRİKÎ

www.arsivakurdi.org



Hebûna te

Hebûnê
li ser ku temen li min bû payîz
lê
çi li salên buharî
çi li salên payîzî
di aşûpên min de
di ferhenga min a peyvê de
di bîranînên bi çar demsalên te pêçayî
ku car ji agir bûn
car jî gulbuharî bûn
hebûna te her al bû
di hinavê min de.
Ew duhî bû
îro jî
henaseya dil e
di çavê min de
welatekî ronîvedane
hêviye di rêveçûna te de.
Erê xewna pêşeroja min
hest li nav şewata te bendeware
ku sibe te ramûse
hembêz bike
bêhn bike û hebûna te
li ser çiyayên ji êş û birînê
bilind bike.





www.arsivakurdi.org

AXA KURDİSTANÊ JÎ DİKARE ŞERÊ NERM Lİ HEMBER NEYARÊN XWE BİKE?

KEYHAN MİHEMEDÎNİJAD

Îro rojê şoreşa teknolojiya zaniyarî û pêwendî roleke berçav di rêkxistina operasiyonan de dilîze. Pirsên ku di vir de têne gorê ev in, gelo ev şoreşe çi bandorek li ser şerê nerim heye? Şerên bandordar ji şoreşa teknolojiya zaniyarî û pêwendî kîjan in? Kurdistan jî dikare şerê teknolojiya zaniyarî û şerê nerim li hember dujminê xwe bike?

Bersiva wan pirsiyarane dê di berdewamiya gotarê de bêne dan.

Teknolojiya zaniyarî û pêwendiya serdema nû, tevî vê ku rol û bandorek berfireh heye, di şerê nerim de cih girtiye û herwisa di şerên saybirî, şerê “network”î û şerê elekteronîkî de jî bikar tê.

Şerê teknolojiya zaniyarî û pêwendî, şiyana taktîkên artêşan di şer de guheriye û radeya serkevtina wan di meydana pevçûnê de diyarî dike.

Îro rojê artêşa Amerîkayê bi rêya setelaytê ve leşkerê xwe rênimayî dike û li ser wan zal e û çawahiya pêşveçûnê dibêje wan.

Îro rojê piraniya welatên cîhanê digel neyarên xwe şerê meydanî nakin û ew bi rêya teknolojiya serdem ve şerê nerim dikin û wan teslîmê xwe dikin.

Kurdistan jî dikare hêza xwe ya mirovî pêş bêxe û ji rêya teknolojî ve dujmin û neyarê xwe bike bi armanc.

Her welatek ku di hewlê de ye hebûna xwe biparêze, mifahê ji emraz û teknolojiyên nû werdigre û di hewlê de dibe ku derheq teknolojiyên nû pirrçek be da ku xwe ji gefên dujminên xwe biparêze.
Mînaka herî berçav Îsraîl e, ev welate xwe di warê teknolojiyên serdem de pêş xistiye û li hember dujminê xwe disekîne û ji rêya teknolojiya nû ve dujminê xwe lawaz dike.
Lê Kurdistanê çawa dikare xwe bihêz û pirrçek bike, da ku li hember neyarên xwe de serkevtî be û dujminên xwe lawaz bike?
Kurdistan dikare ji şerê nerim mifahê wergire.
Lê pirsyarek tê gorê, axo çawa şerê nerim bike û ji kîjan rêyê ve?
Bersiv ev e, şerê nerim pêk hatiye jişerê derûnî, propagende, mediyayî, saybirî, zaniyarî, çandî, siyasî, civakî û zanistî".
Lê çar metodên sereke yên şerê nerim pêk hatiye ji şerê derûnî, propagend, mediyayî û saybirî.
Ji rêya wan mînakan ve, dikare civatgehê an jî girûpekê bike bi armanc û bi bê pevçûna leşkerî, dijberê xwe rastî şikestê bîne.
Emê di çend mînakekê de wan şeran bas bikin ku ev jî wiha ne:
Şerê derûnî:
Şerê derûnî bi darêştina plan li hember herifîn an lawazkirina morala dijber an dujmin tê pênasekirin. Şerê derûnî li şerê cebilxaneyî zêdetir ji aliyê dujmin ve girîngî pê tê dan.
Bi giştî di şerê derûnî de du plan zêde bikar tên: 1- Jinavbirina hin ji haletên morala xelkê û raya giştî, ku ew ji berpirs û karbidestên welatên xwe bê hêvî bin. 2- Cihgirkirina nerînên xwe di nav hizira wan de.
"Thomas Fuller" dîroknivîsê Birîtaniyayî gotiye: "Mumkin e şerê derûnî cihê amûran di şer de bigre, şerê derûnî dikare hişê mirovan aloz bike û jiyana meinewî û exlaqiya neteweyekê ji nav bibe".
Şerê derûnî yê stratejîkî, yek ji wan şerê derûnî ye ku mifah jê tê wergirtin, lê ew demdirêj e û dikare li ser xelkê netewa dijber, civatgeh, çand, dîrok û ya hemûyan girîngtir heta dikare li ser hêzên vefadar bi nizamê jî mifah bê wergirtin.
Mînaka berçav a şerê derûnî yê setratejîkîwelatê Îsraîlê ye, welatê Îsraîl bi hemû awayekî şerê derûnî yê setratejîkî yê demdirêj dadirêje û di nav hundirê dujmin de bandorê li ser civatgeh û heta hêzên dijber jî dadinê. Di wê midehê de Îsraîlê çendîn caran binkeyên leşkerî ên Komara Îslamî ya Îranê kir bi armanc û ev jî, ji rêya xwedî kesên ku di nav Spaha Pasdaran de kar dikirin mifah hate wergirtin, ev yeka bûye cihê şik û gumana berpirs û hetanizama Îranê, axo di nav berpirs û fermandên nizamî de sîxurên Îsraîlî hene?
Bi her kiryarekê ku bi mebesta derzkirin li nav bawer, reftarê kesê beranber, lawazkirin û jinavbirina morala wan, şerê derûnê jê re tê gotin.
Kesê ku wan xalên jorîn ku hatinî baskirin bike bi armanc, divê personelên hikûmî bin, divê şarezayiyeke baş li ser xelk û civatgeha dujmin û neyarên welatê xwe hebin, zimanê wan bi başî bizanibin û digel pirsgirêk, derd û…hwd ên civatgeha beranber zaniyariyên baş hebin da ku bikarin li ser derûn an psîkolojiya raya giştî ya beranberkar bikin û wan di paşerojê de lawaz bikin.
Di rastî de şerê derûnî şerkirin digel hizirê dujmin e. Ger hizirê dujmin lawaz bû, ew rastî gumankirin ji hev, xelk û civatgeha xwe tên. Ku wisa ye şerê derûnî başdirîn rê ye bû lawazkirina dujmin.

Şerê propagende:
Piropagende yek ji girîngtirîn şerê teknolojiya nû ye û yek ji şerê nerim tê hesibandin.
Piştî şerê cîhanî yê duyem, peyva "propagende" gelek caran bi merema siyasî an netewî an bo mebesta handana çend bîrokeyeke diyarîkirî bikar hatiye.
Propagende çekeke gelek bihêz e ku di şeran de bikar tê.

Bo çî tê gotin ku propagende çekeke bihêz e? Çimkî propegendekirin biamûrên şer ên pêşketî ve, yek ji girîngtirîn şerê derûnî ye ku dikare li ser morala dujmin û leşkerê dujmin bandordar be.Pênîşandan çekên pêşketî gelek girînk e ji bikaranîna wan. Bo mînak di şerê Amerîka û Îraqê yê sala 2003`an de ku dengvedanek belav bû û bû manşêta nûçeyan ku Amerîka ji çeka navkî bo destbiserdagirtina Îraqê bikar aniye.Berevajî, Amerîkayê ti carî ev çeka li dijî Îraqê bikar neanîbû.

Propagendeya çekên pêşketî di mediyayan de û manordan bi wan re hem şiyanênîşan dide û hem jî bandorek nerînî li ser dujmin tê afirandin û eva jî dibe sedema daketina morala leşkerên dujmin.

“Adolf Hitler” dibêje: “Divê hemû propagende evqas pupoler û di asta hizrî de be ku nezantirîn kes ber bi wê propagendê ve herin û wê fam bikin, û bi bikaranîna propagendeya hişmendî û berdewamî, xelk dikare cehenemê bi buheşt û berevajî buheştê wek xirbtirîn rewşa jiyanê bibîne”.

Îro rojê tev cîhan bi propagende şerê nerim dikin, û morala neyarên xwe dadibezînin.

Di şerê propagendeyî de zêdetir ji bawer, nasname û psîkolojiya aliyê beranber dibe bi armanc.

Bi armanckirina morala leşkerêndujmin di eniya şer de yek ji girîngtirîn şerê propagendeyî ye. Çimkî leşkerê dujmin di eniya şer de bi bihîstina nûçeyekê bi giştî bê moral dibe. Bi propagendekirin bi nûçeyên birsîtiya dujminê beranber, bombarana cihên hestiyar ên wan û herwisa bi belavkirina nûçeyên şikesta eniya din awan di şer de, dikare bibe sedemê alozî û lawazbûna wan di eniya şer de.

Herçiqas DAÎŞê bi navê îdolojiya Îslamê şer kir, lê wê girûpa terorîstî bi navê îdolojiya Îslamî mifah ji bawera xelkê wergirt. DAÎŞê di despêkê de bi belavkirina kurtevidiyoyên tundûtîjî di nav torên civakî de û bi wan propagendeyên xwe samek xiste nav dilê xelkê de û her navê DAÎŞê dihat, xelk ji nişkê ve tirsek bo wan dihate afirandin, axo ew girûpe ji çi cure kesekê pêk hatibe?.

An beravajî ji propagendeya DAÎŞê, Hêza Pêşmergê Kurdistanêjî, bi bîr û bawereke kûr bi netewe, ax û serweriya welatê xwe veşer dikir û propagndeya mediyayan derheq qehrimaniya pêşmergan di eniya şerê dijî DAÎŞê de, li ser morala dujmin bandorek nerînî hebû.

Dema ku Serokê Herêma Kurdistan rêzdar “Mesûd Barzanî” di eniya şer de serdana Hêza Pêşmerge kir, û mediyayan propagende pêve kir, rastevxwe li ser morala pêşmergên eniya şer û heta xelkê Kurdistanê bandorek erênî hebû û herwisa berevajî li ser dujmin jî bandorek nerênî hebû.

Welatê Birîtaniya di şerê yekem ê cîhanê de, ofîsek bi navê propagenda şer ava kir û her heman ofîs di sala 1918ê de bi Wezareta Zaniyarî hate guherîn.

Almaniya sedema şikestxwarina xwe li şerê yekem ê cîhanê de kêmasiya wan di warê propagendê de daye zanîn.

Armanc li şerê propagendeyî eva ye: Piştevanîkirin ji hêza leşkerî, cihgirkirina moral, bawerî bi hêza leşkerî, berevanî ji bîrûbawerên netewî û serweriya tevahiya welat.

Her lewma jî, hewce ye ku Kurdistan bi hemû hewlên xwe ve û ji rêyên narastevxwe ve şerê propagendeyî li dijî neyarên xwe bike.

Şerê mediyayî:

Şerê mediyayîyek ji metodên girîng ên şerê nerim e û herwisa behrimendbûn ji şiyana mediyayanbi mebesta berevanîkirin ji qazancên netewî gelek girîng e.

Hin rewşebîr û zana li ser vê bawerê ne ku mediya, desthilat û hêza diyarîkirina çarenivîsa mirovan ji wan bêpar kiriye û xistiye bin xizmeta xwe de û li ser hizir, fehm û hesta takan zal e.

www.rojakurd.org

Di niha de, mediya di darêjeriya şerê derûnî de roleke taybet dilîzin. Di şerên niha de, setratejiya mediyayî hekî ji setratejiyên leşkerî girîngiyek zêdetir nebe kêmtir nîne; di rastî de piştî şerê sar, wate û setratejî hatine guherîn û niha şerê sar, derûnî,propagendeyî…hwd, her hemû di bin bandora şerê mediyayî de ne û mediya roleke taybet dilîze.
Dema ku mediya bikare li ser bîrûraya gişti bandorê danê, wê demê ew mediya serkevtî bûye; Mediyayên îroyî dikarên di sedan rêyên cuda de şer bikin. Di televîziyonê de gava çend şirovekar bi zimanê dujmin biaxivin û propagendeyên nerênî li dijî siyasetên dujminê xwe bikin, bi awayeknerastevxwe dikare li ser xelkê neyar bandordar be.Di şerên mediyayî de, çand, civak, nasname û bawrên dujminê beranber dibe bi armanc;Bo mînak di şerê Amerîka û Îraqê de, mediyayên Amerîkayî bi hev re û bi awayekî lez bûyerên şer vedigusatin û tev bûyer jî bi qazancê Amerîkayê bas dikirin û wisa dikirin ku morala leşkerên Îraqê demûdest lawaz be û binkeyên hestiyar ên xwe bi cih bêhlin.
An jî berevajî şerê Îraq û Amerîkayê, di şerê DAÎŞê de, mediyayên Kurdistanêbi berdewamî pêşveçûn û şiyana Hêza Pêşmergê Kurdistanê nîşan didanku eva jî rastevxwe bandor li ser morala çekdarên DAÎŞê hebû.
Di şerê mediyayî de, dibe karnasên şareza bêne bikaranîn da ku bi mifahwergirtin ji wan karnasan bikarin şerê nerim di mediyayan de lidar bixin.
Di niha de şerê mediyayî li ser birûraya gişti bandordar e.

Şerê saybirî:
Şerê saybirî pêk hatiye ji êrîşên saybirî ku ji aliyê bikirêgirtiyên welatekê li dijî bingehên saybiriya welatek din, bi çend oprasyonan tê kirin.
Em dikarin di mînakeke şerê saybirî de şerê Amerîka û Îraqêyê sala 2003`an bînin, ku bandordartirîn mînaka şerê saybirî ye. Di vê şerê de Amerîkayê karî bi hekkirina sîstemên dije mûşekî ên Îraqê vîrûsekê bi rêya kampiyoterê ve veguhezînine nav sîstemên dije mûşekî ên Îraqê û ji kar bixe. Dema ku balafirên Amerîkayê li ser esmanê Îraqê bûn, sîstema berevaniya Îraqê kar nekir. Wan karî piraniya sîstemên berevaniya Îraqê ji rêyên dûr ve hek bikin. An jî di mînakek din de, Îsraîlê ji destpêka sala 2021an ve, çend sîstemên berevanî ên Îranê hek kiribûn, û bi balafirên F35 çend binkeyên alavên navkî di bajarê Kereca Îranê de kirbû bi armanc.
Roja 27`ê “June” a 2021`an jî “Joe Biden” Serkomarê Amerîkayê gef li Rûsiyê xwaribû ku dest ji êrîşên xwe ên saybirî bo ser Amerîkayê berdin, ku ger êrîşên saybirî li ser Amerîkayê berdewam bin emê rastî şerekî rasteqîne bên. Bi gişti şerê saybirî di cîhanê de ber bi berfirehbûnê ve diçe û gelek caran berjwendiyên netewî, çand û ewlehiya netewî ya wî welatîdikeve metirsiyê de.
Ku wisa ye, hewce ye em xwe, civatgeh û welatê xwe li dijî şerê nerim û teknolojiya nû vaksîne û pirçek bikin.
Divê em jî li dijî wan di hewil û tekoşînê de bin. Ger ev ji rêyekê ve digel civatgeh û welatê me şerê nerim dikin, divê em ji dehan rêyên din ve derz bikine nav civatgeha wan û lawaz bikin. Di rastî de, divê Kurdistan beşeke zêde ji dahata xwe terxanê wan şeran bike û ji kesên psporê wan waran mifahê wergire. Kurdistan ji warê heşîmeta mirovî ve gelek ji Îsraîlê zêdetir eû ji warê îrade û bawer jî bi heman rengî sedan beranberê Îsraîlê bihêztir e. Ku wisa ye, divê Kurdistan welatê Îsraîlê bo xwe bike bi mînak û xwe ji hemû warekê ve biparêze û dost û neyarên xwe ji hev cuda bike.
Hekî Kurdistan karî ji rêya teknolojiya serdem û şerê nerim ve dujminê xwe lawaz bike, wê dem hem neyar û hem jî dost dikare li ser Kurdistanê hesabek taybet bike.

www.avesta-kurd.org

ÇAYAN OKUDUCİ

BAŞ ZANİM



baş zan im tu yê mala min bikî dojêha nûjen
eyy şehweta ku li min vegeriyayê îşkenceyê
dikim nakim xelas nabim ji okyanusa te
ê bêav ê ji rehme dûr

têkçûn:
çaxê lêvên te li ser çav çilmisî
tofana şêrîn û sosret li can ket
bi lez û bez:
kefenek ji ewran hat dirûtin
ji gulên şikestî bajarek ket para sewiyan
ez li benda fîka fîkê

xwennek xwe da keys li ser ciyan
xiyalên hatine jibîr kirin lê xwe germ kir
bayê barkiriye nefreta ku bi nefesate şa dibe
û diweşîne li ser miraran ji nifrên xwe rengîn

di paşila wê de lawikêk
di paşila wê de mesiyên ji avê revok

lehî tê: xweydana bêxwêy tê de
ka tasek ji dewê te yê sar,
lehiya bêbav û bêxwedî

vayê tê zombiyên çev şîn
pîroz be!

erd û esman te got qey erzanê?
rebeno, belengazo, hemalo, teslîmkaro

robarek min dî bi laşek teze xwe hembêz dikir
min laşek dît barana zua lixwe dipêça

dibe rêyek dirêj raxim li ber tiştan
rêyek ji deng û sterkan
rêyek ji *viran*eyan
qeder-ek ji filan û bêvanê

û di vê helbestê de beriya birincê qeracedaxê kem
brêz xwîner, hinek din ê jî em liberxwe bidin
vay em digîhijin ser qaniyê
qaniya qut bûyî

baş zan im tu yê li ser seran şevên kor bigerinî
baş zan im tu yê ji Yemena bêdev
tu yê felekê bi goşt estî bikî
hinek hiş
hinek axavtin
hinek mirin

www.kurdiyakurd.org

Şîlan Doskî

NAMEYA KUŞTİNÊ

Çavên te welatê min bûn, her awirekê razên hestên te vedigotin. Her rondikekê, ez dixendiqandim, wan ji min nerevîne, çavên min nikarin bibin penaberên çi çavên din.

Dilê min wisa dibêje, lê hişê min tiştekî din dibêje..
Serwer ji bo xwedê ji me dûr bikeve, çavên hemû xwendekaran li me ne.
Ew jî, dibêje: Dîmen ez nikarim, ev biryara te werîsê sêdarê li dor gerdena min aland...
Dîmen were neraweste! Tu jî here Serwer, tu dê me li belayekê bidî. Sîpel ka berê xwe bide, ew çû an li dîf me dihêt.
Were em bikevine nav dibistanê, ew bi xwe êdî dê her biçe. Dîmen aram be û here wana xwe, ez jî dê biçim pola xwe.
Li mal dê paşî em ê hev bibînin. Carê bi xatirê te...
Rast e, gelek çav li ser evîna Dîmenê û Serwerî bûn, lê yê gelekî cira xwe ne xweş dikir Çeto bû.. Çeto ji Dîmenê hez dikir û bela xwe tê de dida, lê wê hîç guh nedida wî û dil û hizira wê herdem li ser Serwer bû.. Me jî guman dikir ku Çeto sîxwirê birayê Dîmenê ye, lê me nikarî bû ji vê mijarê piştrast bibin, çimkî pirsiyarî di babeteke wisa de metirsiyeke mezin e.
Şev e, hindî xwe bi hirve û wêve de berê xwe diguhêrim, xew nakevite çavên min. Hestekî ez ji hemû rexan ve dorpêç kirime, hizira min li ser



www.arsivakurd

dîmenê bû, lê ji tirsa birayên wê û gumanên wan, min xwe girt û ez ber bi wan ve neçûm. Gelek caran derdê min ew bû ku êkane me û bê bab im, lê dema ku birayên Dîmenê dibînim, dilê min ji dinyayê reş dibe û dibêjim hema baş e min çi bira wek yên wê nîn in…
Birayên wê bi xwe ji keçên xelkê hez dikin û jiyana xwe hildibijêrin, lê dema bes ji xelkê guh lê bibûn ku kurkek li ser rê ligel xuşka wan axiviye, ew bo mirinê qutan û jiyana wê xistin metirsiyê, bêyî ku bizanin egerên hevdîtina wan çi bûne…
Li pey rewiştên berê û gotegotên nehezan jiyan li xuşka xwe tarî kirin, ew keça çeleng û zîrek baskşikestî kirin û ew neçar kirin ku dest ji Serwerî berde.
Spêdê ji xew rabûm û wek her car li ber derî li benda Dîmenê mam, bîstek çû min dît nehat û dê direng bimînim, min li derê wan da, Dayika Dîmenê derî vekir. Min silav kir û gote wê Xalet: Bêje Dîmenê direng e, hêj gotina min di devê min de bû, got: ne, nahêtin. Dîmen nexweş e..
Nîvro dema ez ji dibistanê vegeriyam, min ji dayika xwe re got: Dîmen nexweş e, ez naxwazim wê bi tenê bihêlim, gerek em seredana wê bikin. Dayika min got: Bila ka em biçin pirsyara rewşa wê bikin.
Ez û dayika xwe digel hev çûn mala Dîmenê, dema min ew di wê rewşê da dît, canê min tezîlank bi ser da çûn! Min zanî dîsa birayê wê, li wê daye. Dayika wê çîrok vedigerand ku xelkê ji birayê wê re gotine ku dîsa li ser rêka dibistanê digel kurekî axiftî ye…Ji ber vê egerê
û ji ber şermezariya me di nav xelkê de û li gora rewiştên malbatê, birayê wê biryar da û got: Nabe êdî biçîte dibistanê û eger wî kurikî peyda biket dê wî bikuje!
Stem zor e, eger mirov laşhasin be jî, li ber lawaz dibe, êdî çewa ku mirov can tenik û nazik mîna Dîmenê be.

Hêsirên Dîmenê, laşê herişî ji lêdanê, metirsiya li ser jiyana wê, lêvên xwe min diguvaştin da gotin ji devê min dernekevin, min destê wê di nava destê xwe de diperixand, taku hinek hêz bidim wê û bi germa destê xwe jê re hestên xwe biguhêzim.
Çavên Dîmenê gelek name digehandin çavên min, ji min re digotin wê tiştekî mezin çêbibe, ji min re li naqosa metirsiyê didan, lê çavên min matmayî bê bersiv diman, zimanê bêdengiyê di navbera wan de êş û jan bû..
Roj û heftî derbas bûn, Serwer her dihate serê rê û Dîmen nedidît!
Rojekê nêzîk bû û ji min pirsî, tu bi serê dayika xwe bikî, bêje min Dîmen li kû ye?
Ez li wî nerawestiyam, min rêka xwe berdewam kir û gote wî: Serwer, ji ber te rê nadin wê bête dibistanê, tendiristiya wê jî ne gelekî baş e û divê birayên wê te neniyasin da bo te jî, pirsgirêk çênebin…
Çendî xwendin û xwendekar pir bibin gerek ewqas pêşkeftin jî çêbibe, lê civaka me hêj li pey rewiştan, li pey gotegot û serdestiya mêr û newekheviyê diçe, ji ber vê hindê serbestiya me hêj di benda nezaniyê de dîl e!
Sema çirûska hiziran, jana wijdana min gurtir dike. Her pêngava ku davêjim, rondikekê li pişt xwe bi cih dihêlim, asman jî çavên xwe şor diket, ne baranê rondikên min veşartin û ne jî axê ew hewandin…

Ax! Mêbûn, pertûkek bi navê namûs e, di destê regezekî kûvî de bi gulle, agir, kêr û keviran dihate xwendin. Hizir digel min karwanî bûn heta gehiştim cihê jivanê…

Silav Serwer, ez neçar bûm bi ebayekê xwe binixumînim da kes min nas neket. Silav Sîpel! Ka Dîmen?
Tirimpêla xwe li vir bihêle û bêje hevalê xwe bila ew jî peya bibe û ligel me bêt, ez ê te bibim nihala rêya gund, cihê Dîmenê …
Sîpel, tu bo çî rawestiyayî, çi bûye?



Ka Dîmen?
Serwer, tu evê axa bi kend û kûr dibînî?
Gorek bê navûnîşan, bê kêlî ye…
Ev gora Dîmenê ye, ku hetaheta ew himêz kiriye…
Sîpel tu çi dibêjî!
Bira! Xwezî zimanê min lal bibaya û destê min bişikesta dema te name didaye min û min nedabaya Dîmenê…Her wê şevê Dîmenê bersiva te da..
Spêdê berî ji mal derbikevim, li ser dîwarê mal da min û ez dame sûndê dema te li ser rêya dibistanê dibînim, bi çi rêkeka hebît bigehînim destê te. Min name ji tirsa di nava cilên xwe de veşart û çûm dibistanê.
Nîvro dema ez vegeriyam, dayika min ebaya wê li ser serî û li serê kolanê li hêviya min bû. Min gote wê, reng û rû li te nemane, Dadê xêr e?
Bi girî got: Hiş be, were zû were malê,



Dayika min heta odeyê milê min rakêşand. Got: Çi li ser Dîmenê pisyar dikin, tu dê bibêjî ez nizanim. Min gote wê Dadê ma çi bûye? Got: Birayê Dîmenê, evro spêdê namek di destê Dîmen de dîtibû ku mijûlî xwendina wê bûye, name ji destî kêşandiye û xwendiye. Ez li pey deng û qîrîna wan çûm, hema min dît kinifek kiriye stuyê wê û wek ajalan li dîf xwe dikêşînit heta ku rihê wê bi ser da çûye… Bi şev birayên wê kelexê wê ji mal derxistine û înane li vir veşartine.
Piştî heyvekê ji nû em agehdar bûne ku li vir veşartine.
Ji ber vê sedemê ez jî demekê neçûm dibistana xwe û ev egerê berzebûna me bû..
Niha derfet çêbû ku rastiyê bo te vebêjim û ev e jî bersiva wê Nama te, emanetek li dev min e ku min soz dabû Dîmenê bigehînim destê te, bersiva nameya ku bû egerê kuştina Dîmenê.

www.avastvakurd.org



ABDULLA HAJİAN

MİRİN

Mirin;
gelîyekî kûr û hûnandî ji hilma jana perçiftî û şîn .
Kavila çirkan ; xala dabizdîyana rihên gij û sawyî Ji gewdeyên tevzî û tazî.
Deq û awazek naşimite ji rih û laşên hêrandî heta zar bisitêre!
Hindî tabûta rih bi çenteya qola hizirê,Li rêpiya giloverê xeyalan bezî
Sola hîvîyê fek vekir û giriza leylanan herikî û xwezîya xwezîyan ziwa bû
zimên zeweq dalist ji tîyan
henase rakişîya ser girê xeniqê
Û rihên gewşek çêra nîvcû lal qîrîn,can ker bûn;
Loma êdî dengê hîvîyên kurmîç û pîç
sêwî man!
Lê borî,xelas!
gor dev vekirîye Û Her tişt teyare
Fermo:Mirin
Mirin;
Ew çavê ku şîn dibîne:
bedewîya çilmisî û perçiqî.
lavjîn û awazê ciwî dizê
û
ronahîya jîna kor
Tarî û sipehî vedibrûskîne.
dengê dîlana savayê xeyalan e
Di rihên sindifkirî da
Mirin êşê zaînê xeyalên bê tov !
Tu jîn î!

www.arsivakurd.org



SORAN HEMEREŞ

KURMANCÎKİRİN: MUHSÎN OZDEMÎR



KURD MÎTRAYÎ/MÎSRAYÎ BÛN?



Wextekî galegala Zerdeştîbûna kurdan bû, niha jî behs behsa Mîtaryîbûna wan tê kirin. Babetek ku li ser Mîtarayîbûna kurdan hatine nivîsandin, pirsgireke wan a ecêb heye. Heta niha pênaseyeke zelal ji bo ola Mîtrayî reşnivîs nebûye. Tevî vê jî wan bi xwe biryar dane ku Kurd Mîtrayî bin. Ji bo vê armancê jî diçin wêneyekî, cihekî, navekî an jî her civîneke Kurdî peyda bikin da ku piştgiriya ramana wan bikin. Ango ew kesên ku berê biryar dane kurd mîtrayî ne bi mejiyekî vekirî li lêkolînên xwe nanihêrin. Nexwe kut e biryar dabe , êdî pêwistiya te bi lêpirsînê jî nîne. Eger di merasîmeke Kurdistanê de gayek bê serjêkirin an jî li Lalişê nîgarek bê dîtin, em dikarin bi Mîtrayî ve têkildar bikin. Min nedîtiye ku kes berî ku bêje kurd Mîtrayî ye ji me re bêje mîtra çi ye.

Bi rastî belgeyek di destê min de ku yekemîn car di dîroka mirovahiyê de Mîtra beriya 3500 salan li Kurdistanê navê wê hatiye gotin, bi dehan metnên kurdî di destê min de hene hene ku temenê wan nêzîkî 2600 salî ne û navê Mîtra anîne û her Kurdekî îro jê fêm dike. Her weha navê gelek eşîrên kurdan li cem min hene ku di serdema navîn de beşek ji pêkhateyên navê Mîtra bûye
û bi dehan lêkolînên cîhanî jî li ber destê min hene ku li ser wê olê ne. Tevî vê jî ez hîn nikarim encamekî ragihînim.

Divê em qebûl bikin ku me ola-ayîna Kurd fêm

nekiriye. Netêgihiştina di ola kurdî de du sedemên xwe yên serekî hene. Ya yekem ew e ku Kurd neteweykî pir kevnar e û li deverekê ne ku bi sedan ol, rêçikên olî û bi hezaran belgenameyên olî yên kevnar têde hene ku heta niha jî bi piraniya wan re em hevnas nebûne.
Ya duyem jî ew e ku zanîngehên Kurdistanê û saziyên akademîk, bi giştî şiyana wan a lêkolînên zanistî yên cidî li ser Kurdan nîne bi taybetî di warê olî de bikin. Raste berê saziyên me yên akademîk bi taybet ji bo lêkolîna Kurdî tunebû, lê va sî sale çendîn saziyên me hene ku diviyabû lêkolîneke zanistî bikirana, nekirine.
Bi dîtina min, ji bo ku mirov li ser ola Kurd encameke pêbaweriyê bi dest ve bîne, divê herî kêm mirov bersiva van pirsan bide: Xwedayên Hurî, Hîtî, Lûvî, Sumerî û Gutî û Medî û Huriyan kîjan in û dîn li cem wan çi wateyek bû?

Ola Sirasiyan çi peywendiya wan bi olên kurdî re hebûye?
Çima Kurdên Xiristiyan li ser mezhebê Yaqûbî û Misilman li ser mezheba Şafiî bûn?
Zerdeşt hetanî çi radeyê dîrokî bûye û ola wî çawa belav bûye?
Çima dêrê/kilîsê ji sedsala yekê ve pirtûkên taybet li dijî Manî, Berdeysan û Marsîon derxistine, ku hemû ji Kurdistanê bûn an jî nêzîkî Kurdistanê bûn?

Çima piraniya Kurdên xiristiyan, di asta herî bilind de ji aliyê Dêra Romayê ve wekî hêresî(terkedîn)tên tewanbarkirin
Dînê Manî çawa serî hilda û bandora xwe li olên kurdan çawa bû?ye

Pêxember Manî çima ji Kirmaşanê çûyê Hewlêrê û ji wir jî çûy Cizîrê û Botanê. Pêwendiya vê çiqasî bi herêmên desthilatdar ê kurdan ên wê serdemê re heye?

Bandora Mezdak û ola wî li ser olên kurdan çi bûye?

Çima di sedsala çaran a zayînî de padîşahê Hewlêrê Mar Qerdax li dijî ola Zerdeştî sekinî û bû mesîhî.
Rewşa Êzidî û Kakayiyan beriya Îslamê çi bû?
Çima di sedsala dehemîn a zayînî de, hin kurdên kurmancî û dewletên bakurê Kurdistanê xwedî meylê Şîa ne û nêzîkî fatimayan in?
Ji bo malbata padîşahên Hewlêrê di sedsala yekemîn a zayînê de çûne ser ola Cihûyan, heta xwe xetene/sinnet kirine?
Çima du rêûresmên mezin ên sofîtiyê yên serdema Îslamê, Sûrewerdî û Qedirî, kurdî bûn?

Kê rêçika Sofîtiya Neqşebendî anîye Kurdistanê, Mewlana Xalid an berî wî anîbûn Kurdistanê? Nexwe çima li Kurdistanê wisa belav bûye?

Dema misilman hatin Kurdistanê, ola kurdan çi bû?
Bandora dewleta Hesnawî û Heyarî(‘enasî) li ser ola yarsan û berevajîyên wê çi bû?

Selahedîn ol ji bo berfirehkirina desthilatdariya xwe bikar anî yan jî berevajiya wê raste? Heta çi radeyê rola Ereban di nav dewleta Selahedîn de hebûye û çima Selahedîn ewqasî giringî daye mezhebê Şafîî.

Selahedîn û malbata wî di warê çandê çima ewqasî di bin bandora stranbêj û helbestvanên Hewlêrê de bûn?
Dîn li cem Hewramî û Soraniyan bi belavbûna Îslamê re ber bi kû ve çûye?

Çima piraniya kelam/klamên Yarsanî bi zimanê Hewramî û yê Êzîdiyan bi Kurmancî ne?

Durzî kî ne û têkiliya dînê wan bi olên din ên Kurdan re çi bû?

Ez naxwazim xwendevanan

bêhêvî bim , lê ew valahî tev di têgihiştina me de hene. Îca di ewqas valahiyan de em çawa dikarin li ser dînê kurdî biryarê bidin. Eger em biryarê jî bidin, bêguman wê biryareke belengazî be. Dê bi wî rengî be ku îro em têde ne û her kesê ku tê olekê dike Kurdî. Wusa dixuye ku tijîkirina wê valahîyê ne erkê xwendevanan e, lê erkê zanîngehan e vî karî bikin ku heta niha pêk neanîne.

Ez naxwazim hemû xebatên ku saziyên akademîk kirine red bikin, lê divê em qebûl bikin ku em di astek pir nebaş de ne. Nexwe çawa dibe piştî Şerefxan tu dîronivîsê Kurd li ser bingeha kurd axivîbe, nikarîbe Emîn Zekî derbaz bibe ku bi şertê ew di salên Sî(30)yî de dest bi nivîsandina dîrokê kir. Îro tenê xebata akademîk a baş a ku ji aliyê kurdan ve li ser dînê kurdî hatibe kirin, pirtûka Mîrdad Êzedî ya bi navê “The Kurds” e. Mîrdad bavê wî Kurdekî Kirmaşanî ye û dayika wî Belçîkî ye. Ew yekemîn kes e ku bi şêweyekî akademîk li ser têkiliya di navbera olên Elewî, Êzdî û Yarsanî de axiviye. Pêwîstiya me bi têgihiştinê heye, ne ku encamê. Îro em gelek encaman didin û em hewla lêkolînê nakin.

Em wek kesekî ne, ku di çemekî boş de de hewl dide her çiqlê dara ku bikeve berdestê wî xwe pê ve hilawasîne. Çi tişta ku em sade bibînin, xwe pêve dadiliqînin, axaftina me li ser ola kurdî bi vî awayîye.

Îca heke ez bersivên van pirsan bidim ku gelo kurd mîtrayî ne? Belê, Mîtra di nav kurdan de xwedî kokeke kevnar e, lê danîna Kurdan wekî mîtrayî nerîneke pir feqîr e, sade û ne akademîk e û ji vê têgihiştina xwe feydeyê nade me. Ola Kurd ji ya ku bi vî rengî hêsan tê lêkolînkirin, gelekî aloztir e. Li şûna ku Kurdan bikin mîtra, hê başitir e ji xwedayê Mîtra û ola wê û rola wê di Kurdistan û cîhanê de em têbigihêjin, bi wê armanca ku em bigihêne têgihiştineke kûr di ol û çanda kurdî de.

Têbînî:
- Hin mijarên li ser Mîtrayê min di pirtûka xwe ya nû de danîne li bendê nemînin di şîrovekirina olan de beşdariyê bikim. Ew mijar pir aloz e bi çend şîroveyan çareser nabe.



www.sersalvakurd.org

AZAD EKKAŞ



HELEBA ŞER

Êdî nalîna guleyan ne bisaw e
ne jî sîya MiGê dema bi nizmî serî li me dida.
Şeveke bêdeng e
ta jî
segên ji laşên ademîzadeyan têr bûne
ditirsîne.

Herku çirûsînek di ezmanê me re diboriya
Me daxwazên kesê îdam lê birandiye dikir.

Herku bêhna jiyanê bike,
li gêdûka segvên
digurmije mirin.

Xêva avê biçûk e,
Têra kesên ku wê pêr laşên wan şûştin nake.
Xêva gihayê biçûk e,
Xema navên berê ên kavilên ew dagir dike
naxwe.
Xêva axa biber biçûk e,
Mezhebên berê yên laşên zaxdar nas nake.
Xêva Ruhstîn zindî ye
Navê her kesekî dizane,
karîbû an jî nikarîbû gêdûka segvên derbas bikira.

Berê Tofanê,
sipî bû qelereş.
Piştî Tofanê,
sitem ma reş.

HASBEG KOKSAL

DILOPA AVÊ

www.arsivakurd.org

Çi wextê biçim qeraxê çemekî, çîroka dilopek ava wê mereq dikim.

Gelo ji kîja kanî, rûbar, gelî, behr û okyanûsê weke mûyek ji baskê teyrêbaz jê bibe hilkişiyaye asîman? Çendîn caran li ber têna rojê hatiye şûştin? Di nav telpên ewran û bi mij û moran da çawa pirrengî bûye?

Bi kîjan ba û bagerê ra rêwîtî kiriye?

Min dixwest jê bipirsim, bê ka di kîjan rê, çiya, deşt, zozan, gund, bajar û bajarokan da derbas bûye?

Bê ka çawa bi hesret jiyan dide dar û devî, giya û gihanekan. Çawa lêvan şil dike, çawa dilan hênik dike û çawa jiyan dide axê...

Yek jî hêrsa wê û bendlêxistina wê ya xwe bi xwe, min dixwest bipirsim.

Avê tu caran qirêjiya şermînî di nav xwe da nehewandî ye. Nahewîne jî.. Ez dizanim. Min dixwest bipirsim, bê ka çawa qirêj dibe û dibe hilm bi hewa dikeve.

Çawa xwe di heşîniya asîmanda pak û paqij dike.

Min dixwest, vê esaletê jê bipirsim. Rûmeta wê ya xwebûniyê.

Rêwîtî û serûvena wê ya bi mij û baran û berfê ra.Weke xemla bûkek spî pêçandîna wê ya axê û helandina wê ya bi hezkirina rojê...

Min dixwest, herikîna wê ya bi coş a dilop dilop diherike geliyan bipirsim.

Min dixwest sirrên ew dilopa zanyar fêrbibim, bê ka çawa diafirîne û rih dide jiyanê.

Min dixwest bipirsim,ji min ra behsa senfoniya dengê xwe yê muzîkalî û carna jî behsa xuşexuşa xwe ya tirsnak bikira...



SERDAR KÖMÜRCÜ

DU EVÎNDAR

Du evîndar
Di kolanekê re diçûn
Bê xem, dikenîyan
Bi hemdê xwe

Kêfek fedyokî
Li ser rûyê wan bû
Min bi wan anît
Heft xwezîyên xwe

Wan nebihîst
Min hilmek kûr veda
Ji dil
Ji bîranînên xwe

Du evîndar
Di rêyekê re diçûn
Bê bask, difirîyan
Bê hemdî xwe

Kêfa minî berê ne
Kerba wanî salê me



www.arsivakurdi.org



REMEZAN BAKUR

JI ÇANDA QEDİM

Mirovayî bi pîvana dem û wext ji dema berê heya iro jîyaye. Bi pivana dem û wextê, şîyaye xwe ji gefên xwezayê biparêzin, debara xwe bike û jiyana xwe bidomîne, gelek qirn bûrîne, heta mirovayîyê şîyaye, werz û mehên salê durist bike, her werzekê, her mehekê û her rojekê navekê lêbike. Hemû neteweyên cihanê çar werz û duwazde mehên salê bi pîvaneke hevbeş lê bi zimanê xwe bi nav kirine. Împaratorê Romayê dawî bi sereraskirina mehên salê anîye.

Li rojhilata navî neteweyên aramî bi heyva li asîman, neteweyên arî bi rojê duwazde mehên salê destnişan kirîne û bi nav kirine. Netewa Kurd, ji ber hewceyîyên jîyanê, şert û mercên erdnigarîyê, kêşeyên werzan, da xwe ji gef û xezebên xwezayê biparêze, ji bilî çar werz û duwazde mehên salê; neh demên salê yên bi kêşe û bandor jî destnişan kirîne û bi zimanê kurdî bi nav kirine, ji bandora van deman, minak dane û gotin li ser bi kar anîne, ji bilî van pîvanan, heta baxorana vê serdema modern hatîye kifşkirin li kurdistanê serwext û şarezaya baxoran didanî û xelk ji saqayê hewa, barîn û nebarîna befir û baranê agahdar dikirin, Hemû pîvanên bi kurdî wateyeke kûr û bandoreke mezin li ser jiyana mirovan heye.

De vêca kerem bikin da em van pîvanan bi nav û minakan nas bikin û bidin nasîn.

Baxoran çawa dihate danîm: Serwext û şarezayan, her mehê bi navbera hefteyekê , li cihên veder, li sê-çar deran, êvarê kevir û ferşikên pehn didanîne ser hev, berbangê hê tavê ne hildayî, diçûn lê dinêrîn, ji xûs xûnava li navbera ferşik û helanên keviran, herwiha hatina bay ji alîyê bakûr û başûr, hatin û çûyîna ewran pêşbînîya barîn û nebarînê dikirin, pêjbînîyên wan ne bi şik û texmînkirinê bûn, bi delaletên berbiçav bûn, bi vi awayi xelk ji rewş û seqayê hewayê agahdar dikirin,bi delaletên berbiçav bûn, bi vi awayi xelk ji rewş û seqayê hewayê agahdar dikirin,

www.arsiva.org

Werzên salê:
1-Bihar
2-Havîn
3-Payîz
4-Zivistan
Ev werze hevbeş in li hemû neteweyên cîhanê û bi zimanê cûda.

Mehên salê
Sersala vê serdemê bi meha kanûna paşî dest pê dike
1-Kanûna paşî
2-Sibat
3-Adar
4-Nîsan
5-Gulan
6-Xizîran
7-Tîrmeh
8-Tebax
9-İlon
10-Çirîya pêşî
11-Çirîa paşî
12- Kanûna pêşî
Pîvana mehên salê hevbeş in bi yên cihanê re, lê her netewe bi zimanê xwe dibêjin.

Demsalên bi kurdî neh in û ev in:
1-Çile
2-Beçe
3-Zîpe
4-Axlêve
5-Têrxwer (berdoş)
6-Pûşber
7-Çilê havînê
8-Gilavêj
9-Heyhot

1-Çilêlê zivistanê ji bîstê kanûna pêşî dest pê dike heya dawîya kanûna paşî didome, çil rojên ji hemû demên salê sartir in.
Çil hejmareke gelek kûr û watedar e , kesê çil roja bişê li ber xwe bide, tengasîyeke mezin derbas dike û ji zehmetîyên jîyanê serkeftî û selefxwari dibe Kesê şiya çil rojên sarmayê li ber xwe bide û xwe biparêze, demên din bi hêsanî derbas dike, çil roj in xilweya zanyar alim û oldaran e, dema jinekê Xwedê zarokek dayê jê re dibêjin çiledar, ji ber Xwedêdana zoroki ji çil rojan bi şûn de gewdê wî diveşide ser hev û ji sehm û tırsên janên Xwedêdana zorokî xilas dibe û derûnîya wî timam dibe.

2-Beçe, bi xilasbûna çile, bi meha sibatê dest pê dike heya dehê Adarê, ew jî çil roj tên hesibandin, beçe jî demsaleke sar e, Sereyan di derbarê vê demsalê de wiha gotîye; Beçe gote çile ez li şûna te bûma min ê berx di zikê makê de qerisandiba

3-Zipe dehê meha Adarê dest pê dike, heya dehê meha Nîsanê, demsala amadekare ji bo biharê, berî dêndik çîl bide, raha giya bilive , pişka dara bibişkive ye, gulîyên hesp û hêstira tên qûsandin, mêr pora xwe kûr dikin, jin, serê kezî û biskên xwe di qûsandin, da bi hatina verzê biharê pûrt û pora nû derkeve, xwe ji gemara demsalên sar paqij dikin, hemîşe demê barîna baranên xûrt e. Sereyan li ser zipe wiha gotîye: -Zipe zîpedar heke barî bû bihar heke ne barî bû qiresala har -Zipe zîpekûr ser û biskan bi qûsinin keç û kûr

4-Axlêve demsala delîvê teng e, ji dehê meha Nîsanê destpê dike heya dehê meha Gulanê, qût ber bi xilasbûnê ye û bihar ne kemilîye demsal deravê bê delîve, ax tê lêvê, xelk li benda biharê li hêvya gilûgiya û pincarê ye.

5- Têrxwer û berdoş: dehê meha Gulanê dest pê dike heta dehê meha Xizîranê, hedara mirovan li jûrê nayê, dema

www.arsivakurd.org

pincar çêbûnê pez û heywan ji deve hedirînê ye û pez tê dotin, ango demsala hêl û bereketê û xêra Xwedê ye, xilasbûna tengasîyan e.

8- Gilavêj: ji meha Îlonê dest pê dike heya dehê meha Çirîya paşî, berbangê stêra gilavêjê li asoya rojhilat xwîya dike, seqayê hawa dişikê, ba hênik û şev sar dibin. Demsala ji hemû demsalan dirêjtir e. Destpêka werzê payîzê ye, destpêka vê demsalê berê koçeran li deştê ye, bara teyr û balindeyan ji zozanan ber bi deştê dest pê dike, li vê demsalê baranên payîzê dibarin xûs û xûnava payîzê dikeve axê û nizara, damsala amadekar e ji bo zivistanê, zevî tên kêlan, tovçîna payîzê tê avêtin, qûtê zivistanê tê berhevkirin.

9- Heyhot: ji dehê meha Çirya paşî heya bîstê kanûna pêşî didome. Destpêka zivistanê ye, serma bandorê li deşt, zozan, çiya û banîyan dike, dû stêrên heyhotan hene, vê demê salê li asoya rojava di ber hev re diçin, gotegotek li nav xelkê heye, dibêjin demê êvarê ev herdû stêrk di ber hev re dibûrin, kesê bibîne û mirada xwe bêje, mirada wî hasil dibe.
(Wekî ji navê vê demsalê tê famkirin, heçî karûbarê zivistanê ne kirî jêra dibêjin HEYHO) Sereyan ji vê demsalê re wiha gotîye: Heyotin heyhot ji hev verestin mehê bi cot, keri hespê xwe firotin dan bi dar û li ber xwe sotin.





DILAZAD A.R.T

ŞEV Û MİJ

Çi muamaya, çi aşqe, çi belaye ey mela
Têm xepandin bi qedehek û ramûsanekê
Ev lêv, ev sîng, ev gerden çiye ey mela
Her kes bi derd e, kes nîne şerh bikê

Ey zahid ji min neke gazinan
Şîretên te nakevin dilan
Awirên wan dilberan
Hiş nahêlin li seran

Ey mela carek were bi me re meyxanê
Tê bibînê ku her kes bi ilmê te zanê
Tu jî wek me vexwê ji wê şarabê yek tasê
Tê li xwe heram bikê rêya camî û medresê

Ey saqî bide min şaraba aşqê yek carê
Sermest bibim bi “lam û bê” ye yarê
Ji bo sîng û berê wê dilberê
Sed can didim bi yek nezerê

Ey mela li min neke waz û nasîhatê
Tu dibê heram e, ez dibê ava heyatê
Tu dibê ew yar wek agir e
Ez dibê wek hingiv û şekir e

Dêr ji bo keşa, mizgeft ji bo mela ye
Dergaha min hembêza yarê ye
Her bişkoka ku vedikim li ser pêsîre
Mîna mifteya bihuştê bi xwe ye

Milkê ereb û ecem û tirkan
Li ber fermana te bin ey dilber
Nakim şikayet ji husn û cemala te
Şanika li ser rûye te bim bes e ey dilber

Ey mela her kes bûye mûbtelayê pere
Dîn û îman maye peya li ber pere
Pere bûye bav û dê, insan nebû dilşa
Bêpere nameşê karê mela û keşa

Sed mizgeft nakê meyxaneyek
Sed waz ne bi qedehek
Bedena te “laleşa nûranî” ye
Tewaf dikim rojê carek

Ey saqî, çima nade min qedehek ji ava kewserê
Dil û hinav şewitîn bi vê keserê
Dilazad wek sîmir qaf bi qaf digerê
Çend sal in ne gihiştim mizgeftê ne jî dêrê



KONÊ REŞ

MİN GOT Û NEGOT!



Gelo!Hûn dizanin, her ku kalemêrek an pîrejneke me dimire, pitûkxaneyeke me pê re dişewite..! Û her roj kalemêr û pîrejinên me li ser rêka oxirê ne..Her roj pirtûkxaneyên me têne şewitandin..! Mixabin! Rêxistinên me, nefikirî ne ku, zargotin me ji ser zardevê wan bidin hev û tomar bikin..! Di nifşê nûhatî de neponijî ne..! Ev nifşê ku di dibistnên erebî de mezin bûne û baş dûrî ziman û zargotina bav û bapîrên xwe ketine.. Eger rast ew rêxistin ji bo avakirina Kurdistanekê dixebitin, Kurdistan bê ziman û zargotina kurdî ne ti Kurdistan e..

Sebaretî nivîsandinên min ên ku li dor zîlana Bedirxaniyan digerin, dibêjim; ew nivîs ji bo xort û keçên nûhatî ne..

Ew ên ku dûrî ziman û kultura xwe ketine.. Da ku serwextî ziman, wêje û ferheng xwe bibin û ji nêzîk ve lehengên kultura xwe nas bikin.. Qet ez ne ji bo bilindkirina navê Bedirxaniyan dinivîsim. Bedirxanî û danîna bingehê rewşenbîriya kurdî a nûjen bi hev ve hatine hunandin, wek ku çawa navê Kurdistanê û Barzaniyan bi hev ve hatiye girêdan. Ew berê bilindin.. Bilindbûna wan mîna roka di nav ala Kurdistanê de ye. Bajaro! Em tev mêvanên te ne, mêvanên xaka te ne.. Em ê tev bar kin, tu yê bimînî zindî.. Kolan û sikakên te dîdevanên wan xelkên ku, di wan re derbasbûne.. Ewên ku dîroka te bi navê wan hatiye girêdan.. WekSeydayê Cegerxwîn yê ku li ser xaka te kul û xemên me di (Kîme Ez?) de aniye ziman..

Osman Sebrî ji xelkên te (Derdên Me) gotiye.. Mihemed Şêxo, berê xwe daye felekê û strana; "Ey felek bo te dinalim, bo çi nêrgiz çilmisî..?!" ji me re gotiye.. Aramê Dîkran, yê ku li ser zimanê Kurdî "Zimanê Kurdî şêrîn û xweş e".. gotiye.. Seydayê Namî sirûda; "Pêşkevin em serfirazin miletê Kurdî.." huna ye.. Seîd Yusif; "Qamişlo bajarê evînê" gotiye.. Erê bajaro..! Ez ê çi bêjim û çi nebêjim?! Wek ku bapîrên me gotine: "Nû hatin, kevin xelatin". Hem jî gotine: "Her geyak li ser koka xwe şîn dibe". Da ku em dûrî ziman û dîroka xwe nekevin.. Werin, em li koka xwe vegerin û wek ku diyar e, koka me di parastina zimanê me de ye.

Nivîsandina rojên derbasbûyî ne tiştekî hêsan û qola ye.. Dêrana çê û ne çêyên rojên buhirî ye.. Ew rojên ku ji me re bûne dîrok.. Erê dîrok.. Dîrok bi nivîsandinê ye.. Hêza nivîsandinê ji hêza quretî, qal û qultan xurtir e.. Nivîsandin nemir e.. Axaftin bi kêlîka xwe re dimire.. Û ne her nivîsandin cihê xwe di civakê de digire.. Ez heyranê wî mirovî bim yê ku di nivîsandina xwe de rastgo be, ew e yê ku wek nivîsa xwe nemir dimîne.. Ewe yê ku bibe dîrok..

Di van rojan de hay be, şiyar be..! Ji kesî re qala şîn û şadiya xwe meke.. Qala Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Feqîyê Teyran, Mîrê Botan, Soran, Baban û Şêxê Barzan meke..! Qala xewnên xwe ji kesî re meke..! Qala dijîtiya di nav partî û rexistinên kurdên Rojavayî Kurdistanê de meke..?!

Bi Xwedê kin bixwînin, bê çendî zimanê vî kalemêrî xweş e. Berî çend rojan, rastî kalemêrek kone hatim. Min xwest çend pirsan jê bikim, belê berî ku bersivên min bide, wiha ji min re got: "Mamoste Min gelek teşqele, xap û rîp dîtine.. Mirov bi serpêhatiyên xwe, bi ger û geşta xwe kone dibe.. Nifşê we bi xwendina pirtûkan û boyaxa qelemê kone dibin..Serê we mizin e, lê dinya dilê we biçûk e..! Dinya dilê mirov çiqasî mezin be, derd û kulên wî hewqasî mezin in.. Erê mamoste! Dema ku kul û xemên mirov gelek bin, xemgîniya wî giran e.. Ka bêje apê xwe, hêza qelema te çend ritil in, çend weqiyan bilind dike?! Ji bo ku ez zanibim giraniya te çend e? Bêje da ku tu derd û kulên apê xwe nas bike.. bêje.. Min, kitek nexwendiye, pit û nîvek xwendinê nizanim.. Lê nexeme ji apê xwe bipirse.."

Bawer bikin, di vê jiyana kurt de, bi tenê bîranîn dimînin.. Xweş e ku di vê jînê de, kar û barê mirov çandina bîranînên çak û rind be, pîş û sazê wî di xizmeta welat û welatiyên wî de be.. Mane Kurdan ji mêj ve gotiye: "Tu çi tovê di xakê de bireşînî tê berê wî tovî hilînî". Hem jî gotine: "Ga dimire çerim dimîne, mêr dimre nav dimîne". Erê, em ê tev li xakê vegerin.. Belê ya giring ku em bîranînên çak û bedew li pey xwe bihêlin.

Mixabin, bûyer û serpêhatiyên me di pirtûkên dibistanan de nînin.. Di nav rûpelên Ansîklopediyayên çerxa bîstan de cih negirtine.. Di nav rojên winda, salên şikestî û erdnîgariya welatê qedexe de dibirijin..!

Hin wek pirên li kêleka çeman avakirî bin! Ji dûr ve xuya dikin. Lê qet şopa mirovan bi wan nakeve.. Carekê min ji demê pirsî: Ev çiyayên bi heybet û saw, asmanê ku Rok û Heyv têde, pey hev dikevin yên kê ne gelo?! Demê li min venegerand.. Serê xwe kir ber xwe de û bi lez û bez derbas bû..Dem dijminê me ye.. Werim em demê bikin hevalê xwe!

RÊBER HEBÛN



Dawiya Axînê

Tu vîna her hêzê yî
Pîvana her nirxê yî
Jîn û gav û aramcî
Êzinga şoreşê yî
Gavên min her li pêş in
Ji ber tu tîrêja rê yî
Ji ber tu giyanî yarê
Şahiya av û bê yî
Kurdisana biçûkî
Xumxuma şalûlê yî
Tu şînbûna ezmênî
Sipîbûna berfê yî
Erdî deryayî û darî
Tu giyana xakê yî
Rengî û awazî dilber
Tu ahîna avê yî
Tu her tiştî lê yarê
Naveroka xewinê yî
Her tu ji bo min dermanî
Dawiya axînê yî.

www.arsivakurd.org

KAMRAN SİMO HEDİLÎ

Serokwezîrê Min



Serokwezîr kaxeza axaftina xwe lê nivîsandî, pêşî ji Sîwezîrê bawermederê xwe re xwend. Sîwezîrê qet navê wî nedigot û her jê re digot, ´´*serokwezîrê min.*´´ Wî jî jê re digot, ´´*kengî ez bûm serokwezîr, divê tu zanibî, tu jî wezîrî. Ma ji te nêzîktirî min û yê ji wan bawer bikim, kî heye? Zanîn û hişên wezîr û serok wezîrên vê dinyayê hemiyan dênin ser hev biqasî zanîn û hişdariya te nabe.*´´

Berî şîvê çend caran û piştî şîvê çend caran din axaftina xwe ji xwe re bi dengê bilind xwed. Berî razê çû ber awêna li salona mezin û li pêşberî wê çend caran din dîsa xwend. Ew zêdeyî mehekê bû, axaftina dê li nav kevne hevalên xwe bixwendina û serokîtiya xwe beyan bikirina nivîsandibû. Hero çend caran an ji xwe re an jî Sîwezîr re dixwend.

Êdî bawer kir, xwe amadekiriye û bi sed hezaran mirov dê li guhdar bikin. Bi vê axaftinê û awayê xweşxwendina wî, dê ne tenê bibe serokwezîr. Li demeke kin dê bibe serokê welêt bi vê axaftinê. Ji ber awênê hat û çû jûra razanê. Bi wê dilxweşiyê xwe li nav nivînên xwe dirêjkir. Piştî çend xeyalên xweş, xwe li pêşberî bi hezaran jin û mêrên bi kelecan li ser piyan li çepikan didan dît. Ew qasî bi hêz û bi rengên haran li çepikan didan, derî û pencerên li derdora meydanê dihejiyan. Weke dîwar û ban bi ser de hatibin xwerê zimê ji mêjiyê wî dihat.

Pêlên şadiyê her cih girtibûn. Her kes di nav şadiyê de jê re li çepikan didan. Li pêpelokên ji avahiya bilind ber bi meydanê ve dihat sekinî. Destên wî bi dil û laşê wî re dilerizin. Êdî ne deng dibihîst û ne tiştek didît ji şadiya xwe. Pir şad bû. Rûyê wî weke gulên nû vekirî bû. Bi destên xwe yên lerzok hin tişt digotin.

www.arsivakurd.org

Qelabalixa mirovan hewîrdorên wî girt. Herkesî tiştek dixwest. An jî tiştek jê re digot. Di cihê xwe de sekinî û weke gel nû dibîne, li komê nêrî. Zincîra xeyalên qetiya di wê gavê de. Çi di bîra wî de hebû, hemû jibîrkirin. Têgehişt, xwe ragirtin li ber wan mirovan pir zahmet e. Bi paş ve vegeriya. Qelabalix dîsa ber bi wî ve dihat. Welweleke pir ecayîb dest pê kir. Berê bi hezaran çavan bi aliyê wî ve hatibû zivirandin. Çav di çavên wî de bibûn bi milyonan. Herkesî li çavên wî dinêrî. Hemû deng û devan digot, bipeyive! bipeyive! bipeyive…!
Bi paş ve zîvirî û xwe di pişt deriyê avahiya jê derketibû de veşart. Destên wî bi xurtî desmala destan birine ser rûyê wî. Bi desmala destan xwêdana ser rûyên xwe paqij kir û desmal bi paş ve danî cihê wê. Tevzîonkeke nediyar di laşê wî re çû û laşê wî derbas kir. Xwe di quncik de kiribû mîna marê ji serma xwe dike weke werîsê li hev hatî pêçan. Weke meşkeke tijî av, herderên bedena wî dilerizîn. Care yekem, navê xwe bihîst di quncika tirsê de. Pir bi hêrs bû ji ber hemiyan navê wî zanîbû û navê wî diqêriyan. ´´Rêmîr, Rêmîr, Rêmîrê bûyî Mîr û serkêşê me.´´ Li nav wê welwelê nedizanî bê li pey çi ye? Li çi digere? Çi dixwaze? Quncika xwe tê de veşartî ronî bû, ronahiyek pêket. Têgehişt, hin kesên din ji bilî wî li wir hene û pêwîst re ji bona ronî pêxistin ji we re spas bike. Lê spas nekir û her di nav xwe de dipeyivî.

Kes an kesên li wir jî ne peyivîn û tiştek negotin. Car carnan ji pişt derî derdiket û di cih de bi paş ve dizivirî. Ji xwe jî bawer nedikir, ji endamên laşê xwe ditirsiya. Wê xelwetê gelekî nekişand û ji paş derî derket..
‘‘Vaye tê” bi bihîstina dengan re dara şadiyê di nava wî de kulîlk vekir. Ji keyfxweşiya dengan, rondik ji çavên wî fûrîn. Bangurê tirsê ji ser rabû û hemû astengî bi xwe re birin. Hikumdariya tevlîheviya bêbiryariyê bi dawî bû. Dengê çepik û lîliyan bûne dengê hûnandina evînê. Şepolên hestên serkeftinê di mêjiyê wî de agirê têkçûnê fetisandin.
Bi baweriya qasdê vejînê ye, ew pêşwazî kirin. Bi awirên hêviya, ew ê wan rizgar bike, li dinêrîn. Dilê wî di qefesa sînga wî de bibû weke stêra sibehê. Xwe bêtawan weke di jiyanê de qet şaşî nekirî, xwe hîskir. Bedena wî weke siya firindan bê armanc derbas bû û ber bi komê ve çû. Weke perperîkên li ser kulîlkan serê xwe dihejînin û şîrêzê kom dikin, wî jî bi serhejandinê kom silav kir.
Wê gavê li derveyî tariya tenêtiyê mabû û li nav mirovên ji wî hez dikirin bû. Weke stranbêjên popê yên di dil bi milyonan keç û kurên heyranên xwe de textê hezkirinê danî û hemû bi hev re bixwazin destên xwe bigihînin, hemû dest dirêjî wî dibûn. Mîna şêxên tesewufê yên têne nav derwêş û mûrîdên xwe di dema zikir kirinê de.

Dengên, ‘‘*ya xewzê zaman, ya xewzê zaman,*’’ selawet bi navê pêxemberê umetê û bi navê şêxê xwe biqêrîn heta perdên asîmanê haftan bidirînin, hemû devên li meydanê ber bi wî ve diqêrîn û perdeyên guhên wî didirandin.

Mîna roja koça dawiya Şêx Edî li Lalaşa Nuranî û hemû êzdîxan herikî Lalaşa Nuranî. Ji bona cara dawî bi çavên xwe Nura Şêx Edî bibînin, bi maçkirina darbestê lêvên xwe ji Nurê dagirin û çûna bihuşta xwe gerantî bikin, hemû dest, çav û lêv dirêjî wî dibûn.

Komê ew weke fermandarekî sedsalên navîn bi heybet û li paş xwe şopên ronî hiştî didît. Li aliyê din koma mirovan jî weke koleyên sadikê xwediyê xwe, sadikê wî bûn. Ew weke fermandarê bêhêvî xwe di nav şer de bibînê bû û kom jî weke leşkerên ji bona xwe bi fermandarê xwe bidine ecibandin bi dil û can dibezine ser şûr û riman bûn. Weke leşkerên di meydana şer de xwe diavêjine hembêza mirinê, mirovên li meydanê jî xwe diavêtin ber piyên wî. Koma mirovan li pey dikirin kezkez û himhim. Herkesî ber bi aliyê wî ve dinêrî û herkesî tiştek digot, tiştek dipirsî, hestek nîşan didan. Dilovanî û kelecaneke pir balkêş hebû. Nedizanî çi bike? Çawa bike? Di nav wê welwelê de ne tenê bizav, gotin jibîrkiribûn. Bêriya hilbijartina hevokan kiribû. Ji ser rûyê wî kenekî bi mebesta dilxweşiyê diherikê nav komê.

Berê hemû çavên diniyayê li cihekî bûn û wî cihî jî li wî dinêrî.

Awirên wî weke tava rojê li ser komê digeriyan. Awirên xwe berdidan nav çavan û li çavên bi hêrs li dinêrin digerandin, lê ti çavên bi hêrs nedîtin. Piştî gera awiran li nav çavan jî zimanê wî venebû. Bi tenê dikarî bêje, ´´belê, nexêr, spas, dibe, ev camêriya we ye...´´ Ji ber kelecanê bi tenê ev peyv ji nav lêvên wî dikarîn werin der. Wê gavê xortekî ciwan derket ser milên qelabalixê bi kelecan û hişk li dijî wî dest bi axaftinê kir. Heta dengê wî derdiket, dengê xwe bilind kir û axivî. Piştre dest bi girî kir. Bi îske îsk girî. Hêdî hêdî di nav rondikên xwe de winda bû. Giriyên xemgîn, loriyan û stranên li ser ciwan dihatine gotin meydan dagirtin. Serê xwe ber bi jêr ve tewandibû û bi gezan diçû lêva xwe ya xwerê. Lêva wî di nav diranên wî de bû, bi xemgînî li xortê di nav rondikên xwe de winda bûyî dinêrî. Piştre xortê ji girî nedikarî tiştekî bêje, hêdî hêdî hate ser hişê xwe, giyan pê hat rabû ser piyên xwe û xwe avêt hembêza wî. Serê xwe danî ser sînga Rêmîr û dîsa girî. Rêmîr destê xwe yê rastê danî ser serê wî û ji xort pirsî. ´´Tu çima digirî?´´

Xort lê nenêrî û berê xwe da komê. Ji cara pêşî bi kelecantir bi hêrstir dest bi axaftina xwe kir.

´´Mêjiyê we weke mêjiyê masiyan yên zû tiştan ji bîr dikine. Hûn bi tenê dizanin li çapikan bidin, dûrûşma biqîrin, bigirîn û stranan li ser kuştiyan bistrênin. Çima hûn tiştekî din nakin? Çima hûn bi hev re nameşin û van dîwaran xira nakin?´´

Bi aliyê Rêmîr ve berê xwe zîvirand bi awirên nefret û hezkirinê lê nêrî. ´´Ewqas sal çûn tu li ku bûyî? Çima tu napeyivî? Ji bona çi heta vêga vê tu nahatî naskirin? Tu dixwazî bi ku ve herî?´´

Hinekî sekinî, bêdeng bû bi çavên xwe yên ji girî sor bûyî lê nêrî û got. ´´Tu dikarî bibî weke pêxemberekî. Tu ji bona bipeyivî û komê li peyi xwe bibe, hatî afirandin. Tu hebûneke pîrozî, pêwîste bi milyonan werin pîrozkirina te. Vê komê pêwîstî bi serokatiya te heyeee...´´

Bi dengê xort re ji xew veciniqî û ji nav nivînên xwe derket. Zû zû cilên xwe li xwe kirin. Riha xwe qusand û berî ji mal derkevê axaftina xwe dîsa xwend. Bi baweriya xewna wî dê rast be ji male derket. Berê xwe da dûkana Sîwezîr ya pirtûkfiroşiyê. Xwest wî jî bi xwe re bibe. Lê kolanê çi kesên dîtin, ala partîya dîjber di destên wan de bûn û ber bi qada minting ve bi lez dimeşîn. Xwediyên dûkan, çayxan, xwaringehan devê cihên xwe digirtin û ew jî digehiştine komên diçûne minting. Bi wê lezê xwe gehande ber deriyê dûkana Sîwezîr, dît ew jî dûkana xwe digire û di destê wî de jî ala partîya dîjber heye. ´´Tu jî bi wan re diçî?´´

´´Mire min, em jî bi wan re herin. Ez bawer dikim, ew ê bi serkevin. ´´







www.arsivakurd.org



DENNİS DARGUL

ALA MIN

Xemla Piroz ya Şînahiya Esman,
Nexşa vehandî ya xaka niştiman,
Evina piroz ya erd û esman,
Sor e, Nexşê dawî ya Giyanê Şehidan,

Li ber 21 tirêjên rojê xwe delalinî,
Destan, me ji te xwed, pir bi evînî,
Xwin me rijand da tu her xwe jor bihejînî
Evinî eve, dê tu her û her bilind û bilind bî

Ciyayên bilin li ber te berxwedan,
Çukên Esmanan, ji ber te silav dan,
Li ber bejna te, deşt û bahniyan renk dan
Sor e, nexşê dawî ya giyanê Şehidan,

Tu her dem, dê berz u gewher bî,
Cihê bihejî dê her çax bi sebir û aram bî
Sibera te bese, dê gel xak û welat bî
Evinî eve dê tu her û her bilind û bilind bî

Roja piroz tirêjên erd u esmanan,
Bila her şev be jî, roja me bixudan,
Rengê xwezayê da deşt û zozanan
Sor e, nexşê dawî ya giyanê Şehidan

Tu kevoka Aştiyê, ser me digerî
Strana azadiyê ber bay dibejî
Bihar eve ye, gav bi gav ronak dibî,
Evinî eve dê tu her û her bilind û bilind bî.

Li ber sibera te em xwedê dan
Li ber bejna te, Egidan giyan dan,
Li Dilê Kurdistan, dirok ronî dan
Sor e, nexşê dawî ya giyanê Şehîdan

Tu dê dîrok, wêje, helbest û hêvî bî,
Bes tu bixaze, tu her derê dê bilin bî,
Şayane, li ser xak tu her erd û esman bî,
Evinî eve dê tu her û her bilind û bilind bî..

www.arsivakurd.org



DİLBİRÎN DİLO

ÇEND GOTİN Lİ SER Lİ DÊRÊ

www.arsivaku.org

Çîrokên evînê,bi taybetî jî evînên negihiştine miradê xwe min xemgîn dikin. Ez ji bo evîndaran xemgîn dibim û pirê caran jî çavên min dibin hêlînên rondikan. Jixwe mirovek çavşil im ji bo her tiştî karim bigirîm,lê halê evîndaran min ji temamê taybetmendiyên min dûr dixe û tenê min dike wek jinek ku ji bo miriyan, ji bo zarokan,ji bo şeran digirî/dilorîne. Ev yek ne ji ber ku min evîn dîye ez bûme evîndar belbî ji bo ku min evîn nedîbe diqewime.

Îro dîsa ji bo evînek hêsiran êrîşê çavên min kir evînek negihiştiye miradê xwe. Evîna Bilindê Zaxoyî û dotmama wî ye ya ku dil li min peritant.

Hesenê Metê wek ku bi qelema Bilindê evîndar ji xweda re dide nivîsandin bi kurdiyek ku tenê xweda û kurd jê fêm bikin nivîsandiye novala xwe ya bi nav “li dêrê”.

Pirtûk ji 74 rûpelî pêk tê,bi çapa xwe ya duduyan ji weşanên peywendê di sala 2015 an de derçûye.

Bi zimanekî herikbar û bi uslûbek ku mirov zane ji pênûsa Hesenê Metê herikîye hatiye nivîsandin.





Naveroka wê wek ku di serî de jî me got bi evînek negihiştiye miradê xwe dest pê dike û bi dawîbûnek ku nivîskar jî jê bawer nake bi siûd diqede.
Nivîskar ji bo nivîseke xwe amade bike diçe dêrê û dixwaze dêrê û dîroka dêrê hîn bibe di wê kêliyê de rastî Bilindê hemgelîyê xwe tê ku her du jî kurd in,yek ji bakur yek jî ji başûr e. Piştî hev nasînê Bilindê başûrî dest bi çîroka xwe dike.

Bi wê uslûba ku ancax evîndar karibin qal bikin,Bilind jî behsa serpêhatiya xwe dike. Bilind û dotmama xwe (ji ber ku naxwaze navê wê bide dibêje dotmama min) di rojek şilî de diçin hespên xwe yên ku havînê berdane bînin mal,li wir Bilind eşqa xwe ji dotmama xwe re diyar dike ew jî qebûl dike. Bilind û delala wî sozê ku ê dî ji hev naqetin didin hev. Lê dema ku mala xalanê keçikê tên wê dixwazin û keçik jî qebûl dike,dinya li Bilindê evîndar teng dibe,dibe wek dînan û bi çolan dikeve. Êdî her tişt jê re dibe derew.

Bilindê evîndar rojek rastî helbestek tê,dikeve bin bandora wê helbestê û ew jî dest bi nivîsa helbestan dike. Helbestek wî di kovarek de tê weşandin û ji ber vê helbesta xwe ji nav civakê tê afaroz kirin. Êdî nikare binivîse û nikare li wî welatî jî bimîne. Diçe cem wî helbestkarê ku ji helbesta wî sûd girtiye, dixwaze qelema wî bişikîne, helbestvan dide xuyanî ku ev ne heddê wî ye ku pênûsa helbestvanek bişikîne. Bilindê zaxoyî dinêre debara wî li welat nabe koçê Swêdê dike.
Piştê tê Swêdê li wir jî ji ber evîna dotmama xwe dikeve tengezariyê û di dawî de biryara xwekuştinê digire di rojek bi baran de. Dema diçe ser pirê ku xwe ji wir de bavêje xwarê,dengê naqosa dêrê tê wî û li wir hêviya jiyanê pê re çê dibe. Ji wir tê dêrê ji xweda re bi zimanek ku ji xeynê xweda û kurdan kes nikare bixwîne bi kurdî nameyek dinivîse û diçe di rêza ewil de rûnî dike û serê xwe dide ser zenda destê xwe û dikeve nav fikaran. Di vê kêliyê de bi dengê jinek bi xwe dihese. Ew jinik jê re dibe heval û dibe hêvîya jiyanê,di dawî de bi hev re dizewicin. Her çiqas minnettarê vê jinikê be û jê hez bike jî dîsa ew her û her evîndarê dotmama xwe ye.



www.arsivakurd.org



Seyfedînê Welekorî

Kê Rabû

Kê rabû bo xwe em kuştin,
Em xapandin bê dewlet hîştin,
Herdem xulamîya xelqê kir,
Ew çûn, em bê xwedî hîştin.

Ew çûn bûn xwedî dewlet,
Em man ji paşve bê rûmet.
Di nav me da nîne ‘edalet,
Yek li yê din dike heqaret..

Heta kengê emê wuha bin
Çima ji neyar re xulam bin
Li ser keda me ewê axa bin
Emê bê mal û bê welat bin…

www.arsivakurd.org

Rûmet Med

ZANYARÊ NAVDAR YUVAL NÛH HARARÎ Û ÇAR BERHEMÊN WÎ



Rewşenbîr, dîroknas û profesorê navdar ê îbranî Yuval Nûh Hararî (Yuval Noah Harari) di sala 1976ê de ji dayik bûye û yek ji akademisyenên Zanîngeha Îbranî ya Qudsê ye.

Lêkolînên zanyarê cihû Yuval Nûh Hararî heta niha bi dehan zimanan hatiye wergerandin û wî li seranserê cîhanê herî zêde bi pirtûkên xwe yên; “Sapiens: Kurtedîroka Mirovahiyê” (2014), ”Homo Deus: Kurtedîroka Sibê” (2016) û ”21 Dersên Sedsala 21-an” (2018) ve tê naskirin. Lêkolînên wî di derbarê mijarên mirovnasî, cureyên mirovan, dilxweşî, êşê, jîrbûnî, nijadnasî, îradeya azad, rabirdû, dahatû û hişmendîya mirovan û şoreşa nasnameyî de ne. Hararî vegan e, û dibêje ku ev encama lêkolîna wî, di nav de dîtina wî ku bingeha pîşesaziya şîraniyê têkiliya di navbera ga dayik û golikê de qut dike.*

Yuval Nûh Hararî, ji sala 1993ê heta 1998ê li Zanîngeha Hebrewbranî ya Orşelîmeyê li ser mijarên dîroka serdema navîn û dîroka leşkerî de xebitî ku di van beşan de bû pispor. Di sala 2002ê de li Zanîngeha Jasussa û Oxfordê bawernameya doktoraya xwe hilgirt. Di 2005ê de jî xwendina postdoktorayê xilas kir.

Nivîsar Jared Diamondî bandoreke mezin li ser fikr û ramanên Harirî kir û wî di jiyana xwe ya akademikê de ji ber Afirînerî û Resebûnê xwe, di navbera salên 2009 û 2012ê de du caran Xelata Polonskyê girtin. Di 2011ê de xelata Moncado ya Civaka Dîroka Leşkerî wergirt û piştî salekê ji bo Akademiya Zanistî ya Ciwan Israelê hate hilbijartin. Di sala 2017ê de bi pirtûka xwe ya Homo Deusê Xelata Pirtûka Aboriyê ya Germenî ya Handelsblattê stend. Hararî di axaftineke xwe ya li salona Enstîtuya Berggruenê de got, “Diamond’s Guns û Germs û Steel ji bo jiyana min a akademiyê gelek girîng bûn û di vê demê de min fam kir û têgihîşt ku ez dikarim pirtûkên wisa binivîsim.” Ji bilî pirtûkên Yuval Nûh Hararî, heta niha gelek gotarên wî yên zanistî jî hatine weşandin. Di dema şewba pandamiye Coronayê de, Hararî ragihand ku em ê bi navê malbata xwe, bi riya Sapienshipê ji bo fînansmana saziya WHOyê 1 milyon Dolar bexş bikin.

www.arsivakurd.com

Hararî, di berhemên xwe de bi taybetî dema 70.000 sal berê û derketina cureyên mirovan ên wekî Homo Sapiens, Neandertal û cureyên Homo Sapiensê yên din vedikole û di derbarê mijarên pêvajoya pêkhatin û geşedana zimanên mirovahî û demên şoreşa çandinê û şoreşa nasnameyî de dinivîse. Xebatên wî nêzîkî bi zimanê wêjeyî hatine nivîsin û ji lêkolînên zanist ên bingehîn ên wekî jiyannasî-peresan, mirovnasî, nîjadnasî, civaknasî, hwd. ve pêk tên. Piraniya çavkaniyên rastîn ên hemû van zanistên bingehîn; xebat û lêkolînên giranbiha yên zanyar Charles Darwînî ne, loma jî ji fikr, hest û ramanên ên zanistên diyalektîk, materyalîzma dîrokî û felsefeyê derketine holê û bi roniya riya wan pêşveçûn û geşedana xwe didomîne.

Ez di vê nivîsa xwe de hin pirtûkên Yuval Nûh Hararî yên ku li ser dîroka mirovan û dahatûya mirovahiyê hatine amade kirin, ji bo xwîneran bi kurtasî didim naskirin.

"Kurtedîroka Nîjad (Cure) a Mirovan" / Jêza û Geşedanên 'Sapiensan'

Di xwezaya erdnîgariya cîhanê de, cureya yekem a mirovan ya bi navê “Sapiens” çawa pêkhatî ye û cureyên Homo Sapiensan çawa derketine holê û kengê li cîhanê belav bûne? û belavbûna wan a li parzemînên cîhanê çawa bûye?.. Dîroka cureyên Sapiensan, pêvajoya pêkhatina zimanên qedîm û yekem, dîrok, jiyan û çandên erdnîgariya mirovahiyê.. Bersivên hemû van pirsan dide pirtûka bi navê; *“Sapiens: A Brief History of Humankind”* (Kurtedîroka Nîjad a Mirovan)

Lêkolîn, ji aliyê lêkolîner, zanyar, dîroknas û nivîskarê navdar Yuval Noah Hararî ve bi zimanê îbranî hatiye nivîsin û di sala 2014ê de li bajarê Londonê ji Weşanên Harvill Secker derket. Di mijara zanista mirovnasî (antropolojî), dîroka mirovahî û xwezaya jiyanê de, pirtûkeke zanistî û raveker e û di vê babetê de yek ji çavkaniyên girîngtir e. Rûpelên pirtûkê têr û tije ye û her agahiyên nû, di hiş û bîra mirovan de asoyan kûr dike.
Lêgerîna pirtûkê, qala pêvajoya qewimîn û derketina holê ya yekem mirovan (Sapiens) û Homo Sapiens, Neandertal û cureyên din ên mirovan, rêwîtiyên wan ên ber bi hemû parzemînên cîhanê ve, pêvajoya pêkhatin, derketin û geşedana zimanên yekem, jiyan û çandên wan dike. "Homo Sapiens", guherîn, veguherîn û geşedanên mirovahî û xwezayê, bi nerîna fikr û ramana diyalektîk rave dike.

Pirtûk, piştî weşandina xwe, li hemû cîhanê bi gelek zimanan hate wergerandin û weşandin. Zimanê pirtûkê fehmbar, vekirî û zelal e, rûpelên wê wekî belgefîlmekî didome.

“Homo Deus: Kurtedîroka Sibê”

Berdewama lêkolîna rêza “Homo Sapines”ê ya Hararî, pirtûka duyemîn a bi navê “Homo Deus: A Brief History of Tomorrow” (Kurtedîroka Sibê) di sala 2016ê de ji aliyê Weşanên Vintageyê hate çap kirin û nivîskar di lêkolîna xwe de li ser rewşa îroyîn û dahatûya mirovahî û xwezaya jiyanê disekine. Hararî di rûpelên pirtûka xwe de agahiyên zanistî dide me û hest û ramanên xwe yên derbarê jiyan û çandên mirovahiyê û geşedan û encamên nûjeniyê (modernîzmê) de tîne zimên.

“21 Dersên Sedsala 21an”

Pirtûka sêyem a rêza Homo Sapiensê di sala 2018ê de bi navê “*21 Lessons for the 21st Century*" (*21 Dersên Sedsala 21-an)* li Londonê û ji aliyê Weşanên Jonathan Cape ve hatibû weşandin û di rûpelên xwe de qala mijarên geşedanên teknolojîk û zanistî dike û li ser aborî û encamên wan disekine ku rewşa îroyîn ên mirovahiyê, xwezayê û cîhanê vedikole.

“Sapiens: Dîroka Grafîk - Cilda Yekem / Pêkhatina Nîjad a Mirovan”

Pirtûka “Sapiens: A Graphic History - Vol. 1, The Birth of Humankind” (Sapiens: Dîroka Grafîk - Cilda Yekem, Pêkhatina Nîjad a (Cure) Mirovan” ya zanyar Yuval Nûh Hararî di meha Cotmeha sala 2020ê de ji Weşanên Harper Perennialê derket li pêşberî xwîneran.

Pêkhatina Nîjad a Mirovan” pirtûka yekem a lêkolîneke nû ye ku ji çar cildan pêk tê û wekî pirtûkên din ên Hararî heta niha li hemû dinyayê ji aliyê bi milyonan xwîneran ve hatiye xwendin. Nivîskar, di vê pirtûka xwe ya dawî de bi formateke nû qala dîroka mirovahiyê dike. “Pêkhatina Nîjad a Mirovan”; digel çîrokên pêkenî/mizahî û lehengên rengîn û wêne û vegotinên derasayî, hêza Sapiensê ya hemû cîhanê veguherandiye dide ber çavan. Pirtûk, xwînerên xwe derdikeve rêwîteyeke bêhempa û kûr, û li ser mijarên peresana mirovan û bobelata ekolojîkê ku bi destên cureyên Homo derketiye holê, disekine. Biyolojî û dîrok çawa teşe dane li mirovahiyê?, şoreşa nasnameyî û yek ji encamên wê yên; pêkhatibûna sêwirî û hêza bêpîvan a mirovan çawa bûne? û bandorên vê rewşê yên rûxîner çi ne? Ev lêkolîn, bersivên hemû van pirsan dide û sedem-encamên van rave dike.



Ev lêkolîna giranbiha û herîkbar, di rûpelên xwe yên têr û tijî de helwest û nerînên zanistên cuda dihewîne û bal dikişîne li ser mijar û pirsgirêkên dijwar ên mirovahiyê. Li ser dîroka mirovahiyê çavkaniyeke bêhempa û serpêhatiyeke herîkbar e.

Pirtûkên Yuval Noah Harari yên weşandî:

"Renaissance Military Memoirs: War, History and Identity, 1450–1600 (*Bîranînên Leşkerî yên Ronesansê: Şer, Dîrok û Nasname*, 1450–1600, Woodbridge: Boydell & Brewer, 2004)

"Special Operations in the Age of Chivalry, 1100–1550" (*Operasyonên Taybet di Serdema Serkeftinî, 1100-1550', Woodbridge: Boydell & Brewer, 2007)*

"The Ultimate Experience: Battlefield Revelations and the Making of Modern War Culture, 1450–2000 (*Ezmûna Dawîn: Daxuyaniyên Qada Battleerê û Çêkirina Çanda Modernerê Nûjen, 1450–2000', Houndmills: Palgrave-Macmillan, 2008)*

"Sapiens: A Brief History of Humankind" (*Sapiens: Kurtedîroka Mirovahiyê,* Harvill Secker, 2014)

"Homo Deus: A Brief History of Tomorrow" (*Homo Deus: Kurtedîroka Sibê,* Vintage, 2016)

"Money: Vintage Minis (select excerpts from *Sapiens* and *Homo Deus) (Drav: Vintage Minis* (perçeyên ji *Sapiens* û *Homo Deus hilbijêrin*, Penguin Random House, 2018)

"21 Lessons for the 21st Century" (21 *Dersên Sedsala 21-an,* Jonathan Cape, 2018)

"Sapiens: A Graphic History - Vol. 1. The Birth of Humankind)" (Sapiens: Dîroka Grafîk - Cilda Yekem. Pêkhatina Nîjad a Mirovan, Harper Perennial, 2020)

Çavkanî:

https://www.ynharari.com/

*https://ku.wikipedia.org/wiki/Yuval_Noah_Harari

https://en.wikipedia.org/wiki/Yuval_Noah_Harari

https://tr.wikipedia.org/wiki/Yuval_Noah_Harari

https://rumetmed.blogspot.com/2018/08/diroka-kurt-nijadi-cure-ya-mirovan-jeza.html





ADİL BAŞARAN

Çîroka Lawê Padîşah

Lawê paşê û hevalên xwe li qadê bi gogê dileyze. Dema lawê patîşah gogê davêje û bişid digindire dîçe li kûzê pîrê yê tijî av dikeve û kûzikê pîrê dişikê ,pirtî pîrtî dibe. Li ser vê pîrê diqehere û bedûayê li lawê paşê dike û dibêje; ‘’we kûzikê min şikand,tu lawê paşê ye, tu hêza min tune û ez nikarim tiştekî jî bikim,lê ez ê vê bibêjim,tu jî mîna bavê xwe bibe. ez bangi yezdan dıkım.bila kul û derdê evîna mednîgarê di ser dilê tekeve û miradê te pêne be.kul û derde wê ket ser dile bavê te jî.’’

Li ser vê nifira pîrê,lawê patîşah dikeve nava xewn û xeyalên kûr û roj biroj li pîrê û nifira lêkiriye difikire.gelo ev çı bu ku bire jı mın re got. Demek dirêj derbas dibe,hew xwarinê dixwe û gelek lewaz dikeve. Patîşah dibine ku lawê wî roj bi roj zeîf dikeve û bangî hevsera xwe dike û dibêje: çi bi sere lawê min de hatiye? Heyran ka jê bipirse bê çi pirsgirêkên wî hene.

Dayîka wî êvarî dema şîvê datîne û cardin bi qelsî dixwe,dayika wî jê dipirse û dibêje ka çi bi te hatiye tu nema xwarinê dixwe tu dike ji birçîna bimrî de ka bêje çî derdê te heyî? Li ser vê pirsa dayika xwe dibêje: dayê berî bi çendakî min û hevalên xwe dema me bi gogê dileyst goga min li kûzê ava pîrê ket

www.arsivakurd.org

û şikest ,pîrê nifir li min kir û got tu derd û kulê , mednîgarê bivîne û tû bi miradê xwe şa ne be.her çiqase dayika wî got de pir bi ber gotinên wîsa nekeve lê wî got dayê ez ê bi dû vê keça bi navê , mednîgarê bikevim heta Ku ez wê nebînim ez neyêm malê, dayika wî çiqasî li ber da lê tu feyde nekir û biryara xwe da ku bi çol û çepelekeve daku ew navê pîrê qal dike bivîne û kula ketiye ser dilê xwe derxîn e.
Dayika wî jê re got madem tuyê biçe bi tenê nere. Li nava bajêr bi qasî sîh destbirakê te yên şîr heye, her şevên li mala yekî bive mêvan û ji bona bawerîyê dema razandinê ji wan re bêje ez dixwazim sere xwe daynim ser çonga te û razêm dema tu li ser çonga wî raza û hetanî sibehê serê te ji ser conga xwe neda alî tu pêzani be ku ew ê bi tere bi rastî tevbigere û dostê te ye. Û tuyê wî bi xwe re bi ve. Ê ku tu tahamûl nekir û sere te ji ser çonga xwe da alî tu pêbizani be ku ew ê bite re bi rastî tevnegere û wana bi xwe re ne be. Lawê patîşêh gotina dayika xwe dixe serê xwe û tûrê xwe davêje ser milên xwe dikeve ser rê û diçe.şevê li mala destbirakekî xwe yên şîr dibe mêvan û tiştên dayika wî jêre gotibû dikir. Li mala kîjanî dibe mêvan,dema xewê tê, ji wan re dibêje ez ê sere xwe deynim ser çonga te û razêm bîst û neh rojan bi vê hewî derbaskir,. Li ser vê tu dest birakên wî sere wî hetanî dawiyê li ser çonga xwe nehişt bi tenê mehmedê gavan hetanî sibehê sere wî li ser çonga xwe hişt û destbirakê xwe lawê patîşêh serê wî ji ser çonga xwe neda kêlekê.

Dema şiyar bû dît ku hîn jî sere wî li ser çonga mehmedê gavan e û jê pirsî te çima bangî min nekir : hevalê wî got heyran;cara ewile ku destbirakê min î şîr li mala min bûye mêvan, min qêmîşî te nekir ku ez te ji xew şiyar bikim û sere te hetanî sibehê liser çonga min bû, li ser vê lawê patîşêh ji destbirakê xwe yê şîr mehmedê gavan re got ; tuye bi min re were û em ê li çol û çîyan bigerin daku nifira pîrê li min kiriye ji ser xwe bavêjim.:

Mehmedê gavan:her çiqasî got heyran ez gavanekim ma çênabe ku ez werim tu kurê paşê, ez gavanim. lê gotinê feyde nekir û ew neşikand erê kir:lawê patişah du hesp anîn,heqîbên herdu hespan dijî zêr û zîv kir û suwar hatin û ketin ser rêya nepenî û çûn: Çûn çûn,çûn bi qasî 50 .60 rojan meşiyan. Çîya çîya ,newal newal, di nava daristan bax û baxçan re derbas bûn , li qesrekê rast hatin û got em ê îşev bivin mêvanê vê qesrê, li ber deriyê qesrê rawestiyan bi rişmên hespê xwe girt û di deriyê qesrê re ketin hewşa qesrê. Hesp li ber alifan girêdan û bi pêlikê qesre re rapelikîn û di deriyê qesrê re ketim hundir qonaxê bala xwe dayê ku qesra bi xalîyên rengoreg xwmilandî ye,lê tukes di hundurê oda qesrê de tune.
Lawê patîsah ji mehmedê gavan re got;heyran em ê îşev li vê odê razên hetanî sibehê, li oda raxistî rûnişt û xwe dirêj kir,Dema hebek dem derbas bû dît ku deng ji metbaxa qesrê hat û li dengê ji metbaxê dihat şingîna tebex û kevçiyan ûli ser sînîka baqir tijî xwarin, şîv ji wan re hat li ber wan dani tu kes xuyanabû, lê her tişt bi xwe tê ber wan .ketin nava tisr û xofeke mezin; lawê patîşah got heyran xwarina xwe bixe em ê paşê fêm bikin bê ev çi nepenîya vê qesrê ye. Têr şîva xwe xwarin û serî avêt xewê: Lê xewa mehmedê gavan nehat fêmkir ku kerameteke vê heye.û ji xwe re got hetanî ez fêm nekim ez ê şiyar bimînim,lawê patîşah ne xema wî bû ew ket xew.
Pîştî şev qar dibe û bi şûn de ,dengek tê dengê çend kesan û bang dike ji xwedîyê kesrê re dibêje axayê min; xuya ye îşev mêvanên te hatine,ew jî bibêje raste ketin xew. Dibêje birako xwezî niha şiyarbûna û dengê min gohdar bikiranan,ez bi vê meşa wan ya domdirêj dizanin, dengê min bibihîsta minê rê bi ber wan xistana ,l rêya ku ewê pêde herin,rêya nevegerê ye..
Azayê wî jî dibêje hema bêje dibe ku yek ji wan şiyar be û dengê te her e wan; Li ser wan nîqaşan : Dibê başe ez ê bijim, û dest bi

axaftina xwe dike ‘’Niha ev herdû mirov li ser rêyek dûr û dirêj in, dema bi rêde biçin du rê dê bêne bêşiya wan, yek rêya fireh û yek jî xaçerêk e. ger ku di rêya fireh re herin dê ne ji xêra wan re be û ewê winda bibin.,Rêya rast a xaçerêke ,dema di xaçerêkê re here dê tahtekî mermer û mezin li ser rê bivîne. Bila wî tahtê mermer bilind bikin û bide alîkî û dê dû gemên hespan bivînin û rahêjinên û bimeşe dê di meşeke dirêj bimeş in hetanî ku çûn ber deryayê û ji hespên xwe peyabin rişmê hespê xwe li dora stuyê wan bigerîne û berde:û ,gemê di dest xwe de li hevdû xînîn dê du hespên din ên bahrînî li berwan bisekinin û ew ê li wan hespan siwarê û di ser deryayê re wan derbast bike. Dema gihaştin hêla din ya deryayê bila zêrên di qesîdan de li erdê raxin û bila bêjin zêrê me şîl bûye me li ber tavê raxistîye.// Ew ê qedera wan bi cerdonekî ve girêdayî be,ew cerdon dê rê bi ber wan xîne//: dema zêrên xwe raxe erdê dê Cerdonek ji kuna xwe derkeve û were zêran bikişîne: dema cerdon het bila cara ewil bêhêle ku zêr û zîvan bive ,deng nekin ,cara dudiyan jî cardin deng dernexin û cara sisiyan bila cerdon bigirin :yanî ku xelasîyek wan hebe bi wî cerdonî ye: dibê wihaye ji hev re dibêjin wihaye û deng qut dibe.’’ Mehmedê gavan li van gotinan hemûyan guhdarî dike . dibe serê sibehê,radibin ser xwe dibîne ku ji metbaxê dengê çingînek tê diçîn dibînin ku taştêya wan amedebûye taştiya xwe dixun û ji qesrê vediqetin û dikevin ser rê. Demeke dirêj dimeşin dibîne ku du rê tine pêşiya wan,lawê patîşah dibêje heyran em ê di vê riya fireh re herin, .,mehmedê gavan dibêje na ,û wiha berdewam dike ,hetanî niha te çi digot min min wekî te kir, lê ji niha û pê de tu wekî min bikî. Em ê di xaçerêkê re herin Lawê patîşah her çîkasî naxwze jî lê mehmedê şivan pêdizane û dikevin xaçerêkê.

Qederekî dimeşin dibîne kevıreki pahn yê mermer dibînin ,tişta ku li qesrê bihîst rast bû,taht bilind dikin û du gemên hespan di binê taht de dibînin radihêje û dimeşin:

Diçin, diçin demek dirêj dimeşin û bahra avê tê pêşiya wan, li ber perê deryayê disekinin ji hespan dadikeve hespê xwe berdidin, herdu gemên yê ji binê kevirê mermer derxist li hevdu xist û dît ku du hespên deryayê ji nava bahrê derket û hat rexê deryayê :herdu destbirak her yek li hespê deryayî sıwar hat û derbasî aliyê din bûn....piştî derbasî hêla din bûn mehmedê gavan got em ê Zêrên xwe raxin,lawê patişah got :ma çi hewceyî raxistinê dike? lê destbirakê wî got ka tu sebir bikî.:. Piştî ku Zêr û zîv li ber Rojê Raxist û demek kin derbas bû,Cerdonek ji qula hêlîna xwe derket û hat rahişt zêrekî, lawê paşê got :"heyran ka em nehêlin wî bigirin"destbirakê wî jê re got sebir bike, cara dudiyan cardin zêrek bir.:û Cara sisyan ku cardîn hat hema bi carekê ew girt.! Dema cerdon girt,cerdon kir qêrîn û gazî,û got: "Çêlikên min hûrikin dê ji tîna û birçînan bimrin min berdin,hûn çi ji min dixwazin ? Li ser vê mehmedê gavan got "çîrokame eve ger ku tu bibî alîkar em ê têra te zêran bidıne te, û paşê te azad bikin, xelasiya me di destê te de ye, Cerdon dibêje ka hûn çi dixwazin bejên ez ê wekî we bikim, :li ser vê çîroka xwe vedibêjin .Cerdon tişta ku ew ê bêyî kirin ji wan re dibêje û gavavêtina ewil û ya dudiyan û ji wan re hemû planan vedibêjin:" hûn qet denge xwe dernexin bejin bila fanos beje ez ê jî di baş fanosê de xwe veşêrim .dıbeje merdnigarê keçeke gelek zana û pêşketıye. Bi herkesi qayil nabe,gelek xwazgînî yên wê hat û şerdê bavê wê digot nikarî bûn bi cih baniyan celedan sere wan jêkirin.Merdnigarê keçeke wiha ye ket napeyive ger ku hûn wê 3 caran nepeyıvinın dê serê we jî jê bıbe.

De ka li min guhdar bikin ez ê merdnîgarê 3 caran biştexilîn im, tiştê ku ezê ji wer e bêjim hûn eynen binen cîh. Ewil ,Herdu destbirak tiştê cerdon baş hîn dibin û têra çêlikên Cerdon zêr û zîvan didên û berê xwe didin mala bavê merdnîgarê; Diçin li pêşiya mala bavê merdnîgarê li ser kevirê xwazgîniyê rûdine:piştî demekê bavê keçikê derdikeve û deng li wan dike,Dibêje: Hûn kîn in,? We rêya xwe

windakiriye?hûn pê dizanin ku hûn lı ser kevirê qîzxwestınê rûnıştînin.
Ew ji bersıva bavê merdnigarê dıde û dıbêje ,er ê em dızanın û em xwazgininin. Lı ser vê bave keçıkê dıbêje heyran geleki mina we hat û şerdê me kebûl kır lê bicih ne anîn û paşê serê wan jê bû. Hûn jî şerde min bi cîh neynin,sere we herduyan jî jê bibe.
Belê gohdarvanen eziz û delel. …dıbe êvar dıçın li oda bavê merdnigarê mîna ku cerdon gotiye dikin û dibêjin sila li ehle fanosê.û derbasi dawiya odê dibin. Ode tıjî Mirov mirovên axê buye.û dest bı axaftınan dıkın.
Bave merdnigare dbêje
''' Hûn bi bazara min dizanin şerdê me çi ye hat gotin û we jî pejiran paşê bila gazin an bexşandin neye gotin.ger ku hûn sê caran keça min biaxivîne,ez ê keça xwe bidim,lê ku hûn nikaribin serê we jê dibe . hetanî niha tu kesî sê caran keça min neştexilandi ne.û dıbêje kerem ke:.
Mehmedê gavan DIBÊJE HEYRAN EM TIŞTEKÎ NABÊJIN BILA FANOS JI MER RE biştexile.: ; lı ser wê gotina mehmedê gavan,hemû cimhet matmayi dımine û bala xwe dıdın fanosê..deng jı fanose tê û dibeje.;
Ez ê niha çîrokerkê vebêjim û bersiva wê hûnê bidin. Fanos dest bı axaftınêdıke.û dibeje.''heyran rojeke 3 destbirakê hev,yek xerat e,yek çildirûn e û yek jî sofi ye …dem adi rêyeke domdirj re diçin li wan dibe êvar û nema dizanin çi bikin, li nava ciheki cîhekî nepenî û tenha li der o dora xwe diğerin û li şıkeftekê ras tên . Hersê destbırakên hev, dîkevin hûndir şkeftê …jı hevdu re dıbejin ev der dereke gelek xeternak e, di be ku ajal ,sewan an heywaneten xeter wer me bıkuje emê tedbîra xwe bigrin. Her carê yek ji me bi dorê rabin nobedariyê bigrin. Du heval radize û yek şıyar dımine.ewil yên ku xerat dikeve nobedariyê. Di nobedarıye de jı bona dema xwe derbas bike dıçe jı derve çend daran dibi re û tine hundur şıkeftê bi wan iskeleteki mirovan çêdıke. Hetani xılas dıke nobeta wi ji dıqede. Û bangi hevalê xwe yê cilan didrû dike, û diçe radızê..
Yê cıldirûn bala xwe dıde hundır ku hevale wi iskeleteki mırovan jı textan çekırıye. Geleki kefa wi je re te u ew ji lı gora wi iskeleti cılen jıneke le dıediline u dıke mina qizeke 18 de sali hu geleki xweşik dıke… dema wi ji dıqedı u bangi sofi dıke ..sofi dora wi ya nobederıye de çavlı wi peykere qizıke dıkeve ü hema ew ji bergerina xudayan dıke da ku ruh berde vi peykerei. U bı careke re ruh dıkeve peyker u dıbe mırov.. … mehmede govan dıbeje geli cımhete gelo ev qiza hekqe kijani ye.e xerat,an e cıldırun yan e sofi ye. Lı ser ve pırse cımhet dıbın du beşan u henek dıbejın heqe merengoze jı berk u wi ew fıkır kır u bı textıkan iskelet çe kır… henekan jı got heyran heke çıldırun e,wi kınç dırut u lekır kır qizeke delan…..

lı ser van gotınan merdnigare xwe negırt u got heyran hun çı sereşıyan dıkın heqe sofiye ger ku bergera xwadan nekıra u ruh berdeda bedena we nedıbu.. dema erdnigare axıfi hema lawe paşe got heyran we bıhits waye erdnigare axıfi.
Bave we got heyran we ezmuna ewıl derbas kır.

Cımhet belav bu ew ji derketın u cardın demhat u çun mala bave ertnigare. Ketın hundır u got sılav jı ehlen fanosere.cımhete jı bersıv da u got ehlen wesehlen u runıştın.xedıye male got mevanen me ye jı we re bıaxıve. Lawe paşe got heyran em xeribın jı dur ten eme bejın çı de bıla fanos bıştexıle u cımhet hemu bala xwe dan fanose. Deg jı fanose derket u dest bı axaftıne kır… got : lı bajareki se pısmame hevdu hebun u dozmameke wan hebu…herse pısma ji dıl ketıbu dozmama xwe. Çereke herse pısmam lı bona debara xwe bıke dıçın lı başareki kar u xebate.. demek dırej derbast dıbe dema vegera male herse pısmam dıçın lı bajer pedıvıyen xwe dıkırın daku wegerın welate xwe.

Dema lı bazara alavan dıgere jek je dıbine ku mırove bang dıke u dıbeje tejen dıfıre hene: ew jı meraq dıke u dıpırse çaw yani? Mırove tejfıroşt dıbeje dema tu lı ve tejıke sıware u tu bıxweze here ku tüye xwe lı wır bıvine u tüye lı wır peyebe.kefa wi gelek jı we teje re te u dıstine. Dı dılı xwe de dıbeje dema ez berıya dozmama xwe bıkım hema ez e lı tejıke sıwarem u herım. Ye dın jı dıçe bal xwe dıde ku ye dıbeje durbine mın hene u hun kengi bıxwezın mırovan bıbine ,çıqasi durbe ji ewe bine nezi we.. lı ser ve ew ji dı dıle xwe de dıbeje eze durbine bıkırım daku ez lı dozmama xwe meze bıkım. U dıkıre.. yes sısıyan ji dıbine ku yek bang dıke u dıbeje ev tasen ave mırovan jı mırıne xılas dıkın u dem adı ber sıkrata mırıne de be bı ava ve tase jı mırıne xılas dıbe. Ewji we tası dıkıre u dı dıle xwe de dıbje ger ku dodmama mın dı ber mırıne keve eze bı ve tase ave bıdıme da ku jı mırıne xılas bıbe. Dema herse vedıgerın male u tışta kırine bı hevdure parve dıkın . u çiroka herse amuran bı hevdure parve dıkın…. Xwedıyö durbine dıbeje ka ez bınerem be lı walet çı heye: dem abı durbine lı welate xwe dınere dıbine kul ı mala dodmama wi qerebalıx e u deng te dıbejın dotmam ketıye sıkrata mırıne: hema jı herdu pısmame xwe re dıbeje dodmama me dı sıkrata mırıne de ye.ye xwedıye tejıke dıbeje heyran de ka wer em lı tejıke sıwaren u em xwe zu bıgenın welet. U her se pısmam çawa lı tejıke sıwar ten xwe lı welet dıbının u dıçın mala dotmama xwe. Dema dıbine ku dotmam dı sıkrate de ye ye xwedıye tase diçe u bı tasa ave dıde dodmama xwe u dotmama wan bı ser hışe xwe de tö u radıbe ser xwe… : de ka cımheta delan ev dotma heqe kijan pısmami ye? Cardın cıhmet lı nava hevdu dıkevın. Henek dıbeyı heqe xwedıye tejıke ye.ew nebaya xwe nedıgıhan dodmama xwe,henek je ji dıbeje na heqe xwedıye durbineye ew neba ya bı dodmama xwe u eşa we nızanıba.cardın cıhhet bu du beşan.

Cardın li ser vê mineqeşe çê bû û merdnîgarê xwe negirt û axifî got; heyran ne heqê tejikê û ne heqê yê dûrbînê ye,heqê ym xwediyê tasa ava sikratê ye ger ku ew ava sikratê nedayê dê bimra. Û li ser vê lawê axê got heyran wayi we bihîst cardin merdnîgarê axivî. Bav merdnîgarê got ev bû du car ma carek.

Li ser vê cimhet belavbû û herdu destbirak bi cerdon re derketin, cerdon ji wanre got; heyran vê carê baş godarbikin ger ku hûn ne baldarbin ew ê min jî û we jî bikuje. Bele ev cara dawî ye, vê carê dê ew ê pisikekî bînîn cemhatê. Hûn jî min têxin bine eba xwe dema pisîk weri dê ew ê bênamin here pozê wî û ewê li dora cihê bêna min jê were bigere, wê deme hûn jî , min berdin ez ê xwe li fanosê

biqelibînîm, dema fanos biqelibe û dinyayê reştarî bibe tu kes kesî nabîne.û cardin merdîgarê dê bıştexile. Bernama xwe temam dikin û cardin derbasî oda bavê merdnîgarê dibin. Dema derbast dibin hundirê odê tijî mirovin û cardin dibêjin silav li ehlên fanosê û rûdinin..

Cerdon di bênê ebayê de sere terîka wî dixuye. Bavê merdnîgarê ji xwe bawer dibêje keremke de ev cara taliye ye dema wer dibe je xulamên wî jî pisîk berdidin hundir odê.. bisîk çawa dikeve hundir û behna cerdon dikeve bêvîla wî û li dorî cemhetê dide çîrivîtkaê. Memede gava dêla cerdon hebekî derdixe û pisîk çavlê dikeve û êrîş dike bi vê re cerdon berdide û cerdon jî bi bazdan xwe li fonosê diqelibîne û fanos dikeve erde dişkê.. dema fanos vedimire û hundir odê dibe şevtarî; li ser vê merdnîgarê bi hêrs dibêje; hû çi dikin ,we hertişt tevlî hev kir.. li ser vê lawê padîşah dibêje heyran ev cara sîyem merdnîgarê axivî. O bi deste wê digire û bere xwe dide qonax bavê xwe.

Cardin tê ber pere bahre geme hespê bahrîn li hevdu dixîne du hespên bahrîn tê li wan siwar dibin derbasî hîla bahrî din dibin û her du hespan berdidin cardin li hespên xwe swar tên û dikevin ser rê..

Demeke dirîj dimeşin cardin li qesra bere rastên û xwe davêjin hundir. Şeva xwe li qesrê derbas dikin, lê cardin ji qesrê deng tê û wiha



dibêje.; yek ji yê din re dibeje axayê min ev herdu mêvanên te yê wê şevan ku ji bona merdnîgarê ketibûn sere. Demekî li min godarkiribûn. Waye evîna xwe jî anî ye.
De cardin ez ê tiştnan bejim hêvî dikim ku deng herin wan.: û wiha didomîne dibe je ; ger ku herin malê,dê bavê wî ewê nehêle ku miradê wî bi merdnîgarê bi ve; ew derdû kulê merdnîgarê di ser dile bavê wî de ye. Dema ku here mal bavê wî ew ê tazîyekî (tahjî) bi sêrê bişîne pêşiya wî û dema deste wî bi tajî bive dê bibe mîna ariye, bila çibike ,bila çawa kû hat nêzî wî hema şûrê xwe derxîne û sere wî jêke. Û dema gihaşt deve deruyê malê dê ji hespê xwe peyabe û mehmedê destbirakê xwe li kolanê xwe bike û derbasî hundir bibe. Ji berk u di serdera derî de marekî bi cîhkirî ye heye:
Cardin mehmedê gavan li van kerametên vê qesrê guhdarî dike û dema dibe sere sibehê. Li hespên xwe siwar tên bere xwe didin malê. Dema nîzî qonaxa bavê xwe dibe dibine ku tajîyekî reş ku mîna kîrojkan bi lezgîn xwe li wan girt û hat.. mehmedê gava çawa ku nêz bû hema jûrê di deste xwe de avê serê wî jêkir. Li ser vê lawê axê got te çima werkir, jê re got heyran ev sêr bû. Û meşiyan qonaxê dema gihaşt ber deriye konaxê mehmedê gavan hesp sekinan û berî ku derbasî hundir bibe, ji lawê patîşa desbirakê xwe re got dakeve û tuyê min li kolanî xwe bike, lawê axê ew neşikan û li kolanê xwe ki û dema derbasî hundir bû marê bi sêê xwe dirêj kir dît ku ne lawê paşê ye û cardin xwe kişand kunê bi vê lawê patişêh gihaşt miradê xwe ; lê a ku ew anîn wê merhelê rêhevaltiya rast bû..

AVAZÊ KALO



HETA KU

Heta ku em ev bin
Ne xwedî hêz bin
Ne xwedî dewlet bin
Em ê reben û bidest bin

Heta em biparêzin bratiya gelan
Em ê wenda bikin bi hezaran
De bese êdî bigirin hemî derîyan
Êdî silavê jî nedin wan hovan

Wan welatê me perçe kirine
Baweriyên me ji hev qut krine
Ji bona em nemînin weke kurd
Her tim li serê me dixin mîrkud

Bûbê Dibêje û dike qazî û dinalîne
Xwe dûr bixin ji wan ew alî ne
Xwe dûr bigrin ji roman ew ne xalî ne
Hukmê xwe li ser serê me danîne

Nepeyivîn bi zimanê wan,
xwe dûr bixin ji adetên wan
Bavêjin hemî hêjayî û malê wan
Li xwe vegerin û bibînin wan.

www.arsivakurd.org



Cemîl İbrahîm

WERİN EM ZİMANÊ XWE BİPARÊZİN

Pêkanîn, yan jî sazkirina hevokan

Di her zimanekî de hevok ji sê bêjeyên sereke pêktê, ew jî ev in: Kirde, Bireser û Lêkar, lê rêzkirina wan, ango sazkirina hevokê bi wan hersê bêjeyan, di hemû zimanan de ne wek hev e, di zimanê Kurdî de, bi tevayî, pêşî Kirde tê, bi dû de Bireser tê, di dawî de Lêkar tê; wek nimûne, yek dibêje: min sêvek xwar; di hinek zimanên din de ne wilo ye, weke zimanê Erebî, pêşî Kirde tê, piştre Lêkar tê, di dawî de Bireser tê, û li gorî wê, ew mînaka me wilo tê: min xwar sêvek ...

Îcar li gor şopandina min ji çend nivîskar û helbestvanan re, (ji ber ko îsal tenê, ji min hat xwestin ko ez lêveger û hûrbîniyê ji heft dîwane, çîrok, û romanan re çêkim, herweha ez hûrbînî û serrastkirinê, ji bo çend gotar û helbestên ko di Pênûsa Nû de têne belavkirin, çêkim), di gel xwendinek bi lez ji çend pirtûkên nivîskar û helbestvanên din re jî, ji min re hat xuyakirin ko hinek nivîskar û helbestvanên me ên birêz, gelek caran, ew weke zimanê Erebî hevokên xwe pêk tînin, ango li hev siwardikin; bêyî ko ez navan bêjim, ezê çend mînakan ji wan pirtûkan bêjim:

- Çîroknivîsek di çîroka xwe de, li ser zimanê kesayetiyekî çîrokê, dibêje:(amade bike ji bo me vê masê)!, gerek bêje:(vê maseyê ji bo me amade bike), û li cihekî din jî dibêje(wî min siwarkir bi xwe re)!, ev hevok jî gerek wilo bihata gotin:(wî ez bi xwe re siwarkir im) ... û gelek hevokên din bi vî şêweyî di çîroka wî de hatine sazkirin ..
- Yekî din dibêje:(û bi tiliya xwe ewê nîşandikir ji pêşketina wî re)!, weke ko ez têgihiştim xwestiye bêje:(wê bi tiliya xwe pêşdehatina wî nîşan dikir) ....
- Romannivîsek di romana xwe de dibêje:(ew pelik hiştiye di destê wî de)!, gerek bê gotin: (ew pelik di destê wî de hiştiye), dîsa dibêje: (ew gelek xemgîn bibû li ser wan)!, ev jî gerek wilo bê gotin: (ew li ser wan``yan jî ji ber wan ´´ gelekî xemgîn bûbû) ....

.

www.arsivakurd.org

- Yekî din di romana xwe de dibêje:(namîne ji wan re bilî xewnan)!, gerek bê gotin:(ji bilî xewnan ji wan re namînin) .... û li cihekî din dibêje: (keko, çima tu maye bê par ji belavkirinê?)!,
Gerek bigota:(keko, çima tu ji belavkirinê bê par mayî?) ....
- Nivîskarek di gotareke xwe de dibêje:(agir diweste li ber deriyên dijminên me)!, gerek bêje: (Agir li ber deriyên dijminên me diweste) ....
-Yekî din di gotareke xwe de dibêje: (wî ew jibîrkir li ber derî), mane gerke bêje: (wî ew li ber derî ji bîr kir), piştre dibêje:(min mest nekir ji xeynî çîrokek), ev hinekî giran e, lê gerek mero bêje:(tenê çîrokekê ez mest kirim) ....
Lê hêjayî gotinê ye ko carina hevok bi hinek Lêkaran re(ew jî hindik in), bi awayekî din têne darijtin, ango pêşî Kirde tê, piştre Lêkar, û dawî Bireser tê; bi rastî min ew hemû nejimartine, lê ez dibêjim belkî gelekî hindik in; wek nimûne:
- Çûn: di hemû deman de wek hev e, mirov dibêje: (ez diçim dibistanê, ezê biçim ser avê, ez çûm bajêr, ez diçûm nav daristanê ...HD) .
- Hatin: ew jî di hemû deman de wek hev e, mirov dibêje:(ez têm malê, ezê bêm sûkê, ez hatim cem we, ez dihatim gund ...HD) .
Herweha çend Lêkarên din wek: derketin, daketin, hilkişîn ....
Lê gava ko daçekek dikeve hevokê de, dîsa rêzkirina wêjeyên hevokê tê guhertin, dîsa Bireser dikeve pêşiya Lêkar, wek nimûne:
Çûn: mirov dibêje:(ez bi rê ve diçim, ezê ji wêderê biçim, ez ji malê çûm, ez ji cem wî diçûm, ...HD) .
- Hatin: mirov dibêje:(ez ji malê têm, ezê bi siwarî bêm, ez ji dibistanê hatim, ez ji gund dihatim ...HD) .
Herweha mirov dibêje:(ez di derî re derketim, ez ji ser dikê daketim, ez ber bi lûtkeya çiyê ve hilkişiyam ...HD) .

Ev hinek mînak bûn, lê xwediyê van çîrok û roman û gotaran, hema bêj her rûpelekî wan gelek hevokên wilo têde têne dîtin .... Ez ji naxê dilê xwe hêvî dikim ko kesek ji nivîskarên me ên birêz, ji ber van rexneyan, dilê xwe ji min negire; di heman demê de, ez bi dilgermî destxweşiyê li van biraderan dikim, ji ber ko karekî gelekî baş û hêja kirine, gava ko berê xwe dane nivîsandina bi zimanê Kurdî, lê bê guman e jî, herkes zane ko em hemû di nivîsandina bi zimanê Kurdî de hinekî qels in, divê em gelekî lê miqate bin ko em bê şaşî binivîsin, gelek caran li nivîsandinên xwe vegerin, û ji bo serrastkirina şaşiyan, em alîkariyê ji hevalên xwe bixwazin, ewên ko em wan ji xwe zimanzantir dibînin, ezmûna wan di vî warî de ji ya me bêtir e; û gerek herdem çavên me li pêzanînên nûtir û bêtir bin, û gerek e em ji bo bilndtir kirina asta xwe di warê ziman û rêzimanê de newestin, da ko nivîsên me rast û durist derkevin, û em alîkariya xurt kirin û çêtir kirina zimanê xwe bikin, da nifşên me ên niha, û ên bi dû me de bên jî bi zimanekî rast û durist biaxivin, bi wê resenî û şêraniya rasteqîne a zimanê me biaxivin, yan jî binivîsin ....

Bimînin di xweşiyê de ....

Elind Mizûrî



Rîvîng

Ez rîvîngê eşqa te me
Tu li kîve bî li pey te me
Bi şev û roj dê li te gerim
Nêçîrvanê bejna te me

Gerim li çol û berriya
Di nava komên Zeriya
Ta digehim hembêza te
Nahêlim çû war û rîya

kevokek bî li ser çîya
kulîlk bî di nav gelîya
Dê geryêm da te bibînim
Te bigehînim xweziya

Dê hêm û hêmez her dê hêm
Li kîve bî dê dîftehêm
Ji bo dîtina te delalê
Çi çara ez nabêm neşêm

Ji bo dîtina wan çavên te
Bûm rîvîng li rêya eşqa te
Li çi qonaxa navemînim
Heta di gehim bejna te.

www.arsivakurd.org

www.arsivakurd.org

JI BO ÇÊKİRİNA E-KOVARAN

MÎTANNÎ AJANS

mitanniajans@gmail.com